HRANT DÎNK - SOHBETÊN ME YÊN DAWÎN BI HEV RE • Taner Akçam • ▶ 15

Îhtîşam û sefaleta rojnamevaniyê
Marie Bénilde • ▶ 11

Gelo Îslam berferehbûnparêz e?
Patrick Haenni & Sami Amghar • ▶ 21

LE MONDE diplomatique kurdî

Almanya: 3,50 Euro
Welatên din: 4,00 Euro

Sibat 2010 - Hejmar 4 · www.lemondediplo-kurdi.com · info@lemondediplo-kurdi.com · 32 Rûpel

# Modela Pekîn'ê

SERGE HALIMI

Hu Jintao yê xelefê Mao Zedung, piştî wî bi şêst salan pişta xwe sipart gotineke wî û got: "Îroj Çîn bi xêra pêkanînên sosyalîzmê li ser lingan e." Ev, çavdêriyeke balkêş e; ev ji demeke dirêj ve ye ku Çîn ne di bin nîrê Ewrûpa'yê û ne jî di bin yê Japonya'yê de ye û êdî tirsa wê ji wan tune ye. Jê çêtir, şert û mercên jiyana beşekî civata wê jî baştir bûye. Lê belê, pirsa sosyalîzmê pirseke cuda ye... Hingî ewqasî dûrî rastiya wan e, mirov êdî dikare bibêje ku bihêzbûyina Çîn'ê (sala 2008'an % 9.6 bû, di sala 2009'an de jî % 8.7) bû alîkara aboriya Amerîka'yê. Bi vî awayî, Çîn çû hawara sîstemeke kapîtalîst ya ku ji sala 1929'an ve ye ku qeyraneke weha bi serî de nehatibû. Globalîzma ku li Wall Street'ê birîndar bûbû li Şangayê ji nû ve rabû ser lingan.

Gava ku rengê hewayê sor bû, ew formula ku digot; "Bayê Rojhilatê dê pişta bayê Rojavayê bişikîne" dihat wateyeke din, lê îroj tê wateya ku Çîn ji bo zincîrebazarên mezin dibe eldorado û mezintirîn itxalatdara cihanê: Sed û pêncî û şeş marketên Carrefour'ê li wira hene ; heftê û du dikanên Tesco'ya brîtanî; dêwa amerîkî Wal-Mart jî, heger xebitandina karkerên çînî ya zêde ku derfeta kêmkirina buhayan û herweha ya qelskirina raqîban didiyê ne di nav de be, li gora wan ya herî qels e.

Heger divê mirov guherîna cîhanê bi rêya van agahiyan ve binirxîne û bibîne bê bi ku de diçe, ji bo karsazên rojavayî tu sedem namîne ku xofê jê bigirin. Wall Street Journal bi xwe jî balê dikişîne ser: "Bazara Çîn'ê ji bo şîrketên rojavayî yên ku li mezinbûnê digerin gellekî balkêş e. Herkes dizane ku yên ku cîhanê ji qelsbûyînê xelas dike bazarên weha nuh in (1)." Sendîkaya amerîkî ya metalurjiyê ku kêfa xwe bi van guherînan nayne ji Washington'ê xwastiye ku dozê li Çîn'ê bike, lewre Çîn zêde diafirîne.

Lê belê, êdî mirov nikare bi tenê bibêje ku "modela çînî" platformeke îtxalatê ya weha ye ku bi meaşên kêm dixebite; Çîn hewl dide ku berê xurtbûna xwe zêdetir bide bazara hindurîn û peywendiyên aborî yên bi herêman re jî xurttir bike. Herêmeke bazirganiyê ya weke peymana bakur-amerîkî ya bazara serbest an jî weke ya Yekîtiya Ewrûpa êdî bala wan jî dikişîne. Û bi vî awayî, xurttirkirina mezintirîn sektorên welatê desthilatdar di bala wê de ye ku, ji xwe, qaîde jî her ew e. Lê belê, herçend nifûsa wan ne weke ya hev be jî, ketiye pêşiya Japonya'yê û ji ber wê, Çîn divê îsal bibe giringtirîn aboriya cîhanê ya duyem. Li gora banqeya amerîkî ya bi navê Goldman Sachs, ji vira û 2026'an, ew ê bibe ya yekem jî.

Gelo ew ê hêza xwe di ku de bi kar bîne? Ne civînên G-20 û ne jî civîna Kopenhag'ê tu derfet nedan ku mirov bibêje ku Çîn bûye awûqata xizanan an jî ya welatên başûrî. Awayê wê yê pêşketinê kêfa herkesî tîne, bi taybetî jî ya kesên ku dixwazin hêza aborî û lîbealîzma bazirganî û berdewamiya desthilatdariya olîgarşiyeke nîvpolîtîk û nîvendustriyel bikin yek (2).

Êdî di nava derdorên patronên rojavayî de jî roj bi roj piştgirên "modela Pekîn'ê" zêdetir dibin...

**Werger ji fransî**
**Îbrahim Seydo Aydoğan**

(1) Patience Wheatcroft, "Don't begrudge China's exports coup", The Wall Street Journal, New York, 12 Çile 2010.

(2) Sala 2005'an, % 65'an zêdetirê patronên sektora taybetî endamên Partîya Komunîst bûn.

KURDISTAN 2010

# Mezintirîn pirsgirêka li pêşiya siyaseta navneteweyî

UDO STEINBACH*



*Rebwar Saeed - Efekt LMD kurdî*
(Derbarê hunermend de rûpel 4)

Yek ji pirsgirêkên herî mezin ên li pêşiya siyaseta navneteweyî ya sedsala 21. çareserkirina "pirsgirêka kurd" e. Ev pirsgirêk beriya nêzî bi sedsalan dîsa xwe nîşandabû. Dema Împaretoriya Osmanî sala 1918'an de hilweşiya, erdên wê ji nû ve hatin parvekirin. Ji bilî Îran'a ku dewletbûna heta bi sedsala 16. diçe, kurd li dewletên nû çêbûyî parçe bûn – çawa ku xwe bi ezmûna dehsalan nîşan da, kurd li van dewletan welatiyên sinifê duyem bûn. Bi tenê carcaran mirov tê derdixist ku pirsgirêka kurd nehatiye çareserkirin, weke mînak li Îran'ê bi Komara Mahabad'ê, li Îraq'ê bi serhildanên Mistefa Barzanî pêşengiya wan kirî û li Tirkiye'yê bi çalakiyên milîtanên PKK'ê vê yekê xwe dida der.

Gelo "pirsgirêka kurd" pirsgirêka Filistîn'ê ya sedsala 21'an e? Ango gelo wê afirandina statuyeke siyasî ya gelê kurd mumkin be, ku hem bersivê bide daxwaza naskirina nasnameya neteweyî û hem jî sîstemên dewletan ên heyî ji binî ve neguhere? Aramiya herêmê wê têkildarî bersiva mirov bide vê pirsê be, ku dewletên Tirkiye, Îran, Iraq û Sûriye reng didinê. Wexta li piştperdeyê mirov giringiya stratejîk a vê herêmê, ango bi kêmanî tedarîkkirina pêdiviya bi petrol û gaza xwezayî ya dinyayê, li ber çavan bi-

▶ 4

* Profesorê zanistiya siyasî, kevneserokê Enstituya Lêkolînên Rojhilatnasiyê.

HAVÎRDOR

# Li İraq'ê hejarî û bandorên şer jîngehê tehdîd dike

EBDULREHMAN SIDÎQ*

Li gor rapora herî dawî ku Dezgeha Navendî Ya Serjimêrî ya ser bi Wezareta Plandanîn û Hevkariya Navdewletî ya İraq'ê eşkere kiriye, 7 milyon îraqî di bin hêla hejariyê de dijîn, ev jimare jî dike rêjeya ji sedî 23'yê rûniştvanên hemû İraq'ê ku hêla hejariyê ji bo her takekesekê di dema mehekê de 77 hezar dînar hatiye diyarîkirin.

Ji aliyekî din ve rêjeya bêkariyê hê di asta ji sedî 15'an de ye, herçiqas di sala 2003'an de nêzîk ji sedî 28 bû. (1)

Di rewşeke wiha de gelek dijwar e em bikaribin di derbarê jîngeh û geşepêdanê biaxiftin, ji ber ku parastina jîngehê wek têgehên demokrasî, mafê mirovan û civaka sivîl, lêborîn, bi hev re jiyan û hwd pêwîstiyek zêde bi civakekê re heye ku aliyê kêm hewcedariyên sereke di jiyanê de dabîn kiribe, her ji ber vê yekê ye jî ku dibêjin: Demokrasî bi vejandina qata navendî di hundirê civakê de girêdayî ye, ji bo ku nabe piraniya civakê hejar û nedar û nexwendewar bin û di heman de jî demokrat bin û ji têgihên nû fehm bikin. (2)

Parastina jîngehê jî ligel gefa hejariyê rûbirû ye û nedar nikarin xema parastina jîngehê bixwen, di demekê de ava paqij ya vexwarinê nagîje wan û elektirîka wan tune û ne xwendewar in jî.

Ji aliyê lêkolînvanan ve gelek pênase bo hejarî û nedariyê hatiye kirin ku cara dawî wiha hatiye gotin: "Hejarî rewşeke dijwar a jiyanê li nedarî, kêmdahatî û bedxorakî û nexwendewarî û nexweşî û jîngeha têkdayî ye, herwiha zêdebûna mirina zarokên şîrxwarî û hemû zarokên ku temenê wan jêrde ye." (3)

Diyardeya hejariyê liser sê bingehan disekine; bêkarî, kêmbûna kirêya kar û cudahiya zêde ya navebra meaşan, vêna ji bilî daketina asta asayiş û aramiyê û diyardeya terorê ye.

Xuya ye ku xelkê xizan û feqîr bi sedema wê pênaseya jor, ji ber nedariyê û li xema domandina jiyaneke dijwar, li jîngeh û parastina pêkhateyên wê nafikirin, belku hejarî wan neçar dike ku ji bo şewat û xwe germkirinê daran bibirin, çavkaniyên pawankirî ên siruştî bikar bînin û ava paqij vexwen, cihê jiyanê ji wan re paqij nayê ragirtin, di hundirê paşmayiyên rojane ên xwe de bijîn û dema bi wê jiyanê jî razî nebin, wê demê bi berfirehî ber bi bajaran dimeşin û heman jîngeha ne tendurust di kêleka bajaran de çêdikin û xesarê dighînin çendîn milyon kesan.

Li gor bernama Neteweyên Yekgirtî ji bo jîngehê (UNDP), ji koma 10 pirsgirêk û astengên pêşberî parastina jîngehê, hejarî di pileya yekem de ye û herwiha ji koma xalên pêşniyarkirî bo çareserkirina pîsbûna jîngehê, dûbare kêmkirina rêjeyê hejariyê her bi pileya yekem tê. (4)

Dewleteke wek İraq'ê ku di sala 1979'an de dahata salane a takekesên wê 4 hezar û 219 dolar bû, di sala 2006'an de ji bo her takekesekê bo hezar û 456 dolar daket, ji ber ku rêjeyê enflasyonê di heman salê de gihîşt ji sedî 53. (5)

Ji ber nedarî û nexwendewariyê hejar wek encamder û sebebkarên pîsbûna jîngehê tên hesibandin, her bixwe jî goriyên yekem ên pîsbûna jîngehê ne, ji ber ku hejarî encama komek sedeman e, di heman demê de jî sedemek e ji bo komek encamên din ên nexwestî.

Di İraq'ê de îro tenê pişt bi petrolê tê girêdan, di halekê de li mêjdem e İraq wek welatê navbera dû çeman hatiye naskirin, xwediyê kiştûkal û çandinî û pîşesaziyek gelek mezin bûye, lê niha tenê neft ji sedî 63 a budceya İraq'ê ye û beşdariya kiştûkalê bo 7 ji sedî daketiye û beşdariya pîşesaziyê jî di budceyê de bo 2 ji sedî daketiye. (6)

Herwiha hevsengiya navebra tex û çînên civakê têk çûye, bi cûrekê ku dema piranî hejar bin, wî çaxî kêmaniyek zêde jî dewlemend dibin û ji ber sûdên bê sînor guh nadin jîngeh û hejaran û bi kargeh û berhemên xwe jîngehê qirêj dikin. Îro di İraq'ê de ku ji sala 2003'an pêde Wezareta Jîngehê hat damezrandin, ez bixwe jî wek yekem Wezîrê Jîngeha İraq'ê û bi alîkariya rawêjkarên warê jîngeha hevpeymanan, me di vê derbarê de me bi destê kêmhişyariya jîngeha hevwelatiyan gelek zehmetî kişandin, ku ji ber xizanî û kêmdahatiyê, li hember her hewleke rasteqîne ji bo parastin û çêkirina jînegê astenga yekem bû.

Xuya ye ku mesela hejarî û bêkariyê peywendiyeke rasterast bi qonaxa piştî kutabûna şerê sala 2003'an heye, û encamên wê di warê jîngehê de bi taybet dan û standina bi alavên paşmayiyên şer ji ber nebûna derfeta kar û kêmbûna hişyariyê di warê zanyariyan de derbarê alavên paşmayiyên şer bi giştî û madeyên tîşkavêj (radyoaktîf), bi taybet ku li encama bikaranîna van madeyên ku bi zorî hatine çêkirin û navend û saziyên leşkerî û sivîl û herwiha bikaranîna xerab û hilgirtina wan madeyan û lawazbûna çavdêrîkirinê, di heyamê salên borî de gelek karesatên mezin derketibûn holê.

İraq'ê ji salên heştê ên sedsala borî pêde, qaseke berbiçav ji wan madeyan di hinek dezgehên taybet de bikar aniye û herwiha li encama bombebarankirina navendên atomî ên İraq'ê ji aliyê balafirên Îsraîl'ê ve di sala 1981'an de û piştre jî şerê İraq'ê û hevpeymanan di sala 1991'an de, dûre şerê İraq û Amerîka'yê di proseya azadkirina İraq'ê de di sala 2003'an de, beşek ji alavên paşdemayî yên navendên nukleerî û alavên leşkerî û tank û amûrên hundirê navendên sivîl yên atomî hatin dizîn û bi wan re kirîn û firotin normal dihat kirin!

Madeyên tîrêjavêj, ji bo heyameke gelek dirêj metirsiyên mezin liser pîsbûna jîngehê û tendurustiya mirov hene, ji ber ku ev made di heyamekî pir dirêj de bandora toxmên tîşkavêj li karkirinê dikevin ku bi nîva temen (Time Half) tê naskirin û gelek car sedan salan dom dike. Me li Wezareta Jîngeha İraq'ê tenê di sala 2003'an de, nêzîk 385 pîvandinên lazeran bo nimûneyên ax û avê encam dan û nêzîk 571 nirxandin jî bo madeyên xorakî ji bo şirovekirina zanîna astên tîrêjê di İraq'ê de meşandin, derket holê ku di hinek cihan de rêjeya hebûna wan madeyan sê qat zêdetirî wê rêjeya normal bûye. Li hinek cihên leşkerî ên bombebarankirî jî panzdeh car ji rêjeya normal zêdetir bû. (7)

Talankirina Navenda Tuweyse û bikaranîna (Uranum Diplited) an ûranyûma bikarhatî, ji wan çekên ku bandora xirab liser gelek paşmayiya tank û otomobîlên leşkerî li herêma Ebuxerîb û Uwêrîc û rêya Bexda û Babil û dû cih jî li Semawe bicîh hiştiye, ji ber ku bi awayekî giştî beriya sala 2003'an, İraq'ê nêzîk 18 navendên leşkerî û sivîl ên madeyên tîşkavêj bo warê zanistî û leşkerî û tendurustî bikar anî.

Ya cihê metirsiyê be ew e ku ew made roleke zêde di zêdekirina cûrên nexweşiya pençeşêrê di İraq'ê de hebûn, bi cûrekê ku nexweşiya pençeşêrê di İraq'ê de heta sala 1989'an di nav nexweşiyan de di pileya heftem de dihat, lê ji sala 1993'an pêde bi pileya çarem tê.

Hin xelk jî di İraq û Herêma Kurdistan'ê de bi mebesta bazirganiya bi wan hesin û hûrdehesinên ku ji alavên paşmahiyên tank û otombîlên leşkerî li pey bombebaranê cîh mane, rasterast danûstandinê bi wan paşmahiyan re dikin û kirîn û firotinê pê dikin, ku di pêşerojê de û piştî çend salên din gelek nexweşiyên bi xeter hest pê dikin, li encama bandora wan madeyên tîşkavêj ên dirêjdem ku bi ser wan paşmayiyên leşkerî ne.

Sedemeke din ya berçav hejarkirina xelkê bi giştî, zêdebûna wan jimara mezin û zêde ya mayinan e ku di İraq'ê de hene ku dikare di warê dîrokî de amaje bi vê yekê bê dan, İraq piştî şerê cîhanî yê dûyem tûşî pirsgirêka çandina mayinan bûye û li peyre jî di salên şêst û heftêyan de Hikûmeta İraq'ê li dijî serhildanên gelê Kurdistan'ê jimareyek zêde mayin di Kurdistan'ê de çandiye, piştre di salên navbera 1980–1988'an di dema şerê İraq û Îran'ê de çendîn milyon mayinên din hatin çandin, vêna ji bilî şerê İraq'ê hevpeymanan li sala 1991 ku jimareyek zêde ya mayinên din ên cûr bi cûr hatine çandin. Di vê dawiyê de jî ev kar binpêkirina eşkere ya 'Peymannameya Qedexekirina Bikaranîna Mayînan' bûye.

Niha ku beşa peydeçûna mayinan û pirsgirêkên wê wek navendekê di İraq'ê de ser bi Wezareta Jîngehê ye û berê jî ser bi Wezareta Plandanîn û Alîkariya Geşepêdanê bû, her li gor serjimêriyên wê wezaretê nêzîk 25 milyon mayin û zêdeyî 3 milyon bombeyên avêtî ên ne teqiyayî di İraq'ê de hene.

Li gor statîstîkên 'Desteya Nîştimanî ji bo Karûbarê Mayînan' jî di İraq'ê de nêzîk 10 hezar û 232 erdên mayinan hene ku nêzîk 3 hezar û 782 erd di Kurdistana İraq'ê de ye û nêzîk 25 cûrên cuda ji wan mayinan jî di Kurdistan'ê de hatine çandin, vêna jî li gor serjimêriyên 'Grûba Rawêjkarên Mayînan' (MAG), jimara ew mayinan jî ku di Kurdistan'ê de hatine çandin, nêzîk 7 milyon tên texmînkirin. (8)

Xesarên mayinan bi awayekî giştî li dijî mirov û jîngehê ye, lewra di salê de jimareyek zêde hevwelatî û çalakên warê hilgirtin û pûçkirina mayinan jiyana xwe ji dest didin yan birîndar dibin, di warê jîngehê de jî mayin sedemeke pîsbûna axê ye û dibe astengeke sereke li pêşberî proseya avedankirin û vegeriyana xelkê ji bo gundên xwe û berlêgirtinê jî dike li pêşberî çêkirina rê û cadeyên nû, kiştûkal û damezrandina kargehên nû û herwiha projeyên elek-

** Endazyarê Rawêjkar, lêkolîner, Serokê Navenda Pird* ji bo lêkolînan li Herêma Kurdistan'ê û yekem Wezîrê Jîngehê yê Hikûmeta İraq'ê di salên 2003–2004.*



*Rebwar Saeed, (Acrylic on wood) - Efekt LMD kurdî*

trîkê û agahîdan û ronîkirin bi sedema nebûna şiyana wan ji bo çeqandina bircên nû li hemberî kulandina bîrên nû ên avê û li beramberî vekirina kanalên avdaniyê û lêgerîn û geriyan li pey peydakirina petrolê, geriyan li pey peydakirina madenên cûr bi cûr ên din de jî rêgiriyê dike. Ango bi awayekî giştî mayin li hemberî jîngehê pêşdebirinê rêgir e û sedemek e ji bo hejarkirina Îraq'ê û Herêma Kurdistan'ê di hemû wna waran de ku me amaje da wan. Pêwîst e Wezareta Jîngehê li kêleka pîvana rûberê wan erdên mayinrêjkirî û diyarîkirina jimara durust û derxistina cûrên wê û peydakirina nexşeyên çandina wê jimara zêde a mayinan, sûd û fêde li endambûna Îraq'ê dii 'Peymannameya Qedexekirina Bikaranîna Mayînan' de bê wergirtin û herwiha alîkariyan pêşkêşî Civata Parastina Jîngehê bike ku nûnerên piraniya wezaretan têde ye, ji ber ku ji ber hestyarbûna meselya mayin û şûnwarên wê dikare roleke berbiçav hebe di warê kêmkirin û ji holê rakirina cihwarên xerab ên mayinan û xesar û ziyanên wê ên giştî û jîngehê.

Îro bi lezgînî û bê peydeçûn pêwîst e rewşa hejaran bê başkirin û hînî xwendewariyê werin kirin û karîn û şiyanên xwe bikar bînin, cihê niştecihbûna paqij ji bo wan were dabînkirin, ji ber ku hejarî gefek e bo ser ewlekariya jîngehê û piştre jî liser asayişa nîştimanî, lewra pêwîst e çareserî evya bin:

Yekem: Ji holê rakirina nedarî û hejariyê, berî her tiştî bi başkirina dahata takekes û xizmetguzarî û reformên aborî.

Dûyem: Zêdekirina baca navendî, ji ber ku ne hejarê nedar û ne dewlemendiya bêrade tu yek di fikra parastina jîngehê de nabin, hejar ji ber nedariyê û dewlemend jî ji ber sûd û fêdeyan!

Sêyem: Reformekirin di sîstema desthilatdariyê de û kêmkirina diyardeya gendeliyê.

Çarem: Zêdekirina qata navendî ya civakê, ji ber ku hejarê nedar û dewlemendê bêrade, tu yek ne di fikra parastina jîngehê de dibin, xizan ji ber nedariyê û dewlemendên mezin jî ji ber sûd û fêdeyên xwe!

Pêncem: Tevlîbûna Îraq'ê di lihevhatin û peymannameyên navdewletî û îmzakirina wan ji aliyê Îraq'ê ve, ji ber ronîkirina van xalan û yên din jî, em dikarin di Îraq'ê de giringiyek zêde bidin parastina jîngehê û dest bidin bihêzkirina şiyanan û karînên nû biafirînin û bi belavkirina rewşenbîrî û hişyarîdan bo parastina jîngehê.

**Werger ji soranî**
**Azad Kurdî**

*Ev nivîs ji bo LMD kurdî hatiye nivîsandin*

---

(1) Rapora sala 2009'an a Dezgeha Navendî ya Statîstîkên Îraq'ê.

(2) Dr. Mihemed Hamid, Govara "Alem El – Îqtisad", hejmar 27, Kanûna 1995

(3) Dr. Elî Husên, pirtûka 'Jîngeha Îraq'ê, Aso û Pirsgirêkên wê', rûpela 112

(4) Malpera www.unep.org

(5) Rapora sala 2006'an a Wezareta Plandanîn û Hevkariya Navdewletî ya Îraq'ê.

(6) Çavkaniya berê

(7) Rapora Navenda Xweparastina ji Tîşkavêjan, Wezareta Jîngeha Îraq'ê.

(8) Rêxistina Paqijkirina Mayinan li Îraq'ê, Tora Zanyarî (El Niba) 07/10/2008

# Mezintirîn pirsgirêka li pêşiya siyaseta navneteweyî

1 ◀

gire, çareserkirina pirsgirêka kurd ji bo siyaseta navneteweyî jî xwedî giranî ye.

Ji dema hilweşandina rejîma Saddam û vir ve, li Bexda'yê ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd li her qadê perspektîfên nû derketin holê; di nava kurdan bi xwe de, li derdora herêmî û di helwesta civaka navneteweyî de.

Di tevahiya sedsala 20. de kurdan nîşan da ku daxwaza wan a neteweyî bi tedbîrên zor û zextê nayê tepisandin. Hê di salên 90'î de di nava şertên ambargoya li dijî Bexda'yê de li bakurê Îraq'ê (Başûrê Kurdistan'ê) siyasetvanên kurd ên herdu komên mezin ên siyasî, karîbûn dest pê bikin struktûrên rêveberiyeke xweser ava bikin. Ev pêvajo piştî hilweşîna rejîma Baas'ê ya xwe disipart desthilatdariya neteweperestiya ereb jî dewam kir. Hikûmeteke bi îstîqrar a Kurdistana Îraq'ê (Başûrê Kurdistan'ê) heye û her weha sîstemeke bi îstîqrar a parlamenteriyê ku hê mirov nikare weke standartên ewrûpî pêşketî bibîne, dîsa jî weke ku hilbijartinên herî dawî nîşan dan, derfetê dide beşdariyeke fereh a gel. Struktûrên rêvebirinê û perwerdeyê hê tên avakirin û hatina pereyên ji petrolê bingehekî rêveberiyê ji bo van pêk bîne, çêdike. Girêdana bi tevna çûnûhatina navneteweyî ve û rêze konsolosxaneyên tên vekirin, nîşana asta naskirina navneteweyî ya zêde dibe û asta têkilîdanîna rêveberiya otonom a kurd li bakurê Îraq'ê (Başûrê Kurdistan'ê) ye. Têkiliyên yekser ên lîderên kurd li welatên cîran, beriya hemûyan li Enqere û Tehran'ê kirin ku mirov pê derxe ku rêya kurdan a ber bi hebûna siyasî ve ku derfetê dide wan nasnameya xwe ya kurdî bînin ziman, Tirkiye û Îran jî weke prensîp asê nakin.

Ka divê avakirina Îraq'eke Federal weke dewlet çawa bibe û gelo bi vê wê derfeta gelê kurd çêbibe nasnameya xwe ya neteweyî bi awayekî ferehtir bîne ziman, bi awayekî hilbijartinên Adara 2010'an wê bersivê bide van pirsan. Bûyerên li Kurdistana Îraq'ê (Başûrê Kurdistan'ê) li welatên cîran jî ji nêz ve tên şopandin. Ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd li Tirkiye'yê van salên dawiyê bûyerên girîng diqewimin. Hê di salên 90'î de tirsa jihevdeketin û parçebûna Îraq'ê ber dida siyaseta Enqerê ya beramberî Îraq'ê. Li gorî vê tirsê wê valatiyek peyde bibûya, ku bi xêra vê valatiyê hêzên dijtirk çalakiyên eskerî li dijî Tirkiye'yê pêk bianiya. Siyaseta Tirkiye'yê ya beramberî Îraq'ê di serî de bi fikarên der barê ewlekariyê de dihat diyarkirin. Bi dagirkirina Îraq'ê ji aliyê DYE'yê û hilweşîna rejîmê re ev tirs û fikar zêde bûn. Ti tiştî Enqere ji pêkhatina dewleteke kurd li Bakurê Îraq'ê (Başûrê Kurdistan'ê), bêhtir neditirsand. Filmê tirkan "Geliyê Guran (Kurtlar Vadisi)" têkelbûna têgihiştina tirk a neteweperest, dij-kurd û dij-emerîkî bi awayekî bi bandor nîşan dide.

Di salên dawiyê de helwesta aliyê tirk ango hikûmeta tirk ku Erdoğan Serokwezîrê wê ye û Serokkomar (wezîrê karê derve yê berê) Abdullah Gül nerm bû. Serdanên dualî di navbera Enqerê û Hewlêr'ê û her weha Silêmaniyê de pêk hatin. Karsazên tirk gelekî xurt angaje ne li Kurdistana Îraq'ê (Başûrê Kurdistan'ê). Bi vê nermbûnê re li Tirkiye'yê hewldanên ji bo çareserkirina "pirsgirêka kurd" jî hene. Hikûmetê kampanyayeke xurt da destpêkirin ku pê bi naskirina nasnameya çandî û mafên siyasî yên berfereh di çarçoveya berferehkirina sîstema demokratîk a Tirkiye'yê de bersivê bide daxwazên kurdan.

Bûyerên vê dawiyê yên li Tirkiye'yê jî nîşan dan ku hikûmet ji çareserkirina "pirsgirêka kurd" gelekî dûr e. Di şerê desthilatdariyê yê di navbera elîta dewletê –çi eskerî, çi sivîl – ya kemalîst û AKP'ê de pirsgirêka kurd li herdu aliyan jî weke amûrekî tê bikaranîn. Elîta kemalîst a kevneparêz konsepta yekparebûna dewleta tirk datînê hemberî siyaseta hikûmetê ango siyaseta li ser riya demokratîkbûyînê ber bi civakeke nû ya li Tirkiye'yê ve ya ku têde pirrengiya siyasî û çandî tê qebûlkirin. Ango pirsgirêka kurd tînin ser ''têkoşîna li dijî terora PKK'ê.''

Bernameyeke bi vî rengî ku çarçoveya wê ji sala 2005'an û vir ve xwe dida der, dike ku artêş ji nû ve bi rola navendî rabe. Ji dema ku AKP bûye desthilatdar û vir ve rolê artêşê di dewletê de kêm bûbû. Bi destpêka doza bi navê "Ergenekon'ê" re zexteke mezin li ser eskeriyê peyde bû. Gav bi gav tevlîbûna eskeriyê ya nav planên darbeyê, hewldanên afirandina bêramiya civakî û siyasî heta bi planên reşkujiyê yekoyeko tên eşkerekirin. Ya li Tirkiye'yê îro diqewime ne kêmtirî jinûveavakirina sîstema dewletê di sêgoşeya dewlet – artêş (û elîta dewletê ya sivîl) – civakê de ye. Vê dema dawiyê qedexekirina Partiya Civaka Demokratîk (DTP) careke din mêzîna hêz û desthilatdariyê bi awayekî bel û dîq raxist ber çavan. Qerqeşûn û aloziya piştî vê û tepisandina çalakgerên kurd nîşan da ku aliyê tirk xwe ne bitenê dide ber bêaramiya siyaseta hundir, heta ev yek parçeyekî stratejiyê ye. Bi şerê ''li dijî terorîstan û cudaxwazan'' ji artêşê (û muxalefeta siyasî) mafê destwerdana eskerî li dijî Kurdistana Îraq'ê (Başûrê Kurdistan'ê) tê stendin.

Divê pêşketina pirsgirêka kurd li Tirkiye'yê, di çarçoveyeke ferehtir a herêmî de were dîtin. Ne mumkin e mirov nebîne ku Hikûmeta AKP'ê zend û bend badana ku di qada herêmî de siyaseteke lihevkirin û navbênkariya di pirsgirêkan de bişopîne. Formulên Wezîrê Karê Derve Ahmet Davutoğlu ji bo vê dîtî, carcaran navê "kûrbûna stratejîk" û carinan navê "siyaseta pirsgirêk tine" li wan tê kirin. Ev siyaset tevahiya Rojhilata Nêzîk û welat û pirsgirêkên Qafqasan di nava xwe de dihewîne. Serketina herî dawî ya hêja ye mirov bibîne lihevkirina bi Ermenîstan'ê re ya Cotmeh'a 2009'an bû. Ev serketin jî li Tirkiye'yê rastî berxwdaneke mezin a netewperestên radîkal tê. Ev siyaseta derve ya xwe dispêre lihevkirinê û bêhtir demokratîkbûyîn û pirrengbûyîna li hundir, li hev dikin. Di siyaseta hundir a Tirkiye'yê de serketineke elîtên berê yên desthilatdariyê wê bike ku dîwarên berê – her weha ji awirê li kurdên Bakurê Îraq'ê (Başûrê Kurdistan'ê) ve – ji nû ve werin lêkirin.

Li Tirkiye'yê pirsgirêka kurd bi rastî jî xwe xistiye rojevê, li hemberî vê li Îran'ê ti liv û tevger nîne (jixwe qet navê em behsa Sûriye'yê bikin). Li Îran'ê sîstem navendî dimîne; ji dema tepisandina daxwazên kurdan piştî Şoreşa Îslam'ê ya sala 1979'an û vir ve, ti gav ji bo dana mafên siyasî û çandî nehatiye avêtin. Li navenda "siyaseta kurd" a Tehran'ê, li Kurdistana Îran'ê (Rojhilatê Kurdistan'ê) tepisandina hêzên muxalif ên bi rastî û yên zen jiwan tê birin muxalif in, heye. Di vî karî de jî Muhafizên Şoreşê û eskeriya Îran'ê bi hêzên eskerî yên Tirkiye'yê re hevkariyê dikin.

Ji dema dawîlêhatina Împeratoriya Osmaniyan û vir ve pirsgirêka kurd her meseleyeke siyaseta navneteweyî bû. Ev yek roja me ya îro jî bi vî rengî ye û bi du awayan e: Ya li pêş xuya dike ew e ku pirsgirêkên etnîk îstîqrara tevahiya herêmê dixin tehlûkê; dema ku mirov berjewendiyên aborî yên pêwendî enerjiyê yên civaka navneteweyî li ber çavan bigire, ev îstîqrar xwedî girîgiryeke mezin e. Li aliyekî pirsgirêka gelekî bingehîn a gelê kurd a maf û diyarkirina çarenûsa xwe bi xwe û li aliyê din jî desthilatdariya li ser erdên xwe ya dewletên heyî, bi kêmanî di heman astê de girîng in. Şer û pirsgirêkên li Yugoslavya'ya berê û îlankirina serxwebûnê ya Kosova'yê dikin ku civaka navneteweyî bibîne ka ev pirsgirêk heta bi ku derê dikare biçe.

Mirov çawa dikare bike ku daxwaza kurdan ya dewleta xwe "Kurdistan'ê", ku di dehsalên dawî de herî xurttir tê ziman û mafê desthilatdariya li ser erdên xwe ya dewletên piştî şerê cîhanê yê yekemîn pêk hatin (û Îran'a ku dewletbûna wê gelekî kevintir e) li hev bikin? Divê civaka navnetweyî di çareserkirina vê pirsgirêkê de cihê xwe bigire: Neteweyên Yekgirtî, DYE û Yekîtiya Ewrûpa'yê. Paşeroja Îraq'ê divê xwe bisipêre statuyeke huqûqa dewletan, ku bi hev re jiyana ereb û kurdan li ser hîmê nasnameyên wan bi xwe, mumkin bike. Gelê kurd divê bibîne ku di vê statuyê de daxwaz û hîsên wî yên neteweyî li ber çavan hatine girtin. Di heman demê de divê li dewletên cîran jî kurd bibin xwediyê statuyekê ku pêkanîna mafên wan ên siyasî û çandî misoger dike.

Awira me li ser Tirkiye'yê be, rolekî kilît dikeve ser milê YE'yê. Bruksel divê bi awayekî eşkere û xurt destekê bide demokratîkbûyîneke reh û rîşên xwe kûr diçin ya Tirkiye'yê ku Serokwezîr Erdoğan weke rê daniye ber xwe – bi taybetî jî li dijî dijberên vê pêvajoyê.- Bi perspektîveke endametiya YE' yê û bi pêkanîna tevahiya mafên hindikahiyan ku li YE'yê tên qebûlkirin, tirk û kurd wê hîmekî nû yê bi hev re jiyaneke aştiyane peyde bikin.

Divê berjewendiyeke Almanya'yê jî di vê yekê de hebe. Ji çar paran yekê koçberên ji Tirkiye'yê kurd in. Di van salên dawiyê de di nava penaberan de ku ji bo mafê penaberiya siyasî serî li Almanya'yê didin, di statîstikan de hejmara yên ji Tirkiye'yê ya herî zêde ye. Di salên 90'î de pirsgirêka di navbera kurd û tirkan de bi awayê şîddetê xwe li ser kuçe û riyên Almanya'yê da xuyakirin. Vê yekê zirar li her kesî kir: Îmaja tirkan, kurdan û ya Tirkiye'yê bi tevahî li ber çavên raya giştî ya alman neyênî bû. Li aliyê din gelek têkiliyên siyaseta Alman bi aliyan hemûyan re hene, di serî de li Tirkiye'yê, belê her weha li Bakurê Îraq'ê (Başûrê Kurdistan'ê). Hikûmeta Berlîn'ê divê vê yekê ji berê bêhtir bi kar bîne da ku para wê jî di çareserkirina "pirsgirka kurd" û bi vê ve girêdayî bi îstîqrarkirina herêmekê de hebe ku di warê siyasî û aborî de di sîstema navneteweyî de xwediyê girîngiyeke mezin e. Piştî jihevketina Împeratoriya Osmanî, ev cara pêşî ye ku helwestên sereke yên realîst yên ji bo çareseriya pirsgirêka kurd xwe nîşan didin. Pêkanîna vê her weha di destê kurdan de ye. Ji bo pêkanîna van di navbera vîzyon û rastiyê de divê ji lihevkirinê re amade bin.

**Wergera ji almanî**
**Lokman Turgut**

*Ev nivîs ji bo LMD kurdî hatiye nivîsandin.*

## *Rebwar Saeed*

Di sala 1962'an de li Başûrê Kurdistan'ê li bajarê Silêmanî jidayik bû. Li London'a Brîtanya'yê di Akademiya Huner de xwendiye û niha jî xwendina doktoraya xwe didomîne. Di heman demê de li Silêmanî di Fakulteya Hunerê de wek mamoste dersên wênesaziyê dide. Endamê rêvebiriya muzexaneya Silêmanî ye.

Lig elek bajarên Ewrûpa, Kanada û Amerîka'yê tevlî pêşengehan bûye. Di Biennali'de temsîla Kurdistan'ê kiriye. Rebwar Saeed li gel wênesaziyê seramîk, peyker û dekorasyonê jî çêdike. Di berhemên wî de mirov hîsa rêwîngiyê dike. Ew di wêneyên xwe de ornamentên dîrokî bi teknîka nûjen ya roja me re bi awayekî serkeftî têkel dike.

EWRÛPA

# Di sedsala 21'an de wêneya siyasî ya Ewrûpa'yê

Ahmet Dere*

**Di van salên dawîn de rengê siyaseta Ewrûpî ya hindirîn ji sor derbasî şîn bûye. (Sor = Çep û Sosyalîst, Şîn = Xirîstiyan Demokrat û rastgirên din). Bi taybetî hatina Angela Merkel, di sala 2006'an de, ya Birêz Nicolas Sarkozy, di sala 2007'an de û ya Birêz Silvio Berlusconi re, di sala 2008'an de, rengê şîn bandora xwe li ser jiyana rojane ya tevahiya Ewrûpa'yê nîşan dide. Heman rewş liser hikûmetên hemû welatan de jî tesîrekê giran çêkiriye.**

Ji Şerê Cîhanê yê Duyemîn û vir ve, di wêneyê siyaseta Ewrûpa'yê de guherînekê girîng çêbûye. Bi taybetî ji salên 1980'ê vir ve ev guherîn weke pirrengî derketiye pêş û hê baştir xuya dike, bandora wê jî heye. Wisa diyar e ku êdî li vê parzemînê yek nêrîneke siyasî nikare bi dehan salan desthilatdariyê bike û hikûm bajo. Pêşketinên demokratîk ku li Ewrûpa'yê çêbûnin weke encamekê heman guherînan e. Lewre civakên Ewrûpî wisa bihêsanî dest ji pirrengiyê bernadin û xwe ji mentalîteya ku wan afirandiye dûrnaxin. Li gorî ku tê dîtin, her ku diçe li Ewrûpa'yê dewlemendiya siyasî pêşdikeve. Ev rastî di niqaşên hemû saziyên YE'yê de derdikeve pêş.

Dema ku mirov li dîrokê dinêre Ewrûpa di demeke bizehmet de derbas bûye. Însanên vê parzemînê gelek zehmetî dîtine. Piştî şerên ku bi salan qewimîne di navbera civakên vê herêmê de konsenûsekê çêbûye. Ji ber vê rastiyê mirov dikare siyaseta heyî ya Ewrûpa'yê li ser bingeheke saxlem bibîne. Ev rastî ji Ronêsans'ê vir ve (1500) pêş ketiye û didome. Di dîrokê de baş dixûyê ku heya salên 1800'î rêberên olî (ên dêran) di qada rêveberiyê de xwediyê serdestiyekê ne. Lê belê ji salên 1800'î vir ve di qada rêberiyê de guhertin çêbûne. Di cewherê bingehîn de zêde guhertinên mezin tinebin jî ev weke destpêka pêvajoyeke nû dikare bê dîtin. Bêguman ji bo hemû saziyên ku rêberiyê dikin ya herî girîng parastina berjewendiyên dewletan e. Bi taybetî ji salên 1950'î vir ve li vê parzemînê mijara mafên civakê derketiye pêş.

Li gorî pêwîstiyên dewletan û yên civakê, an jî civakan, di van salên dawîn de rengê siyaseta Ewrûpî ya hindirîn ji sor derbasî şîn bûye. (Sor = Çep û Sosyalîst, Şîn = Xirîstiyan Demokrat û rastgirên din). Bi taybetî hatina Angela Merkel, di sala 2006'an de, ya Birêz Nicolas Sarkozy, di sala 2007'an de û ya Birêz Silvio Berlusconi re, di sala 2008'an de, rengê şîn bandora xwe li ser jiyana rojane ya tevahiya Ewrûpa'yê nîşan dide. Heman rewş liser hikûmetên hemû welatan de jî tesîrekê giran çêkiriye. Hilbijartinên li Belçika'yê ku di sala 2007'an de pêk hatin, bandora partiyên rastgir li vî welatî zêdetir kir. Li vî welatî Partiya Xirîstiyan Demokrat bi % 31'ê dengan bû yekemîn partî. Tê zanîn ku li Fransayê jî partiya UMP, ya Sarkozy weke partiya yekemîn derketibû pêş. Li Îtalyayê jî, di hilbijartinên Nîsan a 2008'an de, partiya rastgir ya Berlusconi ji % 47'ê dengan girtibû. Digel hevkariya ku di navbera partiyên Îtalya yên çepgir de hate avakirin, dîsa jî wan nikaribû ji % 38'ê dengan zêdetir bistînin.

Bi rewşa welatan ve girêdayî, ji sala 2006'an û vir ve, di nava saziyên YE'yê de jî heman guherîn tê dîtin û bandora wê zêde dibe. Ji sala 2007'an û bi şûn de, hinekî Birêz Hans-Gert Poettering, ku bi eslê xwe alman e û ji partiya CDU'ye, weke serokê Parlemena Ewrûpa'yê hatibû hilbijartin, di vê saziyê de jî giraniya Xirîstiyan Demokratan zêdetir bûye. Çendî serokatiya heman parlemenê niha derbasî Sosyalîstan bibe jî ev nayê wateya ku bandora rastgiran kêm bûye. (Ev guherîn li gorî konsansusa di navbera komên siyasî yên PE'yê çê bû. Her carê komekê cuda serokatiya vê saziyê digire destê xwe). Dema ku mirov li siyaseta saziyên ewrûpî dinêre giraniya rastgiran pir aşkere tê dîtin. Lewre nêzîkatiya saziyên vê Yekîtî'yê her ku diçe li gorî pozisyona rastgiran pêşdikeve.

Di rojên 5 û 7'ê Hezîran a 2009'an de li 27 welatên endamên Yekîtiya Ewrûpa'yê hilbijartinên Parlemena Ewrûpa'yê pêk hatin. Ji bo hilbijartina 736 parlementeran nêzîkê 450 mîlyon ewrûpî çûn ser sandoqan. Ji dema avakirina PE'yê û vir ve, yanê ji sala 1979'an vir ve, ev bû cara 7'an ku ewrûpî çûn ser sandoqan û nûnerên xwe hilbijartin.

Ji bo ku rewşa hêzên siyasî, ên ewrûpî were fêmkirin baş e ku em bihev re çav bavêjin encama hilbijartinên destpêkê û ên dawî. Di sala 1979'an de di PE'yê de Koma Sosyalîst hêza herî mezintirîn bûye, rêjeya wî a dengan ji %27.3 bûye. Koma Xirîstiyan Demokrat hêza duyemîn bûye, rêjeya wî a dengan ji %26.3 bûye. Rewşa Komên din jî wiha bûne; Koma Demokratên Ewrûpa'yê %15.3, Koma Komunîst; %10.7, Koma Demokratên Lîberal; %9.7, Koma Demokratên Ewrûpa'yê; %5.3.

Piştî 30 salî rewş bi vî awayî hatiye guhertin; Koma Xirîstiyan Demokrat; %35.9, Koma Sosyalîst; % 22, Koma Lîberal; % 10.9, Koma Keskan; % 7.1, Koma Neteweyên Ewrûpa; % 4.8, Koma Çep; % 4.5.

Li gorî van encaman komên ku herî zêde hêzên xwe winda kirine ên Sosyalîst û Çep in. Koma ku herî zêde hêza xwe parastiye û her wiha zêde kiriye ya Xirîstiyan Demokratan e. Komên Keskan û ên Rastgirên Nasyonalîst jî hêzên xwe zêde kirine. Bêguman ev rewş mirov dike nava pir fikaran. Ger wisa bidome wê paşeroja Ewrûpa'yê bikeve bin bandora rastgiran. Ger hêzên çepgir xwe bihêz nekin wê ev rewş hêza Ewrûpa'yekê sosyal qels bike. Lewre hêzbûyîna sosyalîst û çepgiran pir girîng e.

Di rastiya bûyera hêzbûyîna rastgiran de rola belavebûyîna çepgiran mezin e. Mixabin partiyên çepgir di warê stratejîk de ketine nava nediyariyekê. Hin caran û li hin welatan, hêzên çepgir nizanin ka ew çi bikin. Li hemberî hêzbûyîna rastgiran ew car carna dikevin nava hejmarên pir pragmatist. Di vî warî de ez bawer im serê civaka Ewrûpa'yê jî tevlihev e. Heman mijar di Parlemena Ewrûpa'yê de jî dixûyê û bibandor e.

Encama hilbijartinên Parlemena Ewrûpa'yê ji bo Tirkiye'yê jî pir girîng bû, wisa diyar e ku ew bi xwe re zehmetiyan jî derdixin holê. Encama van hilbijartinan bûye sedemê ku nêrîna Sarkozy û ya Birêz Angela Merkel, a di derbarê pêvajoya guftugoyên bi Tirkiye'yê re, her ku diçe xurttir dibe. Di bingehê de ez dikarim bêjim ku ji bo kurdan jî zêde guhertin çênebûne. Belkê Xirîstiyan Demokrat, Kesk û Rastgir ji Sosyalîstan baştir nêzîkê pirsgirêka kurd bibin. Digel çend mehên borî ev hê ne diyar e, lêbelê ji bo ku wisa nebe zêde sedem jî tinene.

Li gorî vê tabloya heyî wisa dixûyê ku hêzên sosyalîst û çepgir xwe nû nakin û ji daxwazên civakê re nabin bersiv. Heke di stratejiya van hêzan de guhertin çênebin wê her ku biçe ew ên zêdetir winda bikin. Dema ku çepgir nikaribin li berpirsyartiyên xwe xwedî derkevin civak berbi hêzên rastgir ve diçe.

## Amerîka û Ewrûpa

Ji destpêka sedsala 21'an vir ve wisa hatiye dîtin ku YE'yê xwe zêdetir nêzîkî Amerîka'yê dike. Nuansa siyasî ku heya niha di navbera van du hêzan de heyî her ku diçe kêm dibe. Lê-

* *Lêkolîner.*



*Rebwar Saeed, (Acrylic on wood)*

belê ev nayê wateya ku Ewrûpa wê bikeve bin bandora Amerîka'yê û ji daxwazên wê re serî deyne. Ji ber ku Ewrûpa xwe mîna dayîka Amerîka'yê dibîne ew naxweze ti car bikeve bin bandora yekser a serdestiya vê hêzê. Digel ku hêzên rastgir li Ewrûpa'yê xurt bûne û di pir welatan de bûnin desthilatdar, wisa dixûyê ku di wêneyê herî dawî yê siyaseta Ewrûpa'yê de xala ku herî zêde derdikeve pêş ev e: Ewrûpa wê bi rêbazên xwe ên nû nêzîkê Amerîka'yê bibe. Heman nêzîkatî zêdetir di siyaseta wê ya derve de jî tê dîtin. Bêguman bi vê rastiyê ve girêdayî bandora çanda Amerîka'yê jî li heman herêmê belavtir dibe. Herçend rayedarên ewrûpî di zanistiya vê fenomenê de bin, ez bawernakim ku civaka ewrûpî xwediyê heman zanistiyê be.

Bi taybetî ji destpêka sedsala 21'an vir ve her kesê ku dibe nûnerê taybet yê bepirsyarê karê derve yê YE'yê (di dema borî de Birêz Xavier Solana bû niha jî Birêz Xanim Catherine Ashton e) zêdetir bi pirsgirêkên cîhanê ve eleqedar dibin. Di van salên dawî de jî em baş dibînin ku Ewrûpa li hemberî pirsgirêkên li Afganistan'ê û li Rojhilata Navîn zêdetir aktîf bûye. Di derbarê van herêman de bi Ewrûpa bi Amerîka'yê re di nava têkiliyên teng de ye. Di meşandina van têkîliyan de jî dîsa nêzîkatiya partiyên rastgir zêdetir bibandor e. Ger wisa bidome wêneyê siyasî yên Ewrûpa'yê û Amerîka'yê hev du temam dikin.

Ji destpêka sala 2009'an vir ve atmosfera siyasî a cihanê û her wiha ya herêma Rojhilata Navîn û Ewrûpa'yê berbi rewşeke nû ve diçe. Serokê nû yê Amerîka'yê Birêz Barack Obama di merasîma sondxwarinê de wiha digot; " Cîhan diguhere, divê em jî xwe biguherînin." Obama di serdana xwe ya li Tirkiye'yê de jî (6-7'ê Nîsan a 2009) heman gotinan anîbû ziman. Di hemû axiftinên wî de gotinên "guhertin" û "veguhertin" tê dubarkirin. Lê belê hê jî naveroka heman gotinan nehatiye tijekirin, kes jî nizane ka wê çawa tije bibe.

Li kû dibe bila bibe pêwîstiya bi guhertinê rastiyeke aşkere ye, ev rastî tenê ji aliyê Obama ve nayê dîtin, ji bo hemû cihanê ew xaleke biwate ye. Dema ku em li rewşa cîhanê û bûyerên objektîf dinêrin, baş tê dîtin ku ji her aliyê ve sedsala 21'an ji a 20'an wê cudatir be. Pêşketinên ku mirovahiyê di cewherê xwe de çêkiriye bi şert û mercên sedsala borî nikare têr bibe û ew sînorên pêşerojê nas nake.

Beriya ku Obama bibe Serokê Amerîka'yê dihate xuyan ku wê di siyaseta vê hêzê de guherînên bingehîn çêbibin. Ne ku Obama pir serkeftî bû, an jî civaka reşan li Amerîka'yê pir bihêz û xurt bûye ku ev guherîn di asta serokatiyê de ferz bû û pêkhat, ya herî esasî ew e; rastiya bingehîn ku li Amerîka'yê ev guherîn ferz kiriye rewşa objektîf ya cîhanê ye. Pêwistiyên mirovahiyê vê hêzê mecbûrî guherîneke di asta jorîn de kiriye. Ji ber vê yekê serokatiya Obama weke bersiva daxwazên pir derdoran derketiye pêş. Barack Obama li Ewrûpa'yê jî hate destekkirin û hê jî hezkirinekê li hemberî wî heye.

Niha pirsa herî girîng ew e ku wê ev daxwaza guherînê çawa pêkwere, ka wê Amerîka û cîhan berbi kû ve biçin. Ji destpêka vê sedsala 21'an vir ve ev mijar pir tê niqaşkirin. Digel hemû rastiyan hê jî ne diyar e ku beriyê vê pêvajoya guherînan bikû ve ye. Tenê ez dikarim li gorî rewşa heyî, û bi gotinên giregir, teqmîn bikim ku wê ev pêvajo bikû ve biçe. Xalên nediyar ji ên diyarbûyî zêdetir in. Ev ne tişteke ku rêveberiya Amerîka'yê, an jî ya YE'yê dikare biryar bidê ye. Lewre Obama û ekîba wî jî di vî warî de baş zelal nîn in, rastgirên ewrûpî jî wisa.

Beriya her tiştî, û li gorî ku me ji dîrokê ders girtiye, çi dibe bila bibe, di guherînan de wê mijarên di derbarê mafên mirovan û pêşxistina demokrasiyê de zêdetir lipêş bin. Rêveberên amerîkî jî baş dizanin ku, bêyî guherînekê demokratîk ew nikarin di cîhana heyî de berjewendiyên xwe ên hegemonîk biparêzin. Digel vê rastiyê dîsa jî divê em li benda netbûyîna asta siyasî a pêşerojê bin.

Piştî hilbijartina Obama û her wiha ên PE'yê, bi taybetî ji mehên dawiya sala 2008'an bi şûn de rewşeke nû ketiye rojeva niqaşan. Ez dikarim bêjim ku hêzên navnetewî ketin nava helwesteke nû. Amerîka û Yekîtiya Ewrûpa'yê bihev re li ser hewldanên ji bo pêşxistina konseptekê nû disekinin, rayedarên wan ên pêwendîdar bihev re kar dikin.

Ne ecêb e ku hêzên weke Amerîka û Yekîtiya Ewrûpa'yê tim di nava hewldanên lezgîn de bin ku berjewendiyên xwe biparêzin û wan pêşbixin. Di çarçova vê armancê de salên 2010 û 2011 ji bo heman hêzan girîng in. Wisa dixûyê ku di van du salan de ew dixwezin konseptekê nû ya cîhanî bihevre bimeşînin.

*Ev nivîs ji bo LMD kurdî hatiye nivîsandin.*

PÎŞTÎ LÎZBON'Ê

# Kî siyaseteke derve ya Ewrûpa'yê dixwaze?

FEDERICO SANTOPINTO*

**Wezîfedarkirina li ser nîqaş tên kirin a Herman Van Rompuy ê belçîkî û Catherine Ashton a brîtanî weke serokê Konseya Ewrûpa'yê û nûnera bilind ji bo Yekîti'yê, ji bo siyaseta derve û ya ewlekariyê di 23'ê Mijdara 2009'an de piştrast dike ku dewletên endam dixwazin kontrola xwe ya li ser siyaseta derve ya hevpar dewam bikin. Peymana Lîzbon'ê bi kedeke mezin û bi awayekî nezelal hat erêkirin, zelalkirinên pêwîst ji muzakereyên nemisoger ên paşerojê re hiştin.**

Jêre 8 sal hevdîtin, rêzik, konferansên navhikûmetî, referandûmên tesîra trawmayê kirin, lihevkirin û civînên bilind ên Ewrûpa'yê diviyabû ku Peymana Lîzbon'ê pêkbînin – ji bo vê diviyabû dev jî peymana destûra bingehîn were berdan.- Peyman 1'ê Kanûna 2009'an kete meriyetê. Ev "dewra şer" hê jî bi dawî nebûye. Di qada temsîlî ya di siyaseta derve de, reformên destûra bingehîn ên ku diviyabûn karên derve yên Yekîtiya Ewrûpa'yê bêhtir lihevkirî bikira, di dawiyê de şibiyan mamikekê: formulasyonên şîlo û nediyar yên peymanê xwe nadin ber ti tiştî û her tiştî paşve dixin û îhtîmal e hevdîtinên piştî ku reform dikevin meriyetê zehmettir dike.

Di nava nûkirinên sereke de sazkirina erka serokê daîmî yê Konseya Ewrûpa'yê (ji bo demeke du sal û nîvan ku dikare carekê were dirêjkirin) û erka nûneriya bilind a Yekîti'yê ji bo Karên Derve û Siyaseta Ewlekariyê hene. Konseya Ewrûpa'yê 23'ê Mijdara 2009'an ev herdu erk dan Herman Van Rompuy ê belçîkî û Catherine Ashton a brîtanî. Her weha Beşa Karên Derve ya Ewrûpa (SEAE) jî hat sazkirin û nûnera bilind wê birêve dibe. Nûnera Bilind di heman demê de erka Cîgirê Serokê Komîsyon'ê jî bi cih tîne. Ev avahiya nû sîstema sazûmaniyê ya heyî temam dike (weke mînak her 6 mehan careke bi dorê guherandina serokatiya Yekîti'yê weke berê hatiye hiştin), bêyî ku kite bi kite kordînasyona tevahî rave bike (1). Nebûna hevgirtina pratîka siyaseta derve ya ewrûpî encama nakokîyekê ye ku ji berê ve di avahiya civakî re derbas dibe. Li aliyekî dewletên endam yeqîn dikin, eger ew nebin yek li dinyayê her biçe ew ê bêhtir marjnal bibin. Li aliyê din ditirsin ku siyaseteke derve a hevpar pêş bixin ku kontrola wan li ser wê nebe. Bi kurtebirî, daxwaza wan Ewrûpa'yeke bi hêztir e, lê bêyî ku serweriya xwe par ve bikin. Di nava daxwaz û şertên nakok de bi pelandinê hêdî hêdî sazî û prosedûrên gelekî tevlîhev çêkirin û hêvî dikin ku rojekê formulekî "efsûnî" karibe hewldanan bîne cem hev. Peymana Lîzbon'ê divê careke din di ser vê bihevvekirinê re bibuhure ku bi rastî zehmet e were fêm kirin; divê vê jî beriya ku rastî bendên berê were, bike.

Mirov berê awirên xwe bide dîrokê, rewş zelal dibe. Jêhatîbûnên ewrûpiyan di cewherê xwe de aborî (komir, pola, bazara hevpar) ne. Ango bi riya vê Yekîtî her ku çû bêhtir derkete ser dika navneteweyî. Ji bilî vê jêhatîbûna Yekîti'yê di mijarên aborî de – weke mînak ew li ser navê 27 endaman di Rêxistina Bazirganî ya Cîhan'ê (RBC) de hevdîtinan pêk tîne – wê bi demê re siyaseteke xurt a hevkariya ji bo pêşvebirinê pêş xist (bêhtirî ji sedî 5'ê budceyê ango serê 5 salan 7 milyar euro (2)). Weke yek ji sektorên têde Yekîtî mumkin e karibe xwe cihê bike û doza nasnameyeke xwe bi xwe bike tê dîtin. Ev siyaset ji aliyê du saziyên sereke yên di ser neteweyan re tê birêvebirin: Komîsyon û Parleman.

Sala 1993'an di nava dû û mija şerê yugoslavan ê ku lawaziya Ewrûpa'yê nîşan da, bi Peymana Maastricht'ê Siyaseta Derve û Ewlekariyê ya Hevpar (PESC) hat damezrandin, paşê sala 1999'an Siyaseta Ewrûpî ya Ewlekarî û Parastinê (PESD) hat damezrandin. Destpêkirina PESC û PESD'yê çawa daxwaza bihurîna ji sînorên aborî ya avahiya civakî nîşan bide û bersivê dide pirsgirêkên zehmet ên divê werin çaresekirin ên piştî şerê sar, ew her weha daxwaza dewletên endam a kontrolkirina vê berferehbûna erk û jêhatîbûnê jî tîne ziman.

Bi rastî jî PESC/PESD bi awayekî zelal Komîsyon, Parleman û Dadgeha Civaka Ewrûpa dide aliyekî, ya dimîne Konseya Wezîran e ku nûneriya dewletên endam dike û di siyaseta derve de bi yekdengî biryarê dide. Di çarçoveya vê awira li mijarê de erka Nûneriya Bilind ji bo PESC sala 1999'an hat sazkirin. Bi awayekî sefîrekî super e, ew bi rastî biryardarekî siyasî nîne. Hevkariya ji bo pêşveçûnê û bazirganiyê, herdu jî weke mafê ji berê ve diyarkirî yên Komîsyon'ê man. Ango herdu qad jî bi hev re paralelî hev pêş dikevin.

Destpêka salên 2000'î beridîna çarçoveya navneteweyî, kir ku ev rewş êdî nikaribe dewam bike. Derketina holê ya "tehlûkeyên nû" (terorîzm, dewletên îflaskirî, krîmînalîteya di navbera neteweyan de, koçberiya nekontrolkirî) weke encam xwezaya hevkariya di mijara pêşveçûnê de guhert û ew veguherand hêmanên mezin ên stratejîk. Şerên Îraq û Afganîstan'ê sînorên hêza eskerî nîşan dan, alîkarî xwe weke hêmanekî girîng a tevahiya siyaseta derve îsbat kir. Di nava pîvanan de ku pê navgînên tevgera wê ya derve (li aliyekî hevkariya ji bo pêşveçûnê, li aliyê din PESC/PESD) di nava gelek saziyan de parçekirî ne û li gorî prosedûrên cihêreng dixebitin. Di rewşa pêşî de civakî di ya din de navhikûmetî xebitîna Yekîti'yê bi xwe hevnegirtî xuya dikir.

Bi ser de jî her sazî bi xwe xwedî struktûrekî tevlîhev e. Weke mînak dema Komîsyona Ewrûpa'yê li derveyî Yekîti'yê dikeve nava xebatê, ber bi şeş aliyên giştî ve parçe bû û ev alî ji aliyê 4 komîserên cihê ve hatin birêvebirin (3), helbet divê em ji bîr nekin serokê Komîsyon'ê bi xwe jî li wan zêde bikin. Em li Konsey'ê binêrin, nûneriya wê ne bi tenê bi Nûnerê Bilind ê ji bo PESC'yê misoger bûye, her weha bi dewleta endam a ku erka serokatiya Yekîti'yê ya serê şeş mehan diguhere, pêk tîne. Serokatiyeke ku weke çavkaniya hevnegirtin û nedewamdariyê tê dîtin.

Peymana Lîzbon'ê di vê çarçoveya ji hev belawela de dikeve meriyetê. Di avahiya nû de ku wê saz kir, bêguman rola herî girîng û herî nazik a Nûnerê/Nûnera Bilind ê/a ji bo Siyaseta Derve û Karên Derve ye. Ew divê erk û jêhatîbûnên berê yên Nûnerê Bilind û yên Komîsyon'ê bike yek ku ew weke cîgirê serok pêk tîne. Lingekî wê, wê li Konsey'ê be, lingê din li Komîsyon'ê ango wê du karan bi hev re bike. Ev çareseriya encama hevdîtinên dirêj û zehmet weha xuya dike ku ji bo bêhtir hevgirtîkirina karên derve yên Yekîtiya Ewrûpa'yê zêde kêrhatî nîne.

Weke encam, sererastkirinên nû ti tiştî di dualîzma Komîsyon û Konsey'ê de naguherin. Weke mînak dema ku Nûnerê Bilind di mijara hevkariyê de bikeve nava meseleyekê de, hingî çarçoveya ew têde tevbigere wê li gorî hêzên ji berê de yên Komîsyon'ê û prosedûrên wê yên nîvdi ser neteweyan re were sînordarkirin. Ev yek jî Yekîti'yê dike rêxistina herî zêde întegrekirî ya cîhanê. Dema ku di qadên dîplomatîk û eskerî de bixebite, hingî ew ê dîsa bibe ew ê ku beriya Peymana Lîzbon'ê ew bû: nûnerekî dewletên endam e û ne kesê biryaran dide ye. Sererastkirinên nû di navbera herdu qadên çalakiyan de pirekê ava dikin, lê bingehê pirsgirêkê çareser nakin. Avahiya sazûmaniyê ya ku bi Peymana Lîzbon'ê hat pêkanîn weke ku gelek mamikan û nezelaliyan di xwe de dihewîne û ev jî di nava Yekîti'yê de tovê tevlîheviyan direşîne. Di Tîrmeha 2010'an de dora serokatioya Yekîti'yê ji bo şeş mehan digihe Belçîka'yê. Belçîka ji niha ve da zanîn ku serokatiya bi dorê ya dewletên endam, a ku wê di meriyetê de be, nabe ku bi tevahî ji

* *Lêkolînerê Koma Lêkolîn û Agahdariyên li ser Aştî û Ewlekariyê (GRIP) li Bruksel'ê.*



*Rebwar Saeed, (Acrylic)*

PESC were derxistin, tevî ku di prensîbê de Nûnerê Bilind divê serokatiya Konseya Wezîrên Karê Derve bike. Çileyê bê Spanya'ya ku wê rêveberiyê bigre destê xwe, xuya ye hemfikr e. Hingî, eger karên derve yên Yekîti'yê beriya Peymana Lîzbon'ê ji aliyê sê seriyan ve dihatin rêvebirin, piştî peymanê mumkin e ev bibin çar serî.

Ya diduyan, reforma herî dawî ya Komîsyon'ê ya ku di Sibata 2010'an de dikeve meriyetê, ji bo vê saziyê sê komîser û pênc Rêveberiyên Giştî (4) yên di mijara têkiliyên bi derve re xwedî erk destnîşan dike; Nûnertiya Bilind/Cîgirê Serokê Komîsyon'ê û beşa nû ya karên derve ya Yekîti'yê jî li van zêde dibin. Vê beşê diviyabû gelek beşên Yekîti'yê yên di navbera Konsey û Komîsyon'ê de belav bûyî, bîne cem hev. Lê rewşa wê bi xwe jî hê bi tevahî bi awayekî zelal di navbera herdu saziyan de nehatiye destnîşankirin. Em hînê nizanin, ka çawa Parlemana ku hêza wê ya kontrolkirina kirinên Komîsyon'ê heye, lê nikare PESC'yê kontrol bike, çawa dikare pêwendiya xwe pêre çêbike.

Weke xala dawiyê jî Peymana Lîzbon'ê bi awayekî zelal rewşa hiyerarşîk a Nûnerê Bilind/Alîkarê Serokê Komîsyon'ê destnîşan nake. Gelo komîserek divê hê jî raporê bide serokê xwe – eger na serok dikare bixwaze ew îstîfa bike? Ev serok jî niha Canik Ashton e, ku rewabûna wê ji Konseya Ewrûpa'yê ya ku ew wezîfedar kirî tê? Otonomiya rêveberiya brukselî beramberî dewletan wê çi be? Derveyî sînorên Ewrûpa'yê Komîsyon wê veguhere bedeneke bi du seriyan. Ne ku bi tenê dualîzma sazîbûnê ya karên derve têde heye, tehlûke niha heye ev dualîzm bikeve nava Komîsyon'ê bi xwe jî.

Ev pirs û hinên din jî, divê di hevdîtinên nû de - yên piştî ku reform ketin meriyetê - werin girtinî dest. Lê belê kêrhatin û dewamdariya saziyên nû wê her weha girêdayî kesayetiyan jî be ku wê li serên wan bin. Wezîfedarkirina Van Rompuy ê belçîkî û Ashton a brîtanî ji ber ku çarçoveya bandora wan kêm e, jixwe hatibû rexnekirin. Bijartina van kesan daxwaza paytextên ewrûpî tîne ziman ku dixwazin destê wan li ser siyaseta derve ya hevpar bimîne.

Peymana Lîzbon'ê ne tevlîheviya Yekîti'yê çareser dike ne jî gavgiraniya rêveberiya wê. Em dikarin ji xwe bipirsin ka gelo reformên sazûmaniyê, pirsên nebûna siyaseteke derve ya hevpar wan bi kurtasî tîne ziman, çareser dike. Divê aliyê wê yê bi tevahî siyasî jî her weha were dîtin. Gelek caran dema behsa dewletên endam ên Yekîti'yê dosyayên navneteweyî yê wê kêliyê ne, berjewendiyên wan ên hevnagirin hene. Ev ne bi tenê eks û vedana rewşên berçav e; ev berjewendiyên hev nagirin berhemên tercîhên stratejîk in ku berevajî herika tevahiya siyaseta derve ya hevpar diçin.

Mînaka herî zêde darîçav der darê enerjiyê de ye. Ti reforma sazûmaniyê bi qasî siyaseteke hevpar nikare ewrûpiyan bike yek. Bêyî siyaseteke bi vî rengî, Yekîtiya Ewrûpa'yê wê beramberî Rûsya'yê çawa bibe xwediyê kirineke hevpar? (5) Bi gotinên berçavtir, eger British Petroleum (BP) xeta lûleyên petrolê BTP'ê (Bakû-Tiflîs-Ceyhan) çêbike ku di Gurcistanê re derbas dibe û bi şîrketa emerîkî Chevron'ê re vî karî birêve dibe; Almanya jî di bin derya Baltîk re xeta lûleyên gaza xwezayî çêbike ji bo ku di nîvê Ewrûpa'yê re nebihure û wê yekser bi Moskov'ê ve girê bide, çawa em şaş bimînin ku London û Berlîn li beramberî krîza Gurcistan'ê û Moskov'ê xwediyê siyasetên ji hev cihê bûn? Naxwe pirsa tê kirin der barê têgîna berjewendiyên hevpar ên ewrûpî ye (6).

Dema ku saziya ewrûpî li dibistan û zanîngehan weke ders tên dayîn, wê weke "şoreşeke nabêje va me" didin nasîn. Ji bo ku sedem, sînor û şaşiyên prosedûrên întegrasyonê rave bike, bi taybetî teoriya "gavên piçûk" tê bikaranîn. Dîsa jî di vê kêliyê de ev argûman weha xuya dike ku bi kêra rewakirina lihevkirina sazûmaniyê tê, ya ku her diçe sergêjîtir û tevlîhevtir dibe. Dema vê dike, hizirîna li ser naveroka polîtîkayên divê werin pêkanîn jî red dike.

**Wergera ji fransî**
**Lokman Turgut**

---

(1) Jêrenota redaksiyonê: Redaksiyona Le Monde diplomatique pêwendî pêre danî, weha xuya dike ku avahîsaziya sazûmaniyê ya nû serî li beşên pispor ên Komîsyona Ewrûpa'yê jî gerandiye: Wan bi tenê karîbû hîpotezên der barê fonsiyon û kêrhatina wê ya paşerojê de bînin ziman.

(2) Budceya PESC'yê salê li derdora 250 milyon euro ye (ango di navbera 2007 û 2013'an de 1.74 milyar euro).

(3) Têkiliyên bi derve re (Canik Catherine Ashton), pêşveçûn û alîkariya insanî (Birêz Karel de Gutch), berferehbûn (Birêz Olli Rehn), bazirganî, siyaseta ewrûpî ya cîrantî û ofîsa hevkariya EuropeAid (Canik Benita Ferrero-Waldner).

(4) Ev divê Rêveberiya Giştî (RG) ya bazirganî, RG ya pêşveçûn, ya ofîsa alîkariya insanî ya Komîsyona Ewrûpa'yê (ECHO), ya EuropeAid (alîkariya ji bo pêşketinê birêve dibe), û RG ya berferehbûnê (ku dikare erkên siyaseta cîranan jî bigre nav xwe) bin.

(5) Bixwîne Mathias Reymond, "L'Europe énergétique, entre concurrence et dépendance (Ewrûpaya .enerjîtîk, di navbera hevrikî û girêdayîbûnê de)", Le Monde diplomatique, Kanûna 2008'an.

(6) Bixwîne Michel Foucher, "Quelles frontières et quel projet pour l'Union? (Kîjan sînor û kîjan proje ji bo Yekîtiyê)", Le Monde diplomatique, Gulana 2007'an.

JINÛVE DAHÊNANA ÇAND Û ABORIYÊ

# Amazon, Apple, Google, dêwên piştî qeyranê

DAN SCHILLER*



*Rebwar Saeed, (Acrylic on canvas) - Efekt LMD kurdî*

Di sala 2008'an de, berî ku Banka Citygroup alîkariyeke îstisnayî ya 45 milyar dolaran ji hikûmeta Dewletên Yekgirtî wergire, bîst û pênc hezar konseptorên bernameyên kompûteran jê re kar dikirin û li dor 4,9 milyar dolaran veberhênana wê hebû di teknolojiyên Enformasyon'ê de –ji bilî mesrefên din ên kar û rêvebirina şirketê. Lehman Brothers jî bi rexê xwe ve, berî ku di îlona 2008'an de topa xwe bavêje, bi sê hezar bernameyên kompûterî kar dikir ku li ser bîst û pênc hezar serverên [server: kompûter an jî bernameya ku karûbarên serûkaniyeke navendî an jî torekê bi rêk dixe] li çend serzemînan bûn. Gava qeyrana aborî rû dide di goşetariyên sîstemên bazaran de, tora înternetê di cihê xwe de ye, amade bo belavkirina tesîra kujende berev dor û qeraxan (1).

Lê belê heta îro jî, rola endûstriya enformatîkê [beşê kompûtergeriyê] di rabûna felaketa 2008'an de heta dereceyeke bilind nehatiye tespîtkirin. Herwekî rehên pêwendiya digel warê ragihandinê û pêwendiya beşê darayiyê.

Çînên rêveberan, ji bo berlêgirtina qeyraneke din, qeyrana serê salên 1970'an, dest pê kirin ji sîstemên nû yên hisêb û ragihandinê wekî amrazên "tehmîra zemanî-mekanî (2)", bi gotinên David Harveyî, sûd wergirtin. Armanc, berî her tiştî, bi rêya veguhastina sermiyanî bo beşê ku ihtimala mezinbûn û geşedaneke bihêz nîşan dida, dîsa gihiştina bi kar û qazancê bû. Hingî, veberhênanên gişkî û bi tibabên pir mezin, teknolojiyên enformasyon û ragihandinê (bi kurteya TIC tê nasîn) av didin, û di raya giştî de wê baweriyê durist dikin ku çaxekî nû dizê: çaxê rûken û zêrîn ê bi navê "civaka enformasyonê."

Lê belê, di serî de, beşê fînansê tu kar tê de nebû pereyan razîne sektora enformatîkê. Lê, enformatîkê qîmeteke stratejîk bi dest xist digel mezinbûna xwe ya ku bi veberhênanên navneteweyî dihate destekkirin: şirketên gewre dane ser rêya razandina pereyê xwe li cihên derveyî bazarên xwe yên navxweyî, û li her der û devereke cîhanê karxane, ofîs, kan û zeviyên çandiniyê kirrîn (3). Ev bizava dagîrkirinê bû ku roleke serekî sparte endûstriya ragihandin û enformasyonê.

Ji bo veavakirina sîstema hilberînê û teqezkirina bazareke destxweş bo mal û karê wan ê êdî global, şirketên pir-neteweyî avahî û şêweyê karkirina xwe bi enformatîkê jinûve bi rêk xistin. Bi vî rengî, sîstemên xwe yên ragihandin û pêwendiyan bênavber jinûve eyar kirin da ku wan biguncînin digel guherînên di stratejiyên xwe de, di polîtîkaya bazirganî û û rêyên wan ên têketina nav bazaran de. Ji dawiya salên 1980'an ve, TIC û bernameyên kompûterî zêdetir ji nîvê veberhênanên şirketên pir-neteweyî digirin. Meblaxên li mexderê astronomîk in: Bi tenê sala 2008'an, beşê taybet û hikûmetê pêkve, li dora 1.750 milyar dolar mezaxtine li ser enformatîkê (4).

Heynê ku ragihandin û enformatîk dibûne du kaniyên kawdana kapîtalîst, hinek teknolojiyan çend warên karan bêkêr hiştin û bi vî rengî hema bêje bi temamî ji nav birin. Skype, bernameyeke kompûterî ya belaş ji bo axaftinên bi têlefonê li ser înternetê, di sala 2009'an de zêdetir ji çarsed milyon bikarhêner bi xwe ve kêşan (5). Bi tenê di nav pênc salan de, vê nûhatiyê xwe wekî girîngtirîn dabînkerê cîhanî yê ragihandina der-sînorî dasepand li ser maseya mezinan. Skype jî, wekî hemû operatorên VOIP'ê ("Deng li ser Înternetê"), fişareke reqabetê tîne nav bazarê û pratîkên rojane yên bikarhêneran diguhurîne –lewma êdî bikarhêner tu mifa û me'nayê di têlefonkirina ji xeta xwe ya sabît de nabînin. Navûbangê wê lez da berbelavbûna bikaranîna înternet û têlefonên mobîl, herwiha xizmetên înternetê yên taybet bo şirketan gelek mişe bûn.

Girêdan û pêwendîgirtina bi erzanî dibe sebebê jinûve navendîkirina qismî ya enformatîk û bernameyên kompûterî. Modêla kompûtera şexsî ya bi hemû amrazên xwe ve tekmîl û serbixwe, ku bêyî girêdana bi

* *Profesorê Beşa Ragihandinê li Zankoya Urbana-Champaign (Illinois), nivîskarê How to think about information, University of Illinois Press, Chicago, 2006.*

xeta înternetê dixebitî û ku ji salên 1980'an ve ye serdest bû, êdî kevnemode ye. Dane (peyamên elektronîk, wêneyên şexsî, daneyên şirketan, hwd.) her ku diçe zêdetir di nav depoyên serverên opertarên mezin de têne parastin: Ev "enformatîka li nav ewran (6)" e.

Têlefonên mobîl bi xwe jî li ser bazarên kompûter û televîzyonan bûye gef. Li ser rûyê dinyayê li dor 4,5 milyar têlefonên destan hene, ku ji wan modêlên herî taze êdî mîna ekranên mûltîmedyayî dixebitin. Di nav wan neh heyvan de yên piştî derxistina nav bazarê ya têlefona Apple, li dor bîst û pênc hezar bernameyên kompûterî hatibûne pêşxistin ji bo vê têlefonê (heta îro ew hejmar gihiştiye sed hezarê, lewre berhema nû ya Apple'ê bazarên Çîn û Kore ya Başûr dagîr kirine), û bi vî rengî, 800 milyon caran bername li ser înternetê hatibûne dabarkirin.

Di heman demê de, Amazon, Apple û Google'ê ew asteng jî radan ku hakim û serdestên piyaseya mûzîk, kitêb, yariyên vîdyoyî û sînemayê diparastin (7). Deqên dîjîtal, xizmetên dîtinî-bihîstinî (audio-visual) li ser daxwazê û nûkariyên teknolojîk rêz û rêzikan li vê qada şerî destnîşan dikin. Di demekê de ku bazara kompakt-dîskan têk diçe, çar mezinên ku pişka şêrî ji endûstriya dîskê di navbera xwe de par dikirin, bêgav in pişkeke qazanca xwe bidin Apple'ê. Heman tişt li ba wan gewre-şirketên pirneteweyî yên sînemayê jî diqewime ku qada xwe ji dest didin beramber YouTube'ê, kana vîdeoyan a Google'ê. Heçî televîzyon e, ku di rewşeke xerab de ye ji ber ketina dahatên xwe yên ji reklaman, bi sedan kanalên kabloyî û peykî û bernameyên ji bo têlefonên mobîl jê dizên, û mîna di nimûneyên Hulu, BBC iPlayer an jî YouTube'ê de, meydanên belavkirinê li ser înternetê karîgeriyên wê vedigirin.

Heçko şêlûbêl e? Rast e. Gorrankariyeke pir mezin xerîk e li pêş çavên me pêk tê. Êdî çi bi naveroka xwe, çi bi hêza xwe ya derblêdanê, endûstriyeke nû dê bizê ji vê hengameyê, lê vê carê, di nav şert û mercên wisa de ku dê nema bişibin şêweyê kevn ê nû û nûjenkirina kultûrî ya li jêr cesareta serkêşekî. Heynê şoreşên civakî yên salên 1789, 1917 û 1949'an, hêzên civakî yên qewî hewl didan şêwe û rêbazên kultûrê veguherînin. Êdî, li jêr mertalê sermiyanê, bi tenê yê wê, pirêzeyên kultûrî terîfa xwe digirin li sertaserê cîhanê. Hewl û teşebûsên bergîrîkirina li wê hegamoniyê heta îro li rûyê siyasî ve bêkêr û bê encam mane.

Di demekê de ku teknolojiyên ragihandinê bûne warê hemû ihtimal û hêviyên veguherînê, karê bimûçe û qanûna bazarê her ku diçe bêtir cihê xwe xurt dikin di nav hinavên civak û kultûrê de. Înternet amrazê herî kêrhatî ye di destên kapîtalîzmê de ji bo belavkirina şêwe-pêwendiyên xwe yên civakî. Her ji ber vê hindê ye ku kontrola li ser Web'ê dibe dabaşa munaqeşeyên ewqas kel. Dewletên-Yekgirtî cihekî serkêş û serekî digire di vê tabloyê de. Ya rast, rêveberiya Barack Obamayî, van heyamên dawî, razî bû ji bo avakirina "lijneya serperiştiyê" ya navneteweyî, ku xwedanê mafê çavdêrîkirinê ye li ser xebatên Internet Corporation for Assigned Names and Numbers (Icann), saziya Amerîkan ya gerînendeya înternetê û ya navên malikan [domain](8). Lê belê, divê mirov pir sade be ji bo ku bigihe wê qenaetê ku Washington dest ji desthilata xwe ya li ser vê amraza bingehî dikêşe. Axirîn biryarên Amerîka'yê di mijara belavkirin û rêvebirina navên malikan ji aliyê komeke seyr ve hatine girtin ku tê de nûnerên artêşê, yên ajansên federal, rêxistineke ne-hikûmî û şirketên taybet cih digirtin.

Rast e ku hêz û desthilata wan ên dawî, anku şirketên taybet, qet sembolîk nîne: Cisco ji tevahiya cîhanê re routerên torê (amrazên hev-girêdana torên enformatîk) dabîn dike; Google hukmê li motorên lêgerînê û vîdyoyên ser înternetê dike; Facebook behsa sêsed milyon endamên çalak dike û Apple wan bernameyên kompûterî çêdike ku li nav elîtan herî zêde têne bikaranîn. Jixwe hewce nîne behsa Microsofta qralê sîstemên bikarhênanê [processor], an jî Intela lîdera cîhanî ya bîrên kompûteran bikin.

Di 2005'an de, ji wan bîst û pênc şirketên ku li ser bazara bernameyên kompûterî û Înternetê zilhêz bûn, nozdeh Amerîkan bûn (9). Gava mesele dibe pawankirina çekên şerê-sîber [cyber: ya ku ji cîhana înternet û kompûterê ye], mezintirîn hêza cîhanî [Dewletên Yekgirtî] çikûsiyê nake ji bo îmkanan: zêdetir ji nîvê peykên ku niha li kar in, rengên alaya Dewletên-Yekgirtî hildigirin (10). Lê belê, şirketên Amerîkan, bi rêvebirina teklîfê [piyaseya halêhazir] qayîl nabin: ew herwiha dirûvê bazara telebê jî didinê. Şirketên giran ên wekî Wal-Mart an jî General Electric jî mişteriyên dêwane ne ji bo sîstem û bernameyên înternetê: Pêdiviyên wan rêbaz in û standardên ku dê pişt re li cîhanê berbelav bin diyar dikin.

Lewma, wisa diyar e ku Dewletên-Yekgirtî zilhêziya xwe ya di vî beşî de, ku ewqas heyatî ye ji bo hêza wê ya aborî, qet bernade. Heke em li lîsta dused û pênceh şirketên di bazara cîhanî ya TIC'an de herî li pêş in binêrin, aşkera dibe ku "şirketên Amerîkan di 2006'an de ji çend salên pêştir kêmtir bûne", lê ku Çîn, Hindistan, Taywan, Kore ya Başûr, Sîngapûr, herwiha Brezîlya, Efrîqa'ya Başûr, Rûsya û Misr ciheke her bêtir girîngtir vedigirin (11). Sermiyaneke ne-amerîkan ê têra xwe giran û girîng niha li Ewrûpa, Asya û li cihine din berhev bûye: Samsung, Nokia, Nintendo, Huawei, Tata, SAP, Telefonica, DoCoMo, America Movil, Vodafone an jî China Mobile. Di heman demê de, lehiya veberhênanan ku li ser tora înternetê tê rêtin, her ku diçe zêdetir ji wan welatên başûrî tê, wekî Meksîka, Hindistan, Çîn.

Digel vê hindê jî, rayedarên amerîkan têkçûnê ji xwe re qebûl nakin. Karîgeriya endûstriya ragihandinê, îro, berevajî daketinê, her bêtir bi giraniya xwe ya li ser siyaseta Dewletên-Yekgirtî dide hestkirin. Ne ji xwerayî ye ku Obamayî, bi gotinên sosyolog Mike Davis "serokê sîlîkon"(12), her berî hilbijartina xwe, piştgiriya tam a rêveberên Google, IBM û Dîwana Endûstriya Teknolojiyên Enformasyon'ê (ITIC), rêxistina karsazan ku hemû giregirên sektorê digihîne ba hev, wergirtibû. Pêşniyarên vê lobiyê heta dereceyekê rê û dirûvê bernameya aborî ya hikûmeta nû diyar kir: Subvansiyonên mezin û gişkî ji bo pêşxistina adsl'yê [înterneta bilez], enformatîzekirina bernameyên tenduristiyê, îmtiyazên berfireh ji bo şirketên endûstriya ragihandinê... Piştî helgirtina vê plîanê di reşemeya 2009'an de, Dean Garfieldê serokê ITIC'ê, nema dikarî xweşhaliya xwe veşêre: "Çend xweş e ku hinek guh didine banga me. (13)"

Lê belê, teqez nîne bê ka ev dê têra karsazên Obamayî bikin: Dominique Strauss-Kahn'ê Serokê Fona Darayî ya Navneteweyî (IMF), Îlona 2009'an, dipirsî, "Kîjan dê bibe motora tê ya mezinbûna aborî ya cîhanê?", û bi xwe jî dipejirand ku bersiva wê pirsê "ne hêsan" bû. Gelo enformatîk û ragihandin hêj jî xwedanê wê potansiyela sî sal berê ne ku bikarin kapîtalîzmê jinûve zindî bikin?

Sererra tingetinga daholê ku sibeyên hêvîdar radigihîne, pişkeke mezin a saziyên darayî hêj jî bi xêra xercên dewleta ezîm dijîn. Hikûmeta Amerîka, di nav ji sêyan du parên endûstriya otomobîlê di pişkek blokekirî radigire, lê kar û serf her ku diçe bêtir beqem dibin. Qeyran, sîstema aboriyê di bingehê re dikirritîne, lê bi awayekî ne-yeksan. Herçend qazancên şirketên pirneteweyî bilind bûbin (14), sektorên wekî otomobîl, darayî, çandinî, metalûrjî û elektronîk hêj jî lawaz û bêtaqet in.

Gelo teknolojiyên ragihandin û enformatîkê di çi rewşê de ne? Aşkera bû ku, ji ber ku bûye mîhwera sîstema kapîtalîst, sektor gelek nazik e li ber qeyranê. Di maweya nîvê yekê ji sala 2009'an de, mesrefên reklamê li cîhanê –li dor 500 milyar dolaran– di hejmareke zor a welatên pêşketî de, bi zêdetir ji % 10 ketin (15). Ji heftiyên cotmeh heta kanûna 2008'an, şirketên TIC'ê xwe ji herifîna bazaran neparastin, lê divê bê diyarkirin ku tesîra qeyranê bi rêjeyên cuda hate dîtin di nav wan de. Hinek şirket, ser bi xwe, gelek serkeftî û bixêrûbêr man, wekî Cisco'yê, ku sercemê qazanca wê digihe 20 milyar dolaran di serê sala 2009'an de, an jî Microsoftê (26 milyar), Google (16 milyar), Intel (10 milyar), Dell (6 milyar) û bi taybetî Apple (26 milyar).

Ev şirket di nav koma dewlemendtirîn şirketên navneteweyî yên amerîkan de cih digirin, lê belê di heman demê de rast e ku halêhazir bi tenê operatora têlefonên mobîl ya bi navê China Mobile gencîneyên qazancê –bi karekî 18 milyar dolaran ji bo serê sala 2009'an– bi dest dixe. Diyar e pere û saman bi hêsanî xwedanê xwe diguhurin, lewma ji bo destnîşankirina pozîsyona xwe, şirketan pêdivî bi şiyanên livînê yên wisa heye ku fon û malên li ser bazarên kêm-qazanctir an jî di sektorên kêmtir berçav de ew şiyan nebin. Dawiya 2009'an, dêwên teknolojiyên ragihandinê pir bihêz bûn. Pêşbîniyên ku li gorî wan "dê bi beşeke qazanca xwe reqîbên xwe bikirin (16)" ji hingî heta niha rast didêrin.

Lewre hêj gelek maye ku sektor potansiyela xwe ya veberhênan û qazancê bibirîne. Di sala 2008'an de, herçend sala qeyranê be jî, mesrefên ji bo berhemên multîmedyayî li Dewletên-Yekgirtî bi % 2,3 zêde bûn (anku gihiştine 882,6 milyar dolaran). Bi ya hinek çavdêran, endûstriya TIC'an, yek ji wan sê sektorên aborî ye ku dê bi rêjeyeke herî bilind mezin bibin (17).

Paşketinê jî kel û heyecana bikarhênerên înternetê sar nekir. Heye ku wê ew bêtir handan, lewre trafîka li ser înternetê her bêtir berê tîrê hilkişand: bi ya texmînên dawî, zêdebûna bi % 55 di 2008'an de, û bi % 74 di 2009'an de (18). Nûkariyên di warê bernameyên kompûterî û sîstemên bikarhênanê de, dihêlin ku şirketên pir-neteweyî karîgeriya xwe li ser birreke pirêzeyên sosyo-kultûrî (ji perwerdeyê heta digihe biyo-teknolojiyên çandiniyê) nîşan bidin û bi vî rengî rê û dirbeke nû li ber qazancên di sektorên din de, wekî pizişkî û enerjî, vekin.

Gelo cihê kêfxweşiyê ye ku teknolojiyên enformasyon û ragihandinê wekî warê peresendina aborî dimînin? Di bingehê de, kapîtalîzma dîjîtal –mîna selefên xwe– bi rêya van serdemên qeyranê kaw dide. Her ew serdemên qeyranî ne ku dibin sebebê xuyakirina barekî civakî yê bi ne-yeksanî dabeşkirî, şêweyên nû yên bandûrê, û gelek xweşbextane, rê û dirbên nû yên berxwedan û veavakirinê.

**Wergera ji fransî**
**Ergîn Opengîn**

(1) Çavkaniya vê paragrafê: Financial Times, Londres, 22 Gulan 2009 û 28 çile 2009; Fonds monétaire international [Fona Darayî ya Navneteweyî], "Rapport sur les perspectives de l'économie mondiale ", Nîsan 2009, beş 4: " La transmission des tensions financières des pays avancés aux pays émergents: comment les liens financiers et commerciaux enveniment la situation. "

(2) David Harvey, The New Imperialism, Oxford University Press, 2003, rp. 87-88.

(3) Sala 2007'an, pişka veberhênanên biyanî li dor % 25'ê qazancên aşkerakirî yên şirketên emerîkayî bû, bermaber rêjeya bi % 5'ê di salên 1960'an de (Wall Street Journal, 9 Tebax 2007).

(4) The New York Times, 15 Mijdar 2008.

(5) Wall Street Journal, 23 Adar 2009.

(6) Bixwîne Hervé Le Crosnier, " A l'ère de l'"informatique en nuages" ", Le Monde diplomatique, Tebax 2008.

(7) Bixwîne Robert Darnton, " La bibliothèque universelle, de Voltaire à Google ", Le Monde diplomatique, Adar 2009.

(8) Bixwîne Bobbie Johnson, "US relinquishes control of the internet", www.guardian.co.uk, 1 Cotmeh 2009, û Ignacio Ramonet, "Contrôler Internet", Le Monde diplomatique, Mijdar 2005.

(9) Bixwîne Catherine L. Mann û Jacob Funk Kirkegaard, Accelerating The Globalization of America: The Role for Information Technology, Institute for International Economics, Washington, D.C., 2006.

(10) "Junk in space", Financial Times, 13 Reşeme 2009.

(11) "Perspectives des technologies de l'information de l'OCDE 2008"; www.sourceoecd.org

(12) Mike Davis, "Obama At Manassas", New Left Review, n° 56, Londres, Adar-Nîsan 2009.

(13) Charlie Savage û David D. Kirkpatrick, "Technology's Fingerprints on the Stimulus Package", New York Times, 11 Reşeme 2009.

(14) Hal Weitzman, Jonathan Birchall et Michael Mackenzie, "Upbeat start to earnings season", Financial Times, 21 Cotmeh 2009.

(15) New York Times, 2 Îlon 2009.

(16) Steve Lohr, "The Tech Sector Trumpets Signs of a Real Rebound", New York Times, 16 Cotmeh 2009.

(17) New York Times, 4 Tebax 2009.

(18) "What Recession? Internet Traffic Surges In 2009", Telegeography Feed, Washington,15 Îlon 2009.

SERDEMA DIJÎTAL

# Îhtîşam û sefaleta rojnamevaniyê

MARIE BÉNILDE*



*Rebwar Saeed - Efekt LMD kurdî*

Di sala 2006'an de bankavanekî BNP-Parisbas'ê yê vexwendî Kongreya Federasyona Neteweyî ya Çapemeniya Fransa ya li Strasbourg'ê, gotibû rewşa rojnamevanan weke rewşa karkerên hesin û pola yên salên 1970'î ye û bi vê yekê jî bûbû sedema sensasyonekê: diviyabû tine bibin lê ... hê jî haya wan jê nebû. Hejmarên li ber destên me wî mafdar û heq nîşan didin. Di dawiya 2009'an de bêhtirî 2300 cihên kar yên sektora rojnamevaniyê jê hatin birin, li Fransa'yê krîzeke mîna ya rojnameyên Amerîka'yê diqewimî. Li Amerîka'yê par 24500 cihên kar kêm bûn û hejmara xebatkarên rojnameyan dakete 300000'î, ev hejmar beriya bi deh salan 41500 bû (1). Di 2009'an de Washington Post neçar ma buroyên xwe yên li derveyî paytextê bigire û Los Angles Times û Chicago Tribune'ê xwe sipartin parastina qanûna îflasê. Li Fransa'yê ji bilî L'Equipeê karê tevahiya rojnameyên neteweyî kêm bû.

Mirov êdî ji ber têkçûneke bi vî rengî matmayî namînin. Li gorî kabîneya Bain & Company di nava deh salan de înternet pişkivî, para xwe ya di karê îndustriya çandî ya cîhanê de ji sedî 4'an gihande ji sedî 22'an û kir ku karê çapemeniyê kêm bibe, karê çapemeniyê ji sedî 40'î dakete ji sedî 14'an, ji navgîn û medyayên din hat ku kêrhatin û karanîna xwe ya global biparêzin û heta zêde bikin (2). Budceyên karê reklaman û danezanên piçûk ji rojnameyan ber bi înternetê ve diherike û ev yek tê gunehbarkirin. Rojnamevan Bernard Poulet weha dinivîse: "Yekem car e ku di dîroka

* Rojnamevan. Nivîskara *On achète bien les cerveaux* (Mejiyan dikirin), Raisons d'Agir, Parîs, 2007.

çapemeniya girseyî ya ku nîvê sedsala 19. destpêkirî, ji bo malên xwe bi berxuran bidin nasîn, yên reklamê dikin êdî neçar nînin ku medyayên agahdarkirinê bi kar bînin (3)”.

Lê di heman demê de eleqeya raya giştî ji naveroka pere pê tê dayîn re kêm bûye. Ev naverok ji aliyê elîteke rojnamevaniyê ve ku bawerî êdî pê nayê, tê amadekirin. Sedema pêbawernebûnê jî alîgirî û texlîdvaniya wê ye û tevî ku doza pereyan dike jî qîmet bi xwendevanan nade. Di 2009’an de edîtorên rojnameyan avakirina konseyeke çapemeniyê qebûl nekir. Vê konseyê karîbû dest werde rojnamevanan da ku pêwendiyek bi raya giştî re mumkin be. Blogvanê navdar ê amerîkî Jeff Jarvis di pirtûka xwe ya bi navê rêbaza googleê (4) de weha dinivîse: “Hêzê bidin dest miştiriyan û ew ê rahêjinê. Eger hûn vê nekin, ew ê ji dest we biçin.” Desthilatdariya rojnamevanan ji ber şoreşeke dîjîtal jî bi vî awayî tê jêpirsîn. Weke ku rêveberê beşa stratejiyê ya Agence France Press Eric Scherer gotî, ev şoreş “afirandina pêdiviya gelemperiyê bi rastî ye (5)”. Lewra, krîza çapemeniyê kapasîteyên lêkolînê yên rojnameyan dixe tehlûkeyê, lê ev ji bo xweîfadekirina demokratîk gavêtineke ber bi paş ve nîne.

Berovajî, malperên înteraktîf – em nav lê bikin 2.0 – dike ku girseyên xwendevanan hemû agahiyan di cih de bigirin û bi xwe wêneyan, vîdeoyan lê zede bikin û her weha şîrove û analîzên nûçeyan bikin. Ji tsunamiya li Asya’yê heta bi serhildanên li Îran’ê, ji êrîşên li London’ê heta bi yên Bombay’ê, komkirina şahidî, agahdarî û fikran her diçe bêhtir di navbera medyayê û blogan yan jî tevnên civakî de tên parvekirin. Ragihandina agahiyan bi xwe jî êdî bi tevahî di destê medya kevneşop de nîne. Medya kevneşop her diçe bêhtir neçar dibe girîngiya bi bûyeran dide li gorî reaksiyona ku wê li cem bikarhênerên înternetê peyde bike, diyar bike. Tevna înternetê qismî rojeva medyayê diyar dike.

Ji berdêla takekirina naverokên xwe da ku li ser înternetê xwe baştir cihê bikin, rojname giraniya xwe didin li her deverî amadebûnê û lezê. Divê li her derî, her kêlî, li her platformê û di her awayê xweîfadekirinê de hebin: blog, dîmen, wêne, îşaret biwankirina li ser motorê lêgerînê, xuyakirina wan li ser malperên civakî yên mîna Facebook yan jî Twitter’ê... Di sala 2010’an de edîtorên rojnameyan hêviyê ji belavbûna telefonên biaqil (smartphones) yên weke I-Phone, Apple dikin, ku li Fransa’yê niha behtirî du milyonan miştiriyên wan hene. Armanc ew e ku bikin bikarhênerên telefonên destan pereyan bidin. Lewra gelekî zehmet e pereyan ji bikarhênerên înternetê bistînin, jiber ku ew fêrî belaşbûnê bûne. Lê belê mirov çima qadeke li ser înternetê ya malpereke çapemeniyê bi pere bi kar bîne, tevî ku ji sedî 90’ê 100 hezar kirariyî belaş in?

Em berê xwe bidin rojnamevanan, ew divê êdî hertim bêhtir û çêtir bikin... û vê yekê bi hejmareke kêmtir bikin. Tehlûkeya her diçe bêhtir zehmetbûna vê rewşê ya nakok ew e ku rojnamevan bi karên multîmedya re mijûl dibin û ji ya ku diviyabû herî lezgîn be, dûr dikevin: Lêkolîna agahiyên nehatî sererastkirin û awirên orjînal ên li bûyeran. Bi ser de jî, ev pozîsyonek e ku xwe li gorî bikaranîna dîjîtal bi rêk û pêk dike. Ev pozîsyon têra xwe dûrî ya li gorî Jeff Jarvis diviyabû bibe ye. Jarvîs dema şîretan li rojnamevanan dike dibêje divê ew giraniya xwe di serî de bidin hilberîna “naverokên nirxên zêdetir” ku dikarin bala mirovan bikişînin ser înternetê: “Dêhn û bala xwe bidin karê hûn herî baş dikin û girêdanan bi ya mayî re deynin (6).”

Hê ti carî agahdarî ewqasî li ser evçend qadên curbicur amade nebûn, lê amadekirina wan jî ti carî evqasî di tehlûkeyê de nebû. Krîza çapemeniya bi pere, dike ku hejmara nûçegihanên dewamî yên li derve were kêmkirin, lêkolîn û hevpeyvînên dirêj werin sînordarkirin û redaktor û sererastkeran ji kar derxe... Ji bo ku li ber xwe bidin, medyayên kevneşop neçar in bibin yek yan jî xwe veguherînin karxaneyeke agahdariyên erzan, weke di komên Alain Weill’ê (La Tribune, RMC, BFM TV) de qewimî. Di vê komê de rojnamevanên ciwan ên mûçeyekî kêm distînin weke hemalên nûçeyan tên bikaranîn (7). Ma sibe? Serokê Konseya AM Conseil’ê (şirketeke fînasê û karê bankayan e) Alain Minc bi hêrs dugesînî dike û dibêje “Rojnameyên heyî riyeke din li pêşiya wan nîne, ew neçar in bibin yek, lewra naveroka wan weke hev e (8)”. Bi giştî, piştî ku piştgiriya besîtkirina karê edîtoriyal ku armanca wê peydekirina reklaman e, stendin, dîsa jî hênceta ku Philippe Merlant (9) jêre gotî “hevrikiya texlîdkar” bikartînin da ku banga demeke nû ya konsantrasyonê bikin. Di dawiya vî mentîqî de ev hene: proleterkirina redaksiyonan û lawazkirina kalîte û çawaniya agahiyan. Ev jî wê bike ku xwendevan berê xwe bêhtir ji wan bidin alî û serberjêrçûna rojnameyên bi peran bi leztir bibe.

Gelo gava li pêş wê bibe, weke îndustrî, jihevxistina çapemeniyê? Hew bikaranîna kaxezê wê destûrê bide edîtoran ku mesrefên hilberînê û belavkirina rojnameyekê kêmtir bikin. Edîtor hêvî dikin ku bi vî awayî karê xwe zêdetir bikin. Lê ev mijar niha li bin guhê dîwarekî dikeve, ango ne mumkin e mesrefên redaksiyonê bi tevahî ji malperên înternetê heqê xwe derxe, ji ber ku di dinyaya înternetê ya mişt reklam de miştêrî bê qîmet dibin û belavkerên teknolojiyê navbênkariyê dikin. Malpereke înternetê divê ji sedî 30 komîsyonê bide da ku Apple wan qebûl bike, eger dixwaze pêre kar bike jî divê nîvê karê xwe yên reklaman bide Google’ê û eger dixwaze bikeve bernameya xwendinê ya Kindle ya Amazonê divê ji sedî 70’î bide. Ev bername jî lewheyeke xwendina dîjîtal e. Me behsa motorên lêgerînê nekir yên ku ji pereyên peyvên danasîna dema lêgerînê qirûşeke bi tenê jî nade edîtorên naverokan.

Hevseroka rêveberiya rojnameya Libérationê Nathalie Collin gazinên xwe weha tîne ziman: “Mirovên teknolojiyê gotin li cih be nirxê [naverokên me] kêm kirin (10)”. Berdêleke tinekirina materyalan jî heye. Ma gelo bi riyeke din jî dibe? Xwediyê Wall Street Journal, Times û New York Post’ê Rupert Murdoch gef li dewê înternetê Google’ê xwarin; eger qebûl neke karê xwe parve bike, gotarên xwe ji Google’ê nîvê sala 2010’an wê bikişîne. Ya çêtir jî wî banga damezrandina konsorsiyûmeke edîtoran kir da ku bikin xwendevan li ser înternetê pereyan bidin. Lê ti kes xewnan nabîne: heta ku hevrikên wî hemû heman tiştî nekin Murdoch wê rojnameyên xwe venekişîne. Ew dizane ku nirxê agahdariyan sînordar e, ev nirx nikare di demê de bi awayekî birêkûpêk li ser tevna înternetê were parastin. Google bi gelekî rihettir li ser vê rûbirûbûnê serwer e ku karê wê yê ji rojnameyan marjînal e û bi tenê ji sedî 1.5 heta 3’yê lêgerînên li ser motor pêktînin.

Gelo paşeroj ya yên bi pere ye? Apple li ser lewheyeke belavkirina çapemeniyê ya ku wê li gorî bikaranîna gotarên di înternetê de pereyan bistîne, dixebite. Ev yek ji bo sala 2010’an hêviyê dide. Lê misoger nîne ka kirîna rojnameyekê li ser înternetê wê xwe bide qebûlkirin yan na. Li gorî Boston Consulting Group, ji sedî 54’ê fransiyan amade ne ji bo nûçe û agahdariyên li ser înternetê pereyan bidin, bi taybetî jî di qada herêmî de. Lê dîsa jî bi şertê ku buhayê wê serê mehê ji 3 euroyan nebihure. Ev pereyekî gelekî kêm e, dema ku em li ber çavan bigirin ku malpereke bi pereyan a mîna Mediapart’ê ji bo ku xwe li ser piyan bigire sê caran li vî pereyî dixwaze. Tenbûra belaşbûnê demeke zêde dirêj lêxist; êdî gelekî zehmet e mirov paş ve vegere.

Berpirsiyarê vê rewşê ji aktorên înternetê bêhtir edîtorên rojnameyan in. Ên ku di destpêkê de bijartin gotarên edîtoriyal ên bêmane û bêtam ên bazara reklamê binivîsin, ew bi xwe bûn. Bêyî ku li modelên tevlîhev bigerin, yên ku xwe sipartin karê ji reklamê û belaşbûna malperên xwe ferzkirin û xwendevanên xwe gelekî dan ber reklamên lîstik û lotoyê her weha ew bûn. Pêla ji peravan vedigere ya yên reklama didin, îro tesîreke baş dike: Ew bi tenê dikarin berê rêveberên rojnameyan bidin xwendevanan, bikin ku xwe ji hewcedariya reklaman xilas bikin. Û bikin ku xwediyên rojnameyan yên ku di çapemeniyê de ji çavkaniyeke karê madî pêve tiştekî din nabînin, birevin. Ya ku dikeve ser milê rojnamevanan jî ew e ku divê paşerojekê ji xwe re ji nû ve vebînin. Gelo pîşeyê wan wê siberojê bi rezonansa xwendevanan û pisporên di înternetê de li hev bike, yên ku wê haya profesyonelan bi agahiyan bixin û bibin hemhilberînerê (coproduktorê) nûçeyan? Ji bo derbasdariya agahdariyekê, nifşê ciwan ji markeya medyayê bêhtir guh dide tevna hevalan ya ku agahiyê radigihîne. Ji bo ku bala bikarhênerên înternetê yên ciwan bikişîne ser xwe, nabe ku çapemenî “civakên (înternetê yên)” wan ji nedîtî ve were. Amerîkî ji niha ve ji sedî 17’ê dema xwe li ber înternetê li ser blog û tevnên civakî derbas dikin û ji sedî 0.56’ê dema xwe jî li ber malperên çapemeniyê yên di înternetê de... (11)

Em werin ser mijara modela aborî, ew dişibe ya Pascal îdîa kirî. Tecrûbeya malperên nû yên nûçeyan girîngiya zêdekirina çavkaniyên aborî nîşan dide: xwendevanên pereyan didin yên Mediapartê û dikanên înternetê, reklama perwerde yan jî xizmetên ji bo kolektîfên herêmî (weke şaredariyê) ji bo rêya 89’an... Sibe, wê wekî din mumkin be mirov beşekê ji lêkolînekê, ji aliyê civakên bikarhênerên înternetê ve bide fînansekirin, weke bi riya komele yan jî weqfên ji bo xizmeta gelemperiyê yên mîna Pro Publica yan jî Spot US yên li DYE’yê. Heta bi fikrekî xizmeteke gelemperiyê ya agahdarî û nûçeyên nivîsandî jî peyde dibe. Fîlozofê alman Jurgen Habermas weha dinivîse: “Fikra ku mirov rêvebirina hilberîna çapemeniyê di destê bazarê de bihêle, aliyekî wê heye ku wê tiştên mirov ne li bendê biafirîne (12).”

Di civakeke dîjîtal de, pêşkêşkirina zêde agahî û nûçeyan dike ku azadî bêhtir bibe û destekê dide şerê li dijî li derveyî xwe hiştinê. Belê şertê vê jî heye, divê ferdek zanibe di daristana înternetê de bi ser riya xwe ve bibe. Tehlûke ew e ku li ser înternetê nûçe li gorî du çînên civakî yên cihê pêş bikevin.

Li aliyekî nûçeyên zêde, weke ku Eric Scherer dibêje “înfobezîte (obezîteya nûçeyan)” ango deryaya mezin a nûçeyên negirîng ên belaş ên magazîn hene ku di herikîneke dawî lê nayê de yek li pey ya din tê û ne rêzkirî ne û ne jî bi mane ne. Li aliyê din agahdariyên gelekî baş hatî lêkolîn û amadekirin ji bo yên ku dikarin pereyekî baş bidin, pêş dikevin.

Siberoja milkekî bi vî rengî yê hevpar, eger ew bi rastî bi kêra civakê were, wê ne girêdayî karê ku ji xwediyê medyayê re bîne û nejî girêdayî encama terada di navbera Murdoch û Google’ê de be. Ger û belavbûna agahdariyên ku qîmeta wan kêmpeydebûna wan e, li gorî xwezaya wan nikare bê texmînkirin. Sala 1845, damezrênerê New York Herald’ê James Gordon Bennett, telgiraf bixwe jî weke “awayekî nû yê belavkirina agahiyê” nirxandibû ku tehlûkeya wê hebû rojnameyan têk bibe... (13)

**Werger ji fransî**
**Lokman Turgut**

(1) Hejmarên Bureau of Labor Statistics, Market Watchê di malpera wsj.com de behsa wan kiriye.

(2) Lêkolîna Bain & Company ji bo Foruma Avignonê, Mijdara 2009’an.

(3) Bernard Poulet, La Fin des Journaux (Dawiya rojnameyan), Gallimard, Parîs, 2009, rûpel 31.

(4) Jeff Jarvis, La Méthode Google (rêbaza googleê), Parîs, 2009, rûpel 50.

(5) Eric Scherer, AFP-Media Watch, Observatoire mondial des médias (çavdêriya medyayê ya cîhanê), hejmar 7, payîz-zivistan 2009-2010.

(6) La Méthode Google (rêbaza googleê), heman çavkaniya beriya niha, rûpel 27.

(7) Marc Endeweld, “Des chaînes ‘tout info’ bien peu dérangeantes (kanalên ‘bi tevahî nûçe’ têra xwe kêm zivêrker” , Le Monde diplomatique, Hezîran 2007’an.

(8) Colloque Nouveaux Paysages Audiovisuels (Koma xebatê ya Rûyên Nû yên Medya Deng û Dîmenan), Maison de la Chimie, Parîs, 22’ê Cotmeha 2009’an.

(9) Philippe Merlant û Luc Chatel, Médias, la faillite d’un contre-pouvoir (Medya, îflasa hêzeke dijber) Fayard, 2009

(10) Binêre li nîqaşa “Google, adversaire ou partenaire (Google, hevrik yan hevgir e)”, 4/12/2009, li ser malpera www.observatoiredesmedias.com

(11) Lêkolîna Nielsen û NiemanjournalismLab a îlona 2009’an, Cotmeha 2009’an, Eric Scherer behsa wê dike, çavkaniya li jor navê wê bihurî.

(12) Jurgen Habermas, Il faut sauver la presse de qualité (Divê çapemeniya bi kalîte were rizgarkirin), Le Monde, 22’ê Gulana 2007’an.

(13) Networks Effects (Bandorên Tevnê), The Economist, London, 17’ê Kanûna 2009’an.

TENDURISTÎ

# 2,6 milyar mirov bê tuwalet in

MAGGIE BLACK*

Di vê cîhana me de ku xelk bêtir ketine xem û endîşeya belavbûna karbonê, qirêjîkerên kîmyayî û nûkleer, qirêjîtiya herî bingehî ku ji terxê nexweşîsaz durist dibe, nabe dabaşa tu munaqeşeyên girîng. Ji cerga bêhna pîs a mezin a London'ê, welatên endûstriyel serkaniyên girîng terxan kirine bo paqijî û hîjyena jîngeha bajarî. Li welatên li ser rêya geşedanê, têgihiştineke çaktir a sebebên nexweşiyan, tirsa ji "ta"yê (malarya: mala aria) kêmtir kiriye, ku bi sedsalan e ta bi binasê nexweşiyên cihêreng tê zanîn.

Lê belê, berbelavbûna jiyana bajarî û avadankirinê rê li ber fikareke nû vekiriye. Beşekî mezin ê xelkê bajaran li taxên feqîr dijîn: anku li geto û zoravayan, di bin kepran de dijîn… Milyarek ji xelkê bajarî mexdûr in ji nebûna îmkanên saxlemiyê, û ji netîceyên wê yên di barê hejarî, rûmeta şexsî û tenduristiyê de.

Zambie, piştî ku heft hezar rûdanên kolerayê hatine serî, û sed û şêst û du kes jê mirin, ku sî ji wan li paytext Lusaka'yê, hêj nû radibe 12,5 milyar kwachan (1,5 milyon euro) terxan dike bo bernameyeke kêmkirina xetereyan. Di çarçoveya bernameya navhatî de, ji hêza girtiyan îstîfadeyê dike ji bo paqijkirina leximan, û bi rêya bernameyên taybet ên televîzyonî û ahengan xelkî agahdar dike (1).

Lê belê, şertên jiyana hejar a li qeraxên (hetta carinan navendên) bajarên ku her berfirehtir dibin li Efrîqa, li Asya û li Amerîka ya Latîn kêm caran wekî gefeke ciddî tê dîtin li ser saxlemiya civakî û bajarî. Li her welatî, binesaziyên medîkal bi giştî têr dikin ji bo berbendkirina belavbûneke berfireh a nexweşiyên perok –ku ji wan ya herî li pêş kolera ye.

Tuwaletên alafranga [bi klozet] û yên hemû pîsiyê dirêjine nav leximeke giştî, ew bawerî dabû ku dabînkirina aveke têr û tesel bi tenê jî dikare kêşeya birandina terxî çareser bike. Pêwendiya di navbera nexweşî û qirêjîkirina avan [bi terxî] hatibû jibîrkirin; ev feramoşkarî gihiştibû heta wê dereceyê ku polîtîkaya saxlemiyê, vîjik û enfeksiyonên din ên têkildarî terxî, dixiste nav kategoriya "berdestbûna avê."

Îro, xwedanên xaniyan muaf in ji "baca li ser avê" ji bo "girêdanên" bi ava vexwarinê, heçko kanalîzasyonên leximan nînin. Bi vê fêla zimanî, ev mijara nerihetker qedexekirî ye ne tenê di nav axaftinên xelkê giştî de, belkî di nav derdorên biryargiran de jî. Li hinek beşên cîhana di geşedanê de, rûbarên ku di nav bajaran re derbas dibin bi qasî Tamise, Ren [Rhein] û Sena [Seine] sedsala XIX'an mend û giran in, û her bi qasî wan aciz in ku nikarin wan gelêşên mirovan ragirin ku bûne serbarê bedenê wan. Lê belê, ev "bêhnên pîs" nema dibin binasê tirsê, û hindî ku dûr bin ji navendên bajaran ku hotelên giran û cazîbeyên tûrîstîk lê ne, piştguhkirin her meyla serdest e. Di netîceyê de tiştê diyar ew e ku ji bo 2,6 milyar kesan –ji sedî 38'ê nufûsa cîhanê!–, kêşeya rojane ya rêtin û valakirina terxî çareser nebûye. Ji bo wan ne tuwalet berdest in ne jî co û girêdanên bi leximan ve. Bikaranîna tuwaletekê, ku terxî dirêje di nav kûrik an jî bîrekê de, bi xizmeteke biserûber a valakirinê nayê temamkirin. Herwiha, gava ku xanî bi lexima serekî ve têne girêdan, bi tenê ji sedî 10'ê madeyên terxî têne emelkirin û tunekirin; ji sedî nodê mayî digihe rûbaran, ku tê heye li wê derê netîceyên wê yên li ser jîngeha avî –cinsên masiyan, jiyana giyayî– û li ser saxlemiya mirovî pir wêranker bin.

Di gelek ji wan nimûneyan de, ev av tê bikaranîn ji bo serşûştinê, paqijiyê, cilşûştinê, û hetta carinan ji bo ava vexwarina mirov û heywanan jî ji wan tê dabînkirin. Herçend kirdeyê karîger ê hilmijîn û valakirina gelêşan be, av jî têra xwe madeyên nexweşîsaz [patojen] dihewîne, wekî bi milyonan bakteriyên mîkroskobîk ên di nav her pirîskeke terxî de.

Hindistan'ê, bo maweya pênc salan, yek milyar dolar qerz kirin ji Banka Cîhanî ji bo paqijkirina rûbarê Ganj'ê, ku ji ber gelêşên endûstriyel yên jehrî û paqijnekirina bi salan qirêjî bûye (2). Lê belê, herçend gelek binkeyên safkirinê ava kiribin û dabine xebitandin jî li ser devê leximên sertaserê çemî, hêviya girêdana xaniyên feqîr bi wan leximan ve, bi veberhênan û budceyeke wiha mezin jî xeyal e û ne rasteqîne ye.

Hema bêje tevahiya wan ên ku nikarin îstifadeyê ji binkeyên tenduristiyê wergirin li gund û gundewaran (70 %) di xanî û hêwirgehên sade û îptidaî de, an jî di wan zoravayan (30 %) de dijîn ku her mezintir dibin.

Di piraniya deverên çolter û gundewar ên welatên di rêya geşedanê de, xelk li derve terx dikin [pîsiya xwe dihêlin]; gava dinya tarî dibe, berê xwe didine nav zeviyan. Kêşeyên bi vê meseleyê ve girêdayî gelek in, bi taybetî ji bo jinan, ku divê gelek bi dizî ve bikin ji bo parastina hetk û avrûyên xwe. Êrîşên fîzîkî an jî cinsî jî dîsa kêm nînin di dema wan geriyanên şevîn de. Li rexê din, mecbûriyeta xweragirtina di nav rojê de dibe bibe binasê kêşeyên mîztinê an jî tenduristiyê.

Gava tu cih nebe ji bo çûnê, mesela di nav bajaran de, an jî di nimûneya zarokên biçûk û pîremêr û pîrejinên kêmendam an pir nexweş de, divê satilekê bi kar bînin an jî bi rêya poşetekê xwe rihet bikin. Paşê, poşetê davêjine sergoyeke nêzîk; kûçikên bêxwedan an jî beraz tên, bi usûla xwe, paqijiyê lê dikin. Ev pakêtên bêzewer bi navê "tuwaletên firrok" têne nasîn.

Li gund û gundewaran, hinek dezgehên 'edetî hezar caran çêtir in ji bikaranîna tuwaletên kêrnehatî û bêhnpîs. Xelkê gundewaran gelek caran qebûl nake holikeke tuwaletê hebe di nav malê de an jî li dora malê; wan pê xweş e heta ku îmkan hebe, wê madeyê ji jiyana xwe dûr bigirin. Di rabirdûyê de, taybetiyên hişkker û bêbêhnker ên roj û bayî, her digel paqijkariya bi rêya herikîna avê ya daîmî, bi awayekî herî baş karê wan qedandiye. Lê belê, li cîhanekê ku nufûsa mirovan pir bilindtir bûye, terxkirina li derve bûye pratîkeke zerermend bo tenduristiyê.

Bi hezaran kes nexweşiyan vedigirin ji ber pirtikên terxî, ku amade ne li nav zeviyan, li ser rê û cadeyan, li ser peravên behran, çem û dolan. Mîkrobên nexweşîsaz xwe li ser pêyan, di nav xurekan de, di nav alavên metbexê û li ser cilûbergan radigirin û kesên ku di golan de serê xwe dişon û ji ava birkan avdestê werdigirin, herwiha zarokên ku li wir dileyîzin wan mîkroban dikêşine nava xwe.

Her sal, 1,5 milyon zarokên temenbiçûk jiyana xwe ji dest didin ji ber enfeksiyonên vîjikê. Bi milyonan zarokên din jî tûşî bilindbûna kelê û nexweşiyên zikî dibin ku ji ber vê hindê gelek caran bi duristî nikarin dewamê li xwendingehê bikin, herwiha ev yek tesîreke xerab li geşepêdana wan dike û dibe binasê mesrefên sexbêriyê û çavkaniyên malbatê. Enfeksiyonên parazît, ku ji ber temasa pêyên tazî digel madeyên terxî pêk tên, hêj jî gelek belave ne û her sal zêdetir ji 133 milyon rûdanên wiha têne tomarkirin. Askarîd, kurmeke girover ku xwe bi rûviyan ve digire, dikare sêkiyê [ji sê beşan yekê] xurekê ku zarokek dadiqurtîne bimêje, û bibe binasê nexweşiya astimê. Tê heye ku bi hezaran parazît di heman gavê de li ser û nava zarokekî ku li devereke qirêjî dijî hebin.

Lê belê, herçend encamên bo tenduristiyê yên sîstemeke paqijkariyê ya bikêmasî bibe sebebê nerihetbûna rayedaran, holika tuwaletê li ber nezera xelkî hêj jî ji alîkariyeke tenduristî û hîjyenê bêtir wekî malekî şexsî dimîne. Her ku jiyana bajarî belavetir dibe, heke dezgehên ji bo wê yekê hatî danîn nebin, xwe-vedizîna ji bo qedandina wan tengaviyan gelek zehmettir dibe; herwiha, nebûna mahremiyetê dibe binasê pêkhatina daxwaza danîna wan dezgehan di nav xelkê herî feqîr de, lê bi taybetî di nav wan de yên ku li sirdeya [nêrdewan] civakî hildikişin. Tuwalet, êdî di malbatên feqîr û destkurt de jî, herwekî televîzyonê, nîşaneke nûjeniyê ye ku xelk lê digere.

Di heman demê de, pêdiviya bi hemamekê an jî bi dûşeke sade û kanalîzasyona bo raguhastina avên zêdeyî, dike ku "gelek amraz û dezgehên maldariyê", ku ewrûpiyan qederê sed sal berê nas kiribûn, pêwîst bin. Diyar e rayedar û rêxistinên lokal, zêde xwe di ber re nakin û têra xwe çavkaniyan jê re terxan nakin; ne jî aliyê kesayetên xwedantesîr ên ji çînên rêveber û ne jî ji aliyê xelkê asayî, tu motîvasyon û handanek ji bo qedandina wan kêmasiyan diyar nîne.

Bexşker bi xwe jî xwedan mesûliyet in ji halê heyî. Herçend salê 13 milyar dolaran terxan bikin bo bernameyên avê, bi tenê milyarek ji bo duristkirina tuwalet û binesaziyên wan tê cudakirin (3). Di bernameyên bi navê "av û paqijkarî" de, gelek caran feramoş dikin budceyekê cuda bikin ji bo perwerdeya hîjyenê, handana bikaranîna tuwaletan an jî ji bo avakirina binesaziyên valakirina av û terxan, heta wê dereceyê ku êdî peyva "paqijkarî" li wê derê bi tenê ji bo xemilandinê dimîne.

Gava Neteweyên Yekgirtî di sala 2000'an de hedefên mîlenyûmê destnîşan kirin, paqijkarî her hîç di nav de derbas nebû. Bi tenê piştî xebata lobiyeke qewî, di duyemîn civîna bilind a Serzemîn (li Johannesburg'ê, di 2002'an de) de, biryar hate girtin derbarê paqijkariyê de jî hedefek lê bê zêdekirin ku li gorî wê hedefê, heta sala 2015'an, rêjeya wan kesên ku di 1990'an de îmkana wan a îstifadekirina ji dezgehên bingehî yên paqijî û tuwaletan nebû, nîvenîv dê bê daxistin. Lê belê, bi ya Unicef'ê, êdî tu hêvî nîne ku ew hedefa nefsbiçûk –lewre hêj 1,8 milyar kes dê li rexê xerab ê xetê bimînin– bibe rastî.

* *Nivîskara The Last Taboo (Ligel Ben Fawcett): Opening the Door on the Global Sanitation Crisis, Earthscan, London, 2008.*



*Rebwar Saeed - Efekt LMD kurdî*

Hêdîtiya –darayî, siyasî, sazûmanî, promosyonî– ya pêşketinên di warê paqijkariyê de kir ku Neteweyên Yekgirtî sala 2008'an wekî "sala navneteweyî bo paqijkariyê" (SNP) destnîşan bike. Çend netîce bi dest ketin ji vê. Axirî, meseleyên ava vexwarinê û paqijkariya bi avê li ber nezera biryargiran wekî du kêşeyên serbixwe ji hev hatine cudakirin.

Li gelek herêmên cîhanê, tuwaletên ku pêkan e li deverên herî feqîr bên avakirin, nikarin avê wergirin ne jî bi kanalîzasyoneke valakirinê ve bêne girêdan. Ne şêniyan ne jî rayedarên lokal ew îmkan hene ku pere birazînine sazkirina kanalîzasyon û bîrên binerdî, û hêj kêmtir ji bo sîstemên valakirin û safkirina madeyên valakirî. Hejmareke mezin ji welatên Efrîqa û Rojhilata Nêzîk (her wekî Hindistan û Çîn'ê), tûşî kêşeyên ciddî yên kêmasiya avê dibin. Lewma, paqijkariyeke giştî ya cîhanî her ji serî ve hizreke têkçûyî ye.

Herwekî di nimûneyên din de jî tê dîtin, gava ku kêşeyeke bo demeke dirêj hatî piştguhkirin tê mexderê, SNP'yê, di rexekê re, pêşketinên perwerdeyî û teknolojîk ên di bin sî û sîberê de mayî, di rexê din re, rewşên gelek ji wan ên ku em li hêviyê bûn xerabtir, anîne rojevê. Hizreke taze li ser xelkê ku di hêwirên "derqanûnî" de dijîn em têgihandin ku hejmara kesên ku di şert û mercên pir xerab de dijîn, di rastiyê de gelek ji yên tomarkirî zêdetir e. Gelek welat, ji ber tirsa brîndarkirina îmaja xwe ya tûrîstîk, li ser kêşeya kolerayê, xwe li nezanînê û li nedîtinê datînin; lewma, bi hejmarên mezin ên nexweşan, bi bêdengî êşa nexweşiya xwe dikêşin, lewre wisa bawer dikin ku belaya li ser serê wan "nesaxiyeke kirêt" e (4).

Berî destnîşankirina her çi pêşketinekê di warê tenduristî û paqijiyê de, pêwîst e ew teknolojiyên alternatîf bêne teşwîqkirin ku ji wan sîstemên kevn ên leximên mezin, ku li cîhana endûstriyel û taxên rihet baw û belave ne, erzantir û hêsantir in bo bicihkirin û parastinê.

**Wergera ji fransî**
**Ergîn Opengîn**

(1) Sam Phiri, "Zambia: Lusaka declares war against malaria, cholera", Times of Zambia, Lusaka, 27 Cotmeh 2009.

(2) BBC News, "World Bank loans India $1bn for Ganges river clean up", 3 Kanûn 2009.

(3) Global Water Partnership, "Towards Water Security: A Framework for Action", Stockholm, 2000.

(4) Bulletin de l'Organisation mondiale de la santé, vol. 87, 885-964, Genève, Kanûn 2009.

HRANT DÎNK

# Sohbetên me yên dawîn bi hev re

Taner Akçam*

Dibe ku gelek ji me sosret bibîne lê Hrant, bawer dikir ku di aloziya tirk û ermeniyan de, bûyerên 1915'an, ne pirsgirêkeke esasî û bingehîn e. Bila şaş neyê famkirin, ewî ne digot ku mijara nijadkujiyê ne pirsgirêk e. Ewî bawer dikir, aloziya ku niha di navbêra tirk û ermaniyan de heye, ne ku jiber alî bi awayekî cûda li bûyerên 1915'an dinêrin, di radeyeke bilind de ji awayê jihev-famkirin û jihev-têgîhiştina aliyan çavkanî digire. Nîqaşa wî, ne nîqaşa mirîşk û hêkê bû. Bê guman, ewî didît ku têgihiştîna roja îro, li ser hinek hîmê dîrokî disekine û vê yekê jî bilêv dikir. Lê li gora wî efsûna ku wê girêka Gordiyan'ê veke, ne di dîrokê de, lê di têkîliyên roja îro de veşartiye. Li gora wî, li her dû aliyan jî derdorên naxwazin bi hevûdin re têkîliyê deynin, dijmanatiyê bi hevûdin re bikin û derdorên ku li serê vê yekê xwe bi xwedî dikin hene. Ev derdorana li ser civakên xwe zextên cidî yên psîkolojîk çêdikin.

Herkes bi awayekî li ber windahiyên xwe dikeve. Çawa ku em bi awayekî li ber windahiya Hrant dikevin. Ez herî zêde li ber dikevim ku min xizmekî xwe, birayê xwe winda kiriye. Ez niha li ber dikevim ku dema Stenbol tê gotin, ji nêvî zêdetir tiştên dihatin bîra min ji holê rabûn. Ji bo mirov ji Stenbol'ê were Minneapolis'ê divê mirov saet li dora çarê sibê li balafirgehê be. Min jê re digot, "Hrant, amade be ji sibê re, ezê dîsa te bê xew bihêlim." Em li mala wî heta sibê diman, ez li qoltixekî, ew li qoltixekî geh xilmaş dibûn geh li televîzyonê dinerîn, çi tiştên me nikarîbûya bi axivin hingî em li ser dipeyivîn.

Ewî min hînî masîgirtinê kir. Bi saetan li ser qayikê, geh di avê werdibûn geh jî me qerf diavêtin birayî wî Orhan an jî heval û hogirê wî yê girtîgehê Necdet, me roja xwe bi henekan derbas dikir ka kî zêdetir hosteyê masîgirtinê ye. Ya herî xweş, masiyên me digirtin êvarî me dibirin loqintê, me diqijiland û serê xwe hinekî xweş dikir. Bi Etyen (Mahçupyan) re evîna pêşbirka hespan û bi zorê dixwest min jî bixe nav vî karî de, hingî ew kêfeke cûda bû. Niha ezê van gişan bi kê re bikim? Ez ji valatiya ku windahîtiya wî di jiyana min de afirandiye û ji şoqa ketimê de nekarîm rizgar bibim. Gava ez ji merasîma cenazê wî vegeriyam, hinek rojan 24 saetan ji nav ciyan derneketim; hinek rojan ji 12 saetan zêdetir razam. Beriya mirina Hrant, carê destê sibê saet li dora 3'an radibûm û diçûm kar. Niha jî ez êdî nikarim rabim. Min dev ji gelek tiştan berda... Nexasim meha borî gava ku Orhan di telefonê de got ku wê Arat (kurê Hrant) here Belçîka'yê (bi cîh bibe), hingî ti tiştî nema tam dida min...

Dibêjin ku nivîsandin, rêyeke baş a rehetbûnê ye. Ez jî wiha bikim. Ez qiseyên me yên dawiyê binivîsim. Tiştên ku di dema dawî de di serê wî re derbas dibû û tiştên bi min re parve dikir binivîsînim. Belkû ez jî hinekî rehet bibim û qenebe bi vî awayî qismek tiştên wî dixwest bike, were zanîn.

Ezê behsa projeya me ya ku me dixwest li ser navê kovara AGOS'ê weşanxaneyekê ava bikin û hin rêze pirtûkan çap bikin, nekim. Ezê behsa wergerên me dane kirin ên ji pirtûkên bîranînan ên ermenî ku piraniya wan di salên 1930 û 1940'an de, derbarê 1915'an de hatiye nivîsandin, nekim. Ewî ji bo AGOS'ê beşeke zêde ya ji 4 rûpelan difikirî û di van 4 rûpelan de tenê dixwest li ser 1915'an û bûyerên li derdora vê salê re mijûl bibe. Lê ezê behsa vê jî nekim. Ewê ne bi nivîsên kûr, bi pirs û bersivên hêsan tijî bûba ev çar rûpel. Bi pirs û bersivên hêsan...

Ezê behs nekim ku dixwest ez berpirsyariya beşeke wiha bigirim ser xwe û min dixwest ez xwe jê bidim alî. Hingî min gotibû, "Wextê min tine Hrant, ez ne rojnamevan im, ez nikarim bikim" û ew jî wisa razî bibû. Lê min soz dabû ku ezê bersivan binivîsînim ji bo pirsên werin amadekirin. Min topê avêtibû ser wî û gotibû, "Pirsan tu amade bike û ezê jî bersivan binivîsînim", û ez bi vî rengî jê xelas bibûm. Jiber zêdebûna karê wî ewî nekarî 100 pirsên di serê xwe de derbasî nivîsê bike. Na nexêr ezê behsa van nekim; ezê tenê ji were hinek qiseyên me di sala 2007'an de di 4 û 5'ê Çile'yê de kiribû ragihînim. Bi vî awayî belkû hûn Hrant hinekî din ji nêz ve nas bikin. Em li ser mijarên weke serîlêdana wî ya ji bo Dadgeha Mafê Mirovan a Ewrûpa'yê, parêznameya wê di dadgehê de bike; tehdît û gefên li dijî wî, tabloya reşbîn a derbarê ku wê sala 2007'an gelekî xirab derbas bibe, her wiha pêwîstiya derketina wî ya dervehî welat axivîbûn. Em li ser sê mijarên girîng axivîbûn. Em dikarin ji van re bêjin sê fikrên girîng, sê projeyên Hrant. Wateya Hrant a ji bo Tirkiye'yê, ji bo xelkên tirk û ermenî, di van projeyên wî de veşartiye. Bi mirina wî re piraniya van projeyan ketin paşerojeke ne diyar. Ev nivîs, wê hinekî ji me re qala wateya Hrant ji bo me çibû û bi mirina wî me çi winda kir, bike.

## Konferansa diyasporayê

Mijara vê konferansê, wê polîtîkayên rêxistinên ermenî yên li diyasporayê yên derbarê Tirkiye'yê de baya. Digot "Divê ji sedî sed em hesab ji hevûdin bixwazin." Ew ji siyaseta ku rêxistinên diyasporayê derbarê Tirkiye'yê de dişopandin, gelekî nerazî bû. Min jê re digot "Hrant, hebûneke giştî ya bi navê diyasporayê tine. Lewma ne rast e ku tu vê peyvê bi yekalî ve bikartîne, tu şaş dikî", ewî jî digot "ez dizanim." "Tu fam dikî ez dixwazim bêjim çi. Gava ez dibêjim 'diyaspora' ez qesta zîhniyetekê, qesta ferasetekê dikim. Zîhniyeteke ku bi giranî li cem Taşnak'an heye û zîhniyeteke ku tu jî nikarî înkar bikî desthilatdar e. Ev zîhniyet gelekî şaş e û di çareseriya pirsgirêkê de ti feda wê tine, heta ez îdîa edikim ku bûye weke bingeheke pirsgirêkê."

Xala bingehîn ku ew jê pê nexweş bû, çima rêxistinên li diyasporayê li hemberî bûyerên li Tirkiye'yê rû didin bê eleqedar û sersarin. Ew Tirkiye û mirovên vî welatî weke yekpare, weke bloqekê didîtin. Bi çavekî "neyarên li dijî me" li Tirkiye'yê û li mirovên wê dihate nêrtin. Ewî digot "Taner, ev mesele li vê derê, li Tirkiye'yê wê were çareserkirin; ew vê yekê nabînin; vê meselê nikarin li ti deverên din çareser bikin. Bi pişt-spartina Amerîkiyan, Fransiyan, bi alîkariya wan nikarin ti tiştî bikin. Wê mesele li Tirkiye'yê biqede." Ew gelekî hêrs dibû ku rêxistinên diyasporayê, li hemberî pevçûna demokrasiyê ya li Tirkiye'yê bê xem nêzîk dibin û pişta xwe gelekî bi aliyê sêyemîn ve girê didan. "Rewşeke gelekî bê rûmet e ku mirov bix-

* Lêkolîner, nivîskar.

waze pirsgirêkên mirov ji aliyê hukumeta amerîkî an jî ji aliyê dewletên ewrûpî ve were çareserkirin. Ne nêrîneke tekûz e ku mirov ew çend pişta xwe bide hineke din."

Hrant, tim û dayîm heman gotinan ji min re dûbare dikir: "Divê ez qala vê yekê ji wan re bikim. Divê bibînin ku afirandineke Tirkiye'yeke demokratîk xala çareseriya bingehîn a pirsgirêkê ye. Divê ew bi têkoşîna demokrasiyê ya li Tirkiye'yê re polîtîkayên ahengdar pêş bixînin. Divê ew bibînin ku Tirkiye'yeke ne demokratîk, rêz û rûmetê ji kêmeneteweyên xwe re nagire, dibe ku bi saya zexta derve neçar bimîne stûyê xwe deyne û lêborîneke hêsan ji bo rabirdûyê bide. Gelo tenê ev e xwesteka wan? Tirkiye'yeke ne demokratîk, rêz û rûmetê ji mafê mirovan re nagire, azadiya raman nas nake, Tirkiye'yeke wiha ji bo rabirdûyê lêborînekê bixwaze yan jî bêje 'belê ev jenosîd e', hingî wê çi bigûhere? Ev e tişta dixwazin?"

Hrant bendewariyên xwe yên ji rêxistinên diyasporayê jî bi eşkereyî digot: "Divê ew dev ji xeteke wiha hêsan a dijbertiya Tirkiye'yê berdin. Divê dev ji nêrîna xwe ya Tirkiye'yê weke bloqekê dibînin berdin. Divê dev ji wê zîhniyeta ku dibêje 'her tişta zerarê dide Tirkiye û tirkan di fêda me de ye' berdin." Gava min jê re digot, "Hrant, ger konferanseke wiha çêbibe jî, ewê werin biaxivin û biçin, bawer nakim ku siyaseta xwe bigûherînin", digot, "na nexêr, divê ew fam bikin, divê ez ji wan re bidim famkirin. Di navbêra me de hesapxwestin û hesapstendineke cidî şert e. Ew ne di ferqa girîngiya têkoşîna li Tirkiye'yê de ne. Şert e ku mirov bi ermeniyên diyasporayê re pir eşkere biaxive û şert e mirov hesab ji hev bixwaze."

Hrant ew çend jixwe bawer û zexm diaxîvî ku... Ew wisa bawer dikim ku yek ji taybetmendiyên wî yên girîng ên divê were zanîn ev bû. Gelekî lê gelekî baweriya wî bi wî hebû. Ewî bawer dikir ku xwedî kapasîte û behremendiya gûherandinê ye. Tiştên ku dikir, weke garantiya tiştên dikariya bike didît. Kî dizane belkû jî di vê mijarê de ne neheq bû.

Hrant, di cûreyekî ku dixwaze de hewil da konferanseke Ermeniyên diyasporayê were lidardixstin. Ewî bi hin ji parlementerên Parlemena Ewrûpa'yê re axivîbû û ji wan xwestibû malovaniyê ji konferanseke wiha re bikin. Di axavtina me ya dawî de ji min re careke din got ku konferanseke wiha ji bo wî gelekî girînge û diyar kir ku ew di mijara amadekariyên teknîkî de gelekî pêş ve çûne. Bi mirina wî re ev hewildana konferansê jî di nêvî de ma. Dibe ku careke din wê qet nebe. Jiber ji bilî wî kesek din tine ku bi dengekî bilind bîne ziman ku divê rêxistinên diyasporayê polîtîkayên xwe yên derbarê Tirkiye'yê de di ber çavan re derbas bikin.

Eger mirov bipirse, wateya Hrant û têkoşîna wî ji bo me çiye, hingî bersiva herî baş a mirov bide, ew nîqaşa ku ew difikirî mirov ji nû ve bide destpêkirin. Ezê pêşniyaz bikim ku rêxistinên cîhêreng ên aktîf ên li diyasporayê vê pêşniyaza wî cidî bigirin. Di encamê de Hrant kaniyeke bi xûm xûm diherîkî û şaxekî ji xakên Tirkiye'yê dirêj dibû ku dixwest xelkên tirk û ermenî bîne cem hev. Şaxê me qût kirin, kaniya me çikandin. Ji bo rêzgirtina bîranîna wî baştir be konferanseke wiha were lidarxistin. Dikare di mijara polîtîkayên derbarê Tirkiye'yê de nîqaşên cidî were pêşxistin. Dane-jînkirina bîranînê belkû jî tişteke wiha be: mirov ala ketiye erdê ji cîhê mayî berdewam bike!

## Hewildana normalkirina têkîliyên ermenî û tirkan


Dibe ku gelek ji me sosret bibîne lê Hrant, bawer dikir ku di aloziya tirk û ermeniyan de, bûyerên 1915'an, ne pirsgirêkeke esasî û bingehîn e. Bila şaş neyê famkirin, ewî ne digot ku mijara nijadkujiyê ne pirsgirêk e. Ewî bawer dikir, aloziya ku niha di navbêra tirk û ermaniyan de heye, ne ku jiber alî bi awayekî cûda li bûyerên 1915'an dinêrin, di radeyeke bilind de ji awayê jihev-famkirin û jihev-têgîhiştina aliyan çavkanî digire. Nîqaşa wî, ne nîqaşa mirîşk û hêkê bû. Bê guman, ewî didît ku têgihiştina roja îro, li ser hinek hîmê dîrokî disekine û vê yekê jî bilêv dikir. Lê li gora wî efsûna ku wê girêka Gordiyan'ê veke, ne di dîrokê de, lê di têkîliyên roja îro de veşartiye. Li gora wî, li her dû aliyan jî derdorên naxwazin bi hevûdin re têkîliyê deynin, dijmanatiyê bi hevûdin re bikin û der- dorên ku li serê vê yekê xwe bi xwedî dikin hene. Ev derdorana li ser civakên xwe zextên cidî yên psîkolojîk çêdikin. Li gorî wî ev derdorana, bi qestî dîrokê jî di vê çarçoveyê de bikartînin û li dîrokê weke navgîneke ku neyartiya heyî xûrtir bike nêzîk dibin. Bi taybetî digot ku li Tirkiye'yê hin derdorên siyasî, heta dawî bi qestî polîtîkaya antî-ermeniyan dişopînin û bawer dikir ku çareseriya bingehîn di gûherandina van polîtîkayên heyî re derbas dibe. Ango mifte di roja me ya îro de ye, ne di dîrokê de.

Ji bo Hrant pirsgirêka navendî girtina sînor bû. Wî bawer dikir ku diviyabû hemû hewildan û giranî ji bo vekirina sînor were dayîn. Ew difikirî ku eger di navbêra Tirkiye û Ermenîstan'ê de têkîliyên normal ava bibe, hingî pirsgirêkên çavkaniya xwe ji dîrokê distîne jî di radeyeke mezin de çareser bibe, herî kêm wê alîkariyê bide afirandina şert û mercên çareseriyê.


"Her du xelk jî baş dizanin di dîrokê de çi bûye. Eger sînor vebe û mirov bikevin nav têkîliyên normal de, karibin hevdû nas bikin, hingî wê karibin li ser dîrokê jî bipeyivin. Pirsgirêka bingehîn derdorên polîtîk in ku naxwazin her dû xelk raste-rast bikeve nav têkîliyê de. Ev derdorên polîtîk, jiber ku têkîliyê naxwazin dîrokê bikartînin. Naxwe teza ku dibêje dîrok dibe astengê têkîliyên roja îro, ne raste. Nêzîkatiyeke ku têkîliyên îro esas bigire şerte, ne ku nêzîkatiyeke dîrokê esas bigire. Tişta divê were kirin ewe ku însiyatîfeke sîvîl a ku dixwaze têkîliyên bi Ermenîstan'ê re were normalkirin, dest bi kar bike."

Bi taybetî di mehên havînê yên 2006'an de em li ser vê mijarê gelekî dirêj axivîbûn. Di wan mehan de pêşniyazeke Tayyîp Erdogan a weke "em komîsyona dîroknasan saz bikin" hebû, dibe ku ev pêşniyaza wî tenê şeklîbe jî, lê ez di wê nêrînê de bûm ku diviyabû ev pêşniyaza wî derbasî pratîkê bûba [hîn jî di wê nêrînê de me]. Me bi Hrant re ji bo avakirina komîsyoneke wiha nîqaş dikir ka weke civaka sîvîl em hewildanên weke çi dikarin bikin. Min jê re digot, eger ji jêr ve zexteke wiha çêbibe, ev yekê bi kêr were. Lê Hrant li pêşniyazên min ên ji bo piştgirîdayîna fikra komîsyona dîroknasan û ji bo pêkanîna vê yekê çêkirina hewildanên sîvîl, germ nenerî. Di vê mijarê de serî wî gelekî vekirî bû, digot: "Hûn ez dizanim ku xebata we ya akademîsyenan a derbarê dîrokê de, girînge lê belê ez bawer nakim ku komîsyoneke dîrokê karibe pirsgirêkê çareser bike." Ew difikirî, xebateke li ser dîrokê kûrbûyî, xebateke dixwaze di dîrokê de çi bûye derxîne holê, ewê zêde nikaribe gûhertinên mezin çêke. Ji ber vê çendê li dijî pêşniyaza Komîsyona Dîrokzanan derdiket. Digot: "Pêwîstiya heyî ne eve." Bi karê komîsyona dîroknasan re mijûlbûn jê re weke windahiyê dihat. Di vê mijarê de ew gelekî zelal bû: "Pêwîstî ewe ku însiyatîfeke sîvîl were damezirandin ku li Tirkiye'yê karibe rojane raste rast dest bavêje siyasetê, sererastkirina têkîliyên tirk û ermeniyan ji xwe re bike hîm û navendek, divê em tiştekî wiha biafirînin."

Di dirêjahiya mehên payîz û havîna 2006'an de me hin rêzehevdîtin çêkiribûn. Bi gelek mi-



*Rebwar Sa*



*Efekt LMD kurdî*

rovan re yek bi yek, kom bi kom em dihatin cem hev, me ev hevdîtin ji hevûdin re radigihand, li ser ramanên derdiket holê me danûstendin çêdikir. Di destpêka meha çile'yê de me careke din dest bi nîqaşa vê mijarê kir. Daxwaza wî ew bû ku bi tevlîbûna raste rast yan jî îndîrekt a nûnerên saziyên civaka sîvîl a Tirkiye'yê însiyatîfek were destpêkirin. Daxwaza herî mezin a Hrant ew bû ku rêxistinên civaka sîvîl a tirk û ermeniyan were cem hev û însiyatîfeke polîtîk ku ji xwe re başkirin û normalkirina têkîliyên navbêra herdû welatan dike navend bidana destpêkirin.

Li gorî wî diviyabû di navbêra her dû civakan de destpêkê de zimanê axavtinê bihata sazkirin, axavtin bihate normalkirin. Wî digot ku divê deriyên diyalogê werin vekirin û li dijî siyaset û siyasetmedarên dixwazin qanalên diyalogê bigirin da ku xelk bi çavê dujminan li hevûdin binêrin, helwest were danîn. Dîrok incex, di nav "zimanekî normal û têkîliyên normal de" dikare bi hêsanî çareser bibe. Karê destpêkê were kirin ewe ku dawî li desthilatdariya mantiqê ku dîrokê dike pirsgirêk û vê yekê bi qestî bikartîne, were dayîn. Daxwaz û azweriya Hrant a hewildaneke sîvîl ji bo normakirina têkîliyên roja îro û vekirina sînor, di nêvcî de ma. Em di destpêka meha çile ya 2007'an de vê mijarê cardin axivîbûn. Ji destpêka havîna 2006'an û vir ve, hewildanên wî yên domandibû encam nedabû. Ew li dîwarekî gûhnedar, bêxem û bê deng qelibû. Me herdûyan li hember hev ji bê xemiya rewşenbîr û saziyên civaka sîvîl ên li Tirkiye'yê yên derbarê mijarê de, gazinc dikir. Gûhnedariya rewşenbîran a derbarê mijarê de, pirsgirêka bingehîn bû ku Hrant aciz dikir. Her ku min digot: "em tenê ne Hrant, tenê ne", serê xwe dihejand. Ew di nav qelebalixiyê de tenê bû. Gelek kesên hes jê dikir hebûn, wî weke "mirovekî delal ku dixwaze tiştên baş bike" didîtin lê belê gava digot "heydê", wî li cem xwe kes zêde nedidît ku bikeve nav liv û tevgerê de. Pirseke ku gelek kes di bersivdîtina wê de zoriyê dikşînin heye: Çawa dibe ku girseyeke girsegir ku ew çend nedihate payîn, tevlî merasîma cenazeyê Hrant bibûn. Yek ji bersiva vê pirsê di hevokên min ên jor de cîh digire. Li Tirkiye'yê dîwarê bê xemiyê yê li ser rewşenbîran desthilate û hestê tenêtiyê ya Hrant, qelebalixiya cenazeyê eşkere dikir. Li gorî min, xelk ji bo lêborînê kolanan tijî kirin. Wan dizanîbû ku wan vî mirovê delal ê her roj di televîzyonan de didîtin, di rojnameyan de nivîsên wî dixwendin tenê û bê parastin hiştibûn. Bi diltezîn û janeke kûr û bi stûxwariya tenê hiştina wî, bi hestê xwe-rexnekirinê me kolanan tijî kiribû. Eger emê behsa ji bo me wateya Hrant Dink, behsa mîrasa wî bikin, ez hingî dibêjim ku em ji bo afirandina însiyatîfeke sîvîl a ku wî dixwest bixebitin. Însiyatîfek bi navê wî, Însiyatîfa Hrant Dînk. Erkê yekemîn ê însiyatîfa Hrant Dînk jî ewê normakirina têkîliyên navbêra Tirkiye û Ermenîstan'ê be. Ez dixwazim ji vir bang li rêxistinên civaka sîvîl ên li diyasporayê, ên li Ermenîstan'ê, ên li Tirkiye'yê, rewşenbîrên li ser rayagiştî bi bandorin bikim. Ji kerema xwe re, pêşniyaza Hrant cidî bigirin. Ji bo însiyatîfeke wiha em dest bi hewildanan bikin.

## Ji ber 301'an darizandina wî û fikrên wî yên derbarê parêznameyê

Derheqê Hrant de ji bo peyva 'nijadkujî' bikaranîbû, doz hatibû vekirin. Wê rûniştina yekemîn a dozê di meha adarê de bihata kirin. Girîng e ku mirov bizane Hrant di vê dozê de dixwest parêznameyeke çawa bike. Ji ber ku gelek kesan îdîa kirin ku Hrant di bikaranîna peyva 'nijadkûjiyê' de pirsgirêka wî hebûye, vê peyvê bikarneaniye, heta ji ermeniyên diyasporayê xwestiye vê peyvê bikarneyînin. Evana giş, pêşbiryar û ramanên ne rast û neheqin.

Wer xûya dike ku ez pêşî helwestê Hrant ê ji bo bikaranîn an jî bikarneanîna peyva 'nijadkûjî'yê ji nû ve bi bîr bînim. Raste, Hrant, di nivîsên xwe de û di axavtinên xwe de peyva nijadkûjiyê bikarnetanî, çêtir didît bikar neyîne. Bi taybetî wî çêtir didît ku li Tirkiye'yê ji nîqaşên "1915'an de nijadkûjî bû yan jî na" dûr bisekine. Nêvî bi tinazî û henekî digot, "Ez serhatiyên gelê xwe dizanim, hûn çi dibêjin bêjin." Her wiha wî digot: "Ez naxwazim peyvê yan jî peyvan nîqaş bikim, ez dixwazim aliyê însanî ya pirsgirêkê derxim pêş." Fikra wî bi cewherî wiha bû: "Li ser van xakan neteweyek dijiya û niha tine. Ew netewe ji kokên xwe hatin qetandin weke darek ji koka xwe were qetandin. Dawî li jiyana wan a li van deran hate dayîn. Ji holêrakirina jiyanekê, drama mirovekî ez nikarim di peyvekê de bi cîh bikim, pêşî vê yekê fam bikin. Ez wisa difikirim ku ti peyveke hûn bibînin wê têra ravekirina vê drama mirovî neke."

Ez ji sohbetên me yên taybet dizanim. Ji ber ku peyva nijadkûjiyê mirovan sor dikir, ji ber ku bi kêrî çareseriya pirsgirêkê nedihat, ewî çêtir didît ji vê peyvê dûr bisekine. Jixwe wî di gotareke xwe de jî vê yekê bilêv kir; "Ez di rastiyê de dibêjim ku navê tişta qewimiye ne ewqas girînge, a zêdetir girîng tişta qewimiye bi xwe ye. Ti derdê min tine ku hûn ji vê re bêjin 'nijadkûjî'! Ya rastîn sepandinên bi vî rengî di civaka tirk de gelekî xeletin. Ev civak divê têbigîje, nîqaş bike û hîn bibe." (1)

Çawa ku li Tirkiye'yê jibo danasandina bûyerên 1915'an tevî kesî nedibû, fetwa nedida kesî, heman helwest li diyasporayê jî nîşan dida. Wî ti carî ji diyasporayê nexwest ku dev ji bikaranîna peyva nijadkûjiyê berdin. Ya rastîn di vê mijarê de helwesteke me ya hevbeş hebû bi wî re, ew jî ew bû ku herkes bila têgeha dixwaze bikar bîne, kes ji bo bikaranîna têgehan tevî ti kesî nebe. Ji bo Hrant, moral û helwest, ji têgehan girîngtir bû.

Di hevpeyvîneke xwe ya dabû ajansa Reuters'ê, jiber ku rojnamevan bi pirseke weke "nijadkûjiya yan na" gelekî tengijand, Hrant jî gotibû, "erê, nijadkûjî ye." Lewra derheqê wî de doz hate vekirin. Di doza hate vekirin de wê parastineke çawa bikira? Di 4 û 5'ê Çile'yê de wî çend carî bi xwe mijar vekir, di mijara parastina xwe de axivî. "Ez dixwazim dozê vegûhezînim kursiyeke dîrokî. Taner, ji kerema xwe re amade bibe û em bi hev re xwe amade bikin. Tişta ez difikirim ev e: ezê bêjim belê nijadkûjî ye û ezê xal bi xal rêz bikim û parastina xwe bikim. Nijadkûjî ye jiber ku, nijadkûjî ye jiber ku... Ezê parastineke wiha bikim ku ewê bi xwe jî bibînin ku ew di rastiyê de dîrokê li vir dadgeh dikin."

Eger nehata kuştin wê bigota, "Belê, bûyerên di 1915'an de nijadkûjiyek bû û bilêvkirina vê yekê jî nabe tewan û suç." Wî ev parastina xwe nekarî bike. Kesên nikarîn Hrant dadgeh bikin, Arat Dînk û Sarkî Seropyan dadgeh kirin û ji ber bikaranîna peyva nijadkûjiyê wan mehkûm kirin. Arat Dînk û Sarkis Seropyan û parêzvanên wan didin zanîn ku cezayê hatiye dayîn di rastiyê de ji Hrant re hate dayîn û ew bawer dikin ku ji bo bîranîna Hrant, parastina wî dixwest bike, şert e were kirin. "Belê bûyerên di 1915'an de hatin kirin nijadkûjî û jenosîdek bû; derdekî we heye?"

**Werger ji tirkî**
**Nurettin Akat**

*Ev nivîs ji bo LMD kurdî hatiye nivîsandin.*

(1) Hevpeyvîna wî ya di 2 Cotmeh 2006'an de di rojnameya Akşam'ê de kir: http://www.aksam.com.tr/haber.asp?a=65239,12

CHICAGO

# Bajarê muzîk û polîtîkayê

ALEXANDRE PIERREPONT*

**Bi ya muzîkjenan, heger rêya birêz Obama bi Chicago'yê bikeve, li taxa ewle Hyde Park'ê bi cih bibe û zarokên xwe li University of Lab School a bi navûdeng qeyd bike, bi temamî xwe bike karkerekî civakî, dîsa jî ji bo pêkanîna kariyera xwe ya polîtîk ewê di bajarê Amerîka'yê yê herî zêde de bi cudakariyê re rûbirû bimîne.**

Çend heb mominên kincê xweşik lê, li pêşiya dika sêqozî ya Dêra Saint Paul Side ya li ser kolana Wabash'ê, li tenişta numara 45'an a Kolana South Side ya Chicago'yê, wextê xwe derbas dikin. Kamyoneta tiştên cam difiroşe banga xwe ya hertimî dubare dike dema ku simorî hejik û kabloyan dikojin. Yek ji cihê herî bêhempa yê bajarê Amerîka'ya Bakur, her tişt dikanîbû baştir biçûya, heger dîmen, bi vî rengî ne heyvronî bûya. (1)

Şêniyên aliyên bajêr ên din, tu mafê xwe tune ye ku biçin hêla South Side'yê. Tenê di rêyên mezin re dikanin derbas bibin. Heger ew bixwazin xwe bavêjin nav teşqelan, bi taybetê ewê bi xwe bidin bawerkirin ku geto ne cihekî navê wê bi xerabî derketiye: ew warekî nîv-fermî ye. Bê dikan, bê dermanxane, ne otêl ne bank, ne otobusên şaredariyê û hema hema, ji aliyê sed hezaran jin û mêrên ku pirên wan betal, lê belê bi liv û tevgêr, hatiye dagirtin.

Ji hêla din a Kolana Wabash'ê, ev yekşema 2009'an, kargeha rêveberiya Association for the Advancement of Creative Musicians (AACM), di xaniyekî serobin ku bi kîremîtên sor hatiye lêkirin, civîna xwe li dar dixe. Bilûrvan Nicole Mitchel, daholvan Mike Reed, stranbêj Saalik Ziyad û kemanjen Tomeka Reid mîna rêveberiya komela dibistanê, percusyonîst Coco Elysses, ku ji qirnekî nû tên, zenguyê AACM'ê xistine dest xwe. Karê wan ê pêşîn, lidarxistina konseran e ji bo hemî şêniyên taxê û avakirina kargehên ku ev rêxistina muzîkjenan ji nîv sedsalekî bi vir de pêşniyaz dikin. Ne bendewar in ku gel were derê dibistana wan, lê belê ew diçin cem gel. Bêlebatî û payina li South Sid'ê, vekirina deriyê wê ji wê bi xwe û ji yên wekî din re, tekoşîna li dijî koçberkirina şêniyên afro-amerîkî, gengeşiyeke herdemî ye.

Çend saetan bi şûn de, ewê bi serekên xwe re, li ser dika Velvet Loungê, klûb û "salona civînan" ku ji aliyê yek ji endamên AACM'ê yê pêşîn ku bernaman bi azadî çêdike (beyî ku para xwe ya ji beşdaran tê, bistîne), saksofonîst Fred Anderson ve, hatiye kirêkirin. Îsev, panzde muzîkjenên koma muzîkê Great Blackê, beriya li muzîkê bixin, pişta xwe didin temaşevanan. Klarînetîst Mwata Bowden dor bi dor pesnê helbestvan, rapçêker, stranbêj û sazbendan dide, heta ku wan radike ezmanan.

Wek ku trombonîst û etnomuzîkolog (2) George Lewis dibêje, hema hema, hemî kesên ku AACM sala 1965'an ava kirine, ji malbateke xizan a çîna karker û reşik ku dehsalên pêşîn ên sedsala bîstan, (3) dema Koça Mezin li Midwest'ê bi cih bûne, tên. Ji bo van malbatan muzîk bi her hawê xwe, derveyî olê yan pîroz, gelêrî yan ezmûnî, roleke xwe ya perwerdekirinê hebû: li malan, li ser kolanan, li baran û li dêran, her kes yan lê guhdarî dike yan jî lê dixe. Li nava getoyên gelêrî muzîk, rêyeke karên civakî û sosyalîzasyoneke alternatîf jî ye.

AACM her tim bi himet tev geriya ji bo ku wernegere saziyeke yekreng yan hiyerarasîk û nekeve xizmeta metodên pluralîst û lêgerînê. Saksofonîst Douglas Ewart dibêje: "Komkomî, mezintirîn daxwaza me ye. Azweriya bi xwe û bi yên din re. Bicihanîn û hevkarî. Bi vê hêzê, her kes li gorî hawê xwe alî dike û bi alîkariya yên dinê xurt dibe." Perkusyonîst Kalîl El Zabar jî: "Hemû rastiya polîtîkayê, li ser sînorkirina azadiya kes û komikan, li ser bindestkirin û jihevxistina wan, ava dibe. Em nûnertiya rêçeke afirêner, parveker û berpirsiyariyê dikin. Bînin ber çavên xwe ku pergaleke polîtîk, kêfxweşiyeke gelekî mezin çêdike, tiştê ku em diafirînin..."

Dema salên 60'î, bi parçekirina getoyê gel, bobelateke xizaniyê ku bi hunera wan du qat dibû, hate serê muzîkjenên South Sida Chicago'yê ku şaxê endustriya tevaşevaniyê xist.. Lewis, ew dispart afirandina bêhawe ya kapîtalîst. Bi parvekirina kar re didan ber hev.

Bi avakirina AACM'ê sala 1965'an, hinek muzîkjenan biryar dan ku têkiliyên xwe yên komî li ser pratîka muzîka civakî xurttir bikin. Wan ji bo kontrolkirinê dest bêtir avêtin amûrên afirandin û ragihandinê. Mîna ku Anderson li Velvet Loungê ji bo xwe îfadekirin û danûstendinê muzîkeke xas afirand. Bi stratêjiyeke ku ji aliyê kesên bêderfet û bêpaye yên AACM'ê, ku hemî pişgiriya diravî red dikirin ve pêk dihat, bergeha çalakiyan li gelek qadan belav bû: Herêmî (Li Chicago û Midwest'ê, paşê li New York'ê bi vekirina şaxê dudan ê AACM'ê sala 1977'an). Netewî (li welatên rojava û jê bi wê de). El Zabar dibêje: "Bi ketina gelek dinyayan û bi danîna têkiliyên ser rastiyên din di yek demê de, me dest bi pêşxistina perspektîfên pirreng, hiskirina kulturan kir." Saksofonîst Ernest Khabeer Dawkings jî wisa dibêje: "Mesele hemî kontrol e. Lewma danûstendin û hevalbendî divê bên pirkirin ji bo pêkanîna çalakiya hunerî û aborî ku yekdestiya bazara diravî û serdestiya polîtîk a netewî çêdike."

Vê roja ku Barack Obama qedera welêt bi rê ve dibe, stratêjiyên xwe çi ne? Ewart bi qasî heyecanê pragmatîzmê jî destnîşan dike: "Vê dema ku bi wî derbas bûye, haya me ji sînorên Barack Obama û ji rastiya fikra azadiyê jî, heye. Û çi ji destê me bê emê bikin bi mebesta ku bigihîje armanca xwe ya herî dawîn wek çawa ku me ji dema çandiniya şitlan kir. Heger hewce bike bi spazma holy roller (4) û kokên hoodooyê." (5)

Bi ya muzîkjenan, heger rêya birêz Obama bi Chicago'yê bikeve, li taxa ewle Hyde Park'ê bi cih bibe û zarokên xwe li University of Lab School a bi navûdeng qeyd bike, bi temamî xwe bike karkerekî civakî, dîsa jî ji bo pêkanîna kariyera xwe ya polîtîk ewê di bajarê Amerîka'yê yê herî zêde de bi cudakariyê re rûbirû bimîne. (6) Saksofonîst David Boykin wisa rave dike: "Ji gelê reşik û bi taybetî ji muzîkjenên bi eslê xwe reşik re, dem nehatiye guhertin: em di binê qulikê de ne. Ji dema ku ewrûpiya dest bi baziganiya kolan kiriye û bi vir de, em di bin qeyraneke civakî û aborî de ne. Û çandiniya me ya gelekî bindest, bi qasî ku bûye kole ew qasî ji dike kole." ji bo alîkirina debara malbatê, bi karên xwe yên bingehîn re yan jî derveyî wan, pirrê muzîkjenan mejbûr in ku karekî din di ber re bike. Yan jî bi ketina nava Ewrûpayê re, mejbûr in ku karekî wan ji hal de dixe û ku ew qet dil nakin, dikin.

AACM di çalakiyên xwe de, herdem, berhem û kontekstên wan qebûl dikin: muzîk wek rêbaza danûstendinê û qîmeta bikaranînê. Wek ku John Shenoy Jackson bi bîr dixe, ji dema ku endamên vê saziyê xwe nêvî dane karê muzîka afirîner, nêvî ya hişyarkirina civakê, rêbaza wan nehatiye guhertin. Bi vî hawî, Dawkings di dema xwe ya dirêj a bicihbûna li taxa Englewoodê, ji qirnê nû komeke muzîkjenan ava kiriye. Bi pêkanîna danûstendineke berfireh bi lîseya Clichy-sous-Bois li taxên derveyî Parîs'ê û bi koma Zim Ngqawana ya bi komî dijîn, li taxên derveyî Johannesbourg'ê.

Bi vexwendina saziya Musiques de Nuit, El Zabar jî ev deh salek e di nava projeyên dibistan û konservaturarên Bordeaux û yên herêma Aquitan'ê de xebatê dimeşîne. Ew dibêje; "Bi saya çalakiyên zindîkirina taxê bû ku derfeta me çêbû em komeke muzîkjenan a South Sida Chicago'yê nedihate nasîn ava bikin û di qada Navnetewî de bidin naskirin." Li gorî El Zabar, dema ku şerrê kontrolkirina agahî û mejiyan sor dibe, muzîka afirîner dibe "çekeke mûcîzewî" ji bo hişmendiyeke rexnegir û vedîtinî.

Dema nêzîk li benda dibistanên xwe yên taybet, endamên AACM'ê, dest avêtin qada dibistanê. Mîna Nicole Mitchell li dibistana J. N. Thorp Elementary School'ê ya taxa ku ji şêniyên efrîkî û latînî. Hema li pişt dergehê û detektorên wanên hesinî, aleke dirêj û kesk, portreyê Barack Obama yê nîşane di histû de li ser û li derdorê, alavên muzîkê ku li ser ev nivîs heye: "Change has come!" guhertin pêk hat. Vaye piştî çend salekî, gerînendeyê saziyê biryar da ku dawî li cihêkirina şagirtên efrîkî-amerîkî û yên meksîkî bîne, ku wek ên berê hatibin û divê hînî zimanê spanî bibin. Bi baweriya ku ev tevdîr ne cezakirina zarokên wan e, lê

* Rojnamevan.



*The Jazz Singer, (Giel Meyers) - Efekt LMD kurdî*

belê dîsa jî ewê bi zarokên reşikan re ku ji malê xerabe dertên rûbirû bimînin, zarokên xwe ji dibistanê kişandin.

Li pêşberî çîneke bingehîn a dehsalan ku ji efrîkî û Amerîkîyan pêk tê, Nicole Mitchell bi dengdana tembûrîna xwe heta ku jê tê, dest bi stranên xwe yên ku bi guhdaran nas in, dike: “Heger hûn bala xwe baş bidin kesên ku derbas dibin, ku dil dikin li gorî kesên ku derbas dibin rêyekê bibînin, divê amûreke we hebe.” Dest radibin, deng pir dibin. Gotinên stranan giraniyê didin ser berpirsiyariyê, lê ders di hundurê muzîkê bi xwe de ye: bi sîstema bang û bersîvê, bi lihevhatina yekdengiyê, a pirdengiyê, sivikbûn û girnabûn, mirov guhdarî dike û difikire, bi beşdarî û parvekirinê.

Heman prosedur li dema ku muzîkjen derbasî studyoyê dibin jî di meriyetê de ye. Wek Mitchel yan lêder Hamid Drake, ku çend rojan piştî hev, her yekî ji bo bi bandrola ‘’Rogue’’ Art’ê diskên xwe qeyd bikin, çûn taxa Nord Sidê ku bi awayekî eşkere navê wê bi başî derketiye. Navekî nerasterast ku ji gotina ku Birêz George W. Bush pê heqaret kiriye “Rogue States” (welatê sûtikan) tê û derhinêr Michel Dorbon li wî vedigere: “Îroj hunereke marjînalbûyî, dêjênêrê di wateya ku sansura aborî dikare bi qasî ya polîtîk tesîrê lê bike heye. Her ku diçe, yekem pîvana başbûnê ya qebûlbûyî, aborî ye: ên ku baş tên firotin yan jî gelekî buha bin, ew ‘’pir hêja ne’’ li gel ku ên kêm tên firotin yan qet nayên firotin bi ‘gûman’ lê tê nerîn. Muzîka jazzê, ku xwe tu carî bi sîstemekê ve girênedaye, ku tu carî bi desthilatdariyekê re flort nekiriye, yek ji yên şoreşa hunerîpiranî bû, sedsala buhurî ku ji aliyê kesayetên ku ‘hew’ ji bona xwe îfade bikin bê ew kî ne, hatibû afirandin. Dîskên ku ji aliyê Rogue Art’ê hatine derxistin, wî tiştên ku bi rastî îroj di jazzê de hene diparêze. Ya ku cihê wê di derdorên veşirtî û conservator de tune, yan jî, wek pesindana imaja xweşbîniya desthilatdariyê nîne.”

Lêder, beriya ku dest bi pêşkêşkirina kapasîteya her endamê koma xwe bike, ne tenê tercume kirin lê belê agahdarkirin jî, dikane qalibekî mêlodîko-ritmique çêbike û li hev rast bike. Ew dikane pêşandana komposizyonekê bispêre pêkanîna kesayî, ya dukesî, ya hevbeşî, û rêçûna komî bide îspatkirin. Ew dikane demeke bi şûn de dewam bike, vê carê bi alîkariya endezyarê deng yan derhinêr tevî girtina qerarê, qeydkirina hin beşan cuda ji bo ku dawiya dawîn karekî hevbeş û tevlihev, ji nû ve biguherîne. Çi dike bila bike, muzîkjenê afirîner rûmeta kolektîvî ya kar nîşan dide. Ev afirandin û berpirsiyariya parvekirî, fesal û qaliban, ji tecrubeya muzîkê dizîvirînin tecrubeya civakî. Girêdayî dema çûyî, roja îroj û sibê.

**Werger ji fransî**
**Cemil Denli**

(1) Douglas Massey “regards sur Apartheida amerîkî” û Sudhir Venkatesh “dawiya bajarên çikolatayê, banliyên vanîlî yên amerîkî” ,Le Monde diplomatique Sibat 95 û Mijdar 2003.

(2) A Power Stronger Than Itself. The AACM and American Experimental Music, Presses universitaires de Chicago, 2008.

(3) Nicolas Lemann, The Promised Land: The Great Black Migration and How It Changed America, Vintage Books USA, 1992.

(4) Fidèles de l’Eglise penteconiste qui hurlait en se roulant par terre dans les lieux de culte.

(5) Ensembles de Croyances, coutumes et de paratiques importées d’Afrique.

(6) Serge Halimi, “L’université de Chicago, un petit coin de paradis bien protégé”, Le Monde Diplomatique Avril 1994.

# Emê hemû di 2100'an de nemir bin…

PHILIPPE RIVIÈRE*

*"Ez naxwazim bi xêra berhemên xwe bigihime nemiriyê. Ez dixwazim bi nemirinê bigihime nemiriyê."*
Woody Allen

Di havîna 2009'an de, çil şagirtên ku ji nav hezar û dused namzetan hatibûne hilbijartin, dest bi semînereke xerîb û kêmnas kirin: "University of Singularity" (SU). Neh heftiyên konferans û atelyeyan ku tê de kesayetên herî nadîde cih girtin, wekî Vinton Cerf ("bavê" înternetê), Robert Metcalfe (danerê protokola tora ethernetê), George Smoot (Xelatgirê Nobelê bo fîzîkê ya sala 2006'an), Astronot Dan Barry û komeke bisporên matematîkê, pizişkiyê û bisporên vekolînên fezayî.

Di bingeha boçûna wan de "qanûna Moore", navê danerê şirketa mîkroprosesoran a Intel'ê, heye. Bi ya vê qanûnê, hejmara transîstorên ku em dikarin li ser karteke elektronîk bi cih bikin, bi awayekî nizamî, her du salan du beramber zêdetir dibe, û ev yek bi bihayekî sabît pêk tê. Cextê li vê yekê dikin ku ev diyarde, ne tenê di elektronîkê de tê dîtin: Wisa diyar e ku hemû qadên zanistî xwedanê heman rîtma bilezbûnê ne, lê bi awayên hevterîb, ku her yek ji wan bi awayekî yên din xwedî dike (1). Kawdana teknolojîk, bi awayê lêkzêdebûnê ye: ji bo çespandina vê, kafî ye mirov li ser frîzekê [aliyê jorîn û xemldar ê dîwarekî] dîroka zimanî xêz bike, an jî ya mekanîkê, hetta bikeve pey şopên merheleyên mezin ên wererê [tekamûl; evolution].

Bi ya endezer Ray Kurzweilî, ku bi rexekê ve serkêşê vê bizava hizrê ye, encam bi xwe xwe dadisepîne: sed salên tên, nabin muqabilê "sedsaleke pêşketinên teknolojîk", lê belê wê bibin muadilê "bîst hezar salên kawdanê, bi hisaba asta kawdana îro." Ji bilezbûna daîmî, "heta dawiya salên 2020'an, kompûterin wê bizên (…) xwedanê şiyana derbaskirina testa Turing'ê, îşareta wê yekê ku ew kompûter nema wê ji mirovên bîyolojîk bêne cudakirin. (2)" Ji hingî û pê ve, "em –mirov– wê pir zekîtir bin gava ku em digel teknolojiya xwe dibin yek."

Di vê boçûna wêdeyî-mirovî de, dahatû hêviya mişetiya behre û kapasîteyên venedîtî. Ku ev jî bi rexê xwe ve wê rêyê li ber bilezbûneke nû ya teknolojiyê vekin, heta digihe xalekê –Singularity'ya [tekîtî] binavbang, bi S'ya mezin– ku "dê gerdûnê bixe nav goma zekayeke ji bineretên xwe yên biyolojîk û mêjiyê mirovî cudabûyî [û] wê made û enerjiyê di nav vê mija mêjiyî de tîr û têr bike." Hingî tu tiştê wê neşibe wan tiştên ku me heta niha zanîne. Herwekî ku Vernor Vingeyî, bisporê matematîkê û nivîskarê kitêbên zanist-fîksiyon û yek ji serkêşên pîroz ên Singularity'yê, dinivîsand: "Em têdikevine nav pergaleke ewqas cuda ji rabirdûya mirovî, ku em mirovên din lê ajal in (3)."

"Gelo şêtî ye? Belkî, dibêje Jean-Louis de Montesquiou li ser bloga Govara Books'ê. Lê belê, yên ku zana bi xwe nas kirine bi hêsanî qanih dibin. Bi taybetî yên ku ew li ser qada vîrtûel nas kirine: Lewre Ray Kurzweil hez ji "telebarkirin"ê dike di wan civînan de ku em dibînin hologramê wî [wêneyê sêrehendî] yê tewaw xapînok, li dora menzelekê li Sîngapûr'ê digere, û di heman demê de bersivê dide pirsan û hereket dike, lê belê laşê wî yê fîzîkî di wê navberê de her li California'yê dimîne. Pêşbîniyek, ku herwiha gelek pozîtîv e û bi awayekî pir balkêş hatî belavkirin, pir bi hêsanî dibê cihê baweriyê. (4)"

Ev bizava xwedanê gelek malperên înternetî, kariye ev bîst sal in meylên xwe yên herî tundrew –ji wan meylên tundrew, ekstropiyenan [extropians: pêşbîniyek e ku dibêje ku bi xêra zeka û teknolojiya mirovî, jiyan wê li sertaserê gerdûnê bi awayekî nizamî bê belavkirin], ku armanca wan bi xêra zêdebûneke daîmî ya zanyariyan çêtirkirina mirovî ye bi rêya şerrê li dijî entropiyê (xerabûn û paşketina her çi madeyeke rêkxistî)– û geeksên asayî, anku amatorên amrazên teknolojîk û zanistê, jî bigihîne hev.

Sosyolog û Rêveberê Enstîtûya Etîk û Teknolojiyên Taze James Hughes, kêfxweşiya xwe bi gotinên "êdî bizava wêdeyî-mirovî lobiyeke rasteqîne pêk aniye" derbirre (5). Dawiya 2009'an, bi kêmî çar fîlmên belgeyî dihatine duristkirin li dor van gotarên futurîst [rewta ku ji meylên îro bi rê dikeve û pêşbîniyan derbarê dahatûyê de dike].

Ji bo têketina nav halet-î ruhiyeya şagirtekî "Singularity U"yê –bêyî ku hevbîr û pabend bin digel "prensîbên ekstropiyen"– fêleke biçûk a retorîk bes e. Çima, mîna ku Neteweyên Yekgirtî dike, bi feryad û nûzenûz rabigihînin ku divê heta 2015'an, rêjeya xelkê ku rojane bi kêmtir ji dolarekê dijîn, nîvenîv bê daxistin (Yekemîn armanca wan ji bo geşedanê?) Çêtir e ji dêvla wê, di roja pêşwaziya şagirtên taze de, vê mijara hizrî bixine nav munaqeşeyan: "Divê hûn milyareke mirovan xwedî bikin li ser dinyayê. Hûn wê çawa bi vê mesûliyetê rabin?" Kerem kin! Hizreke pozîtîf, avaker û pragmatîk. Bi rastî, bo bêhnekê bifikirin: xurek çi ye, heke ew madeya organîk nebe ku bi şiklekê tê ber me ku em dikarin bimehînin [hezm bikin]? Her ew bes e ku wê makîneyê dabihênin ku dê, bi rêya nano-robotan, xurekan ji herriyê an jî ji kevzên deryayî durist bike. Kêşe çareser bû, meseleya din!

Bi ya Peter Diamandis ê avakerê SU'yê, teknolojî ne tenê dikare birsê ji nav bibe, belkî dikare hemû bela û karesatên mirovatiyê çareser bike (6). Wiha ye îmana hejmareke mezin a van mirovên ku di bûteya Scillon Valle'yê [Newala Scillonê] de mêjiyê xwe şûştine, û hejmareke şirket an jî enstîtûyên vekolînan ên li lûtkeya teknolojiyê bi rê ve dibin.

Yên herî pîr, zarokên baby boomê, cextê li aciliyeta "berxwedana" fîzîkî dikin heta wê çaxa ku em wê bizanin wan "nano-robotan" durist bikin ku wê bi derziyan li laşê mirovî bêne barkirin… û wê nehêlin hucreyên me bimirin. Ji ber vê hindê ye ku gelek bal û girîngiyê didine ser xurek û şertên fîzîkî. Jixwe Kurzweil di kitêba xwe de li xwe mikur tê ku "rojê dused û pênceh hebên teqwiyeya xurekî dixwe û heftiyê ji şeşan zêdetir entravenozan digire." Dirêjkirina maweya jiyanê di nav bernameya SU'yê de cihekî girîng digire; di vê bareyê de SU konferansekê li ser "dawî li pîriyê" bi rêk dixe ku armanca nihayî jê "nemiriya biyolojîk" e.

Di atelyeyekê de li navenda vekolînan a IBM'ê li Almaden'ê, şagirt ihtimalên cihê yên çareserkirina qeyrana enerjiyê dixine jêr pirsiyaran: Rûxandina çiyayan ji bo derxistina enerjiya madeyê; avakirina lewheyên rojî yên nanoteknolojîk li ruwangeyê; an jî, bi rengekî kêmtir afirîner, danîna sîstemekê ku tê de dabînkerên elektrîkê wê bikarin ji dûr ve klîmatîzasyona ofîsên şirketan û karxaneyan rawestînin gava ku wan pêdivî bi enerjiyeke zêdeyî hebe…

Ew diçine serdana karxaneyên ku kevz û bakteriyan digihînin ji bo duristkirina nefta biyolojîk [biokerosene]. Taştêya xwe digel sermaye-rîskkeran dixwin. Berî ku Lego™'yên herî dawî derketî li piyaseyê bêne belavkirin, ew pê dileyîzin. Lê belê, -rojekê- li senaryoyên herî xeternak jî difikirin: robotên pir zekî biryarê digirin ku mirovatiyê ji nav bibin; ezmûneke biyolojîk ji kontrolê derdikeve û xwe li dinyayê dipêçe…

Namilkeya hizrên têkel a netîceya wan danişînan, ku carinan xul û tem e lê hergav têra xwe têkder û aloz e, bi pirsên xwe yên pûç heta digihe meseleyên herî bingehî, xwedanê wî kenesteyî ye ku serê vê koma elîtan –ku ne ya Davos'ê ye- tevlihev bike. Hişmendiya ku serkêşên hemû teknolojiyan in, wan digihîne hev. Li pêş çavên wan, tu rastiyeke din bi qasî vê yekê girîng nîne. Endezerê brîtanyayî Simon Daniel, ku wekî şagirt beşdariyê di SU 2009'an de dike, wiha behs dike di rêzegotareke di Financial Times de: "Hizreke bingehî û nerastewxo ya vê dewra perwerdeyê ew e ku her tişt pêkan e:heke hûn bikarin wê bisêwirin, sermayerîskkerek wê wê fînanse bike, û bilezbûna teknolojiyê dike ku ew projeya we gelek ji wan tiştên ku pêkan diyar in zûtir pêk bihê."

Reng e divê hêj sed salên din bijîn da ku bibînin ka ev bernameya xeyalperest û seyr heta çi dereceyekê wê bibe rastî. Lê belê, nivîskar ne tenê xeyalperestên nazik ên meraqdarên zanist-fîksiyonê ne. Ev yekem dewra Zankoya Singularity U'yê li binkeyên NASA'yê bi rê ve diçe. Di nav milyaketên wê yên parêzer de Larry Page jî heye, ku berî yazdeh salan armanca "rêkxistin û serûberkirina hemû zanyariya cîhanê" dabû ber xwe û ku Google ava kir.

**Wergera ji fransî**
**Ergîn Opengîn**

* Rojnamevan.

(1) Bixwînin, Mateo Cueva, "Dema pirîsk, atom, noyron û gen dikin BANG", Le Monde diplomatique, octobre 2009 [Le Monde Diplomatique kurdî, Çile 2010].

(2) Jêwergiranên ji Ray Kurzweilî ji wê kitêba wî hatine wergirtin: Humanité 2.0. La bible du changement, M21 Editions, Paris, 2007.

(3) Vernor Vinge, "What is The Singularity?", gotara li NASA'yê hatî pêşkêşkirin, adar 1993, ji Ray Kurzweil hatiye wergirtin: http://mindstalk.net/vinge/vinge-sing.html

(4) Jean-Louis de Montesquiou, "Ray Kurzweil: serons-nous tous bientôt immortels?", 27 Cotmeh 2009 ; http://www.booksmag.fr/opinions/b/raykurzweil-serons-nous-tous-bientot-immortels.html

(5) Elena Sender, "Vivre 1000 ans, le transhumanisme y croit", Sciences et avenir, Paris, Hezîran 2006.

(6) Bixwînin raporta David Gelles, "A crash course in emerging technologies", Financial Times, London, 24 Nîsan 2009.

ÎSLAM

# Gelo Îslam berferehbûnparêz e?

PATRICK HAENNI & SAMI AMGHAR*

Pirsek li serê Ewrûpa'yê digere: Gelo Îslam di cewherê xwe de berferehbûnparêz û fetihkar e? Li Swîsre'yê pêşengên dengdana li dijî lêkirina minareyan bi dengekî bilind dibêjin erê, û xwe disipêrin rexneyeke nû ya heyî ya li Îslam'ê (2). Bi gotinan, ev berferehbûnparêzî xwe disipêre daxwazeke hegemoniyeke siyasî ku li xwezaya "îdeolojiya îslamî" (daxwaza zarokanînê dike - natalîst, hewl dide mirovên din bîne ser dînê xwe – proselît û berferehbûnparêz) tê barkirin, weke stratejiya hin aktorên wê ("îslamî" û "projeyên wan"(3)). Yûsif El-Qeredawî, şêxê sunî yê herî navdar ê nerm, weha xuya dike ku maf dide wan, dema di bernameya xwe ya di televîzyona El-Cezîre'yê de ya bi navê "Şerîet û Jiyan" ya roja 6'ê Kanûna 2009'an li ser referandûma Swîsre'yê got; ''fetih wê pêk were û benî-adem wê li dora peyva xwedê bibin yek.''

Lêpirsînên Îslam'ê jî ji aliyê xwe ve mafdar in: piştî her tiştî - weke xirîstiyaniyê – xwe ji bo selameta mirovatiyê hemûyî ragihandiye û peyama 'xeleka dawî ya dîroka pêxemberan e' dide. Baş e di esasê xwe de çi eşkere berferehbûnparêziyeke dînî nîşan dide? Bi awireke civaknasiyê ew yan xwe disipêre rêbazeke mîlîtan (siyaseta propagandîst û eskerî) yan pêşketina dîndariyê (vejîn yan jî guhertina dîn) yan jî.

Yên ku li Ewrûpa'yê projeyeke siyasî bi rê ve dibin Birayên Misilman û rêxistina tirk Milli Görüş (4) in. Ne bi tenê xwediyê fikrekî gerdûnî (Îslam, dînekî ji bo her kesî, temsîl dike) ye, armanca wê ye ku serwer be (armanca "pêşengiya dinyayê" ku damezrênerê Birayên Misilman Hesen El-Bena gotî), daxwaza wan damezrandina "dewleteke îslamî" ye. Tevî vê jî, wan ne ji ber vê yekê weke penaberan xwe avêt bextê Ewrûpa'yê di salên 1950'î de. Di çarçoveya şerê xwe yê li Bakurê Efrîka û Rojhilata Nêzîk de wan Ewrûpa bêhtir weke pişta bereyê, starekê bi kar anî û bicihbûna civakên misilman a mayînde li vê parzemînê, ew hem matmayî hiştin û hem jî pirsgirêk ji wan re çêkir.

Rastiya hindikahîbûyîna li Ewrûpa'yê dike ku tevahiya perspektîfên stratejîk ên çalakgerên îslama siyasî nîvçê bibin û ev yek wan di nava dîlemayekê de asê dike: waezan bidin yan lobiyê bikin? Ya pêşî hat hilbijartin peydekirina cihekî bû li ser erdên ku ji mêj ve di bin bandora selefîstan yan jî rêxistina Teblîx (5) de ne, tevgerên ku siyasetzan Olivier Roy (6) weke "neo-fûndamentalîst" nav li wan kirî. Ya diduyan rûbirûbûna bi zehmetiya peydekirina hejmareke têra xwe ya partîzanan di çarçoveya ewrûpî de; bi ser de jî, zor li wan tê kirin ku xwe gelekî biguherin, zirara vê li wan jî ew e ku bandora xwe di qonaxeke herêmî de bi sînor bikin û dike ku gumana lihevkirineke bi desthilatdariyê re peyde bibe.

Rewşa Birayên Misilman vê yekê baş nîşan dide: Ji ber ku bi 'karta' saziyan lîstin, bi demê re pêngava wan a şoreşgerî ji destê wan çû, dev ji dozên mezin berdan, xwe dûrî mijarên nazik û siyaseta di ser wan re kirin – weke mînak li Fransa'yê mijara sergirtinê yan jî Filistîn'ê; û rastî rexneyên misilmanên ciwan tên ku carinan ewqasî pêde diçin ku ji ber "welatîbûna (burjuwazbûna)" wan yan jî ji ber ku bi rayedaran re lihevirine, piştgiriyê hew bidin wan. Tariq Remezan bi xwe ji aliyê hin partîzanên xwe yên berê ve hatibû redkirin, dema wî sala 2005'an qebûl kir bikeve nav komeke xebatê ya ku wezîfeya wê ew bû ji bo hikûmeta brîtanî ya Anthony Blair, li ser navgînên tinekirina radîkaliya dînî bihizire.

Ji bo giregirê îslama siyasî pêşxistina stratejiyeke bawerîyê dide, li Rojava zehmet e. Yên ku ji vê yekê sûdê werdigrin jî tevgerên neo-fûndamentalîst (radîkalên nû) in ku ji aliyê xwe ve angajmanên siyasî yên klasîk red dikin. Di nava mijê de ku van tevgeran pêktîne, selefîzma wehabî ya zanistî (selefiya ilmiyya) ya li Erebîstan Suûdî peyde bûyî, derdikeve pêş. Xisletên wê hişkbûneke terîqetparêz û radîkalîzmeke dogmatîk (qalibî) in. Belê ev jî ji her fikra cîhadê ango şerê pîroz qut e. Ev selefîzm li gelek hêviyên liberavêçûyî yên îslamtiya siyasî yan jî komên neo-fûndamentalîst yên ji mêj ve li parzemîna Ewrûpa'yê bicihbûyî, yên mîna Teblîx, vegeriya. Lê dîsa jî ji rewşa dawî ya pêşniyarkirina bernameyeke armanca wê hegemoniya siyasî ye, dûr e. Ew mêweyeke tahl a îslameke ji siyasîbûnê dûrketî ye û nîqaşeke îdeolojîk a pesnê helwesteke xwepaşvekişandinê û xwedûrgirtina ji pêwendiyên bi civakên rojavayî re dide: civaka baweriyê, cihê civaka çandî (weke tunisî, fasî û hwd.) digire û gelekî rexnegir e li hemberî îslama "rêûresmê" ya malbatan. Bi vî awayî selefîzm xwe weke terîqetekê bi rêxistin dike. Der barê pirsa sergirtinê de dengê xwe nake, dema melayên wan ji welatekî dikin der, partîzanên wan ti çalakiya piştgiriyê organîze nakin û beşdarî xwepêşandanên piştgiriya filistîniyan jî nabin.

Ev xwepaşvekişandina hatî erêkirin, li gorî di nava malbatê û derdora civakî de di nava komên ciwanan ên ji nû ve hatin îslamîzekirin ku weke "komên hatî xilaskirin" (firqa naciyya) bêhtir pêk tê. Bi rexneyên li malbatê tên girtin û redkirina melayên li gorî rêûresmê, selefîst di nava cîhana îslama heyî de xwe li aliyê muxalefetê datînin û di nava ferdên ku bi qetîn û qutbûnê re rûbirû ne û bi taybetî nava ciwanan de bi ser dikevin. Ango ew bêhtir partîzanên xwe ji devera ku hevgirtina civakî xurt e, weke di nav kameriyan (komorî jî tê gotin) û tirkan de, peyde dikin.

Îdeala wê ne fetihkirina Rojava'ye, ne jî avakirina getoyên îslamîkirî ye. Îdeala wê hîcret e ango vegera ber bi erdên Îslam'ê ve ye – yan jî di rewşa herî xirab de ber bi welatên ku wer xuya dikin ku herî zêde misilmanan qebûl dikin yên mîna Kraliyetên Yekbûyî yan jî Kanadayê ve. Ciwanên ji hindikahiyan ên ku selefîzmê ew kirine yên xwe, di heman rewşa libendêmanê ya pasîfkirinê de xwe dibînin. Li gorî angajmana mumkin a di civakên rojavayî de ya nifşê dê û bavên wan, ev pasîfbûn nisbî ye. Tevî ku ev di nava xewna vegera ser erdên koka xwe jiyabin jî, yên li welatên wan, bêhtir dixwestin ji welatên lê ji dayikbûyî veqetin...

Bi rengê têgîn çêkirina projeyeke siyasî ya bawerî pê were, ku kontekta hindikahîbûnê û dînamîkên mîsyoneriyê ew asê kiriye, daye ser şopa veqetîneke terîqetî û ne li ser hîmekî rêveçûna "ji nû ve fetihkirina îslamî" ne, ji çalakbûna cîhadê ya bi sîlehan wêdetir nînin. Lewra li Ewrûpa'yê cîhadparêzî xwe weke komeke fedakariyan dibîne û ne weke siyaseta bi navgînên din. Ev komên mîlîtan (El-Qaîde yan jî tevgera Metin Kaplan (7)) bi komên ne şervan ên selefîst re xwediyê heman fikra terîqetparêz in. Cîhadparêziya bi tekfîrê – gunehbariya bêbawerîbûnê – dijberên xwe hemûyan yên ku li bendê ye şerên wan bike, dîskalifiye dike: cihû, xirîstiyan, misilmanên ne li gorî serê wan û ... Birayên Misilman in. Ango ew naxwazin li Rojava çandeke hember a getoyê ava bikin. Berovajî vê, radîkalîzma wê, dike ku ew ji civakê û taxê qut bibe (8). Ew di heman demê de ji mizgeftê jî qut dibin; mizgeft bi hêsanî dikare ji aliyê rêxistinên îstîxbaratê ve were kontrolkirin û ji ber lihevkirinê tê rûreşkirin, lewra mizgeft bivê nevê cihekî muzakereya bi civaka li derdorê re ye. Ango cîhadîst zilaman li deverên din ji bo xwe peyde dikin: Di înternet kafeyan (cybercafé) de li klûbên sporê û dema di girtîgehan re derbas dibin.

Di vê navberê de weke ku heta bi hestiyên wan sêhrek pifî wan kiribin, cîhadparêzên nû êdî hew mirov dikare wan azad bike. Armanceke zelal nadeynin ber xwe (weke erd yan jî dewleta lê razemeniyan bikin, têkiliyên hêzên siyasî biguherin, şerkirina rejîmekê), belê liberrabûneke çekdarî û bandora wê ya di çapemeniyê de û her weha tinekirina nîşanên emperyalîzma siyasî (ango hêza amerîkî yan jî hevgirên wê) datînin ber xwe.

Eger dînamîka mîlîtan a îslamiyan êdî têra fetihkirinê nake, bi riya "girseya li jêr" di seranserê dîndariyeke jinûve, gelo dikarin giraniya xwe bidin ser mêzînên siyasî yên civakên ewrûpî, yan jî qet nebe di nava wan de neqebên hatin îslamîkirin biafirînin? Em gelek caran Îslama li Rojava herî zêde darî çav e û vegereke mezin a li dîndariyê di nava civaka misilman de tevlîhev dikin: Ji bîstsalekî û vir ve pêkanîna pratîk a dînî a li wir asê dibe, û heta hindikî paş ve diçe (9). Jinûve darîçavbûna wê pêşî di ser ferd re tê birêvebirin û ne di ser projeyeke kolektîf (tevî ku ji daxwazeke hevgirtina civakî jî tê) re. Ew beriya her tiştî daxwaza ji nû ve peydekirina kokên xwe yên "nasnameyî" ye.

Du tevgerên mezin di jinûvebidestxina dîndariyê de ji hev cihê dibin. Li aliyekî "Îslama bazarê (10)", dîndariyeke ji dildariyên îslamiyan a ji siyasetê re hatî şûştin û kombûna "normalbûneke" çandî ya nasnameya mislmanan nîşana wê ye. Îslamiyên Streetwear (11), modeya sergirtinê, popa helal û Muslim Up (markeyeke fransawî ya vexwarineke ji kolayê) berdevkiya Îslameke xwe disipêre çanda girseyî dikin. Dîn çareseriyeke bi tevahî nîne, belê di nava çanda rojavayî de bi awayekî global weke mitale û fikareke exlaqî tê qebûlkirin.

Li aliyê din neo-fûndamentalîstên ku me dît çawa xwe ji nîzama rojavayî qut dikin, armancên wan ên berferehbûnê nînin, lewra ew li benda hîcretê ne. Em behsa mijara anîna ser dînê xwe bikin; belê ev diqewime, lê hejmara kesên dîn diguherun gelekî sînorkirî ye û bi her du aliyan ve jî diqewime, tevî ku mêzîn bêhtir ber bi aliyê Îslam'ê ve giraniyê datîne jî: Li gorî daneyên wezareta karê hundur li Fransa'yê salê li derdora heştsed misilmanî dibine xirîstiyan, para bêhtir jî dibin protestan, li hemberî vê çar

** Lêkolînêr e li Fondation Religioscopê (1), tevî Stéphane Lathion hevnivîskarê pirtûka de Les Minarets de la discorde. Eclairage sur un débat suisse et européen (Minareyên lihevnekirinê. Rohnîkirina nîqaşeke swîsreyî û ewrûpî), Paris, 2009.*



*Rebwar Saeed, (Acrylic on wood)*

hezar mirov jî dînê xwe diguherin û dibin misilman(12). Vegera li dîn darîçav weke ku misoger be xuya dike. Bi taybetî jî di xuyakirina fîzîkî û cilûbergên kesên îman jinûve peydekirî (born again – ji nû ve ji dayikbûn) û kesên misilmanbûyî de xwe dide der – rîh ji bo mêran û qamis, xwe bi tevahî nixumandin ji bo jinan.... Lê belê çarçoveyek ji bo vê kêm hatiye danîn (însiyatîfa vê yekê ya ferdan e û kêm di angajmana rêxistinî re derbas dibe û projeyê wê yên stratejîk nînin). Ev dîndariya nû hem gelekî di raya giştî de derkive pêş û hem jî kêm siyasî ye. Ji bo welatên xwe disipêrin laîktiyeke bihêz yên mîna Fransa'yê pirsgirêkeke îdeolojîk e, dîsa jî em zelal bi nav bikin ew ne tehlûkeya siyasî heta ya ewlekariyê ye – helbet ji bilî cîhadparêzan.

Her weha xwe ji xewna nîqaşa li ser getoyan qutkiriye – li gorî vê nîqaşê ewqas warên dor li wan girtî yên misilman wê hebin, ên ku amade ne serweriya çalakgerên îslamîst qebûl bikin û bi vî awayî projeyeke qutbûna kolektîf ji civakê tê bihêzkirin. Tevî ku kombûna şêniyên misilman li hin taxan dikare weke ku kontroleke civakî mumkin be, xuya bike jî, ev yek li gorî stratejiyeke siyasî ya di civakeke ji dora xwe qutbûyî de, nîne. Lê belê dişibe encamên pêvajoyên civakî, aborî û siyasî yên tevlîhev yên weke ... helwesta desthilatdariyê – ne bi tenê li welatên îdeolojiya 'civakên xwe ji dora xwe qut dikin' lê heyî (yên weke Hollanda û Qraliyetên Yekbûyî) her weha tevî nîqaşên wê yên li ser laîktiyê li Fransa'yê jî. Hewldanên bidestxistina "dengên misilmanan", belavkirina xaniyên civakî carinan li gorî pîvanên etnîk, lêgerîna navbênkarên "ji nava civaka xwe li derve girtî" ji bo ku "ji heqî banliyoyan derkevin" û daxwaza ji jor ve kontrolkirina Îslam'ê – Konseya Fransawî ya kulta misilman (CFCM) sala 2003'an hat damezrandin û dewletê xwe dabû bin çengê wê – dibe sedema peydebûna helwestên peydekirina 'civakeke ji dora xwe qutbûyî'.

Li aliyê din Birayên Misilman xwe disipêrin çînê navîn, bandora li keviyên bajaran nekirine – bêtesîriya bi tevahî ya fetwaya banga aramiyê ya Yekîtiya Rêxistinên Îslamî yên Fransa'yê (UOIF) di dema nerazîbûnên girseyî yên 2005'an de ev yek careke din raxiste ber çavan. Eger selefîst hebin jî ew jî keviyên bajaran kontrol nakin. Sedema pêşî ew e ku bandora wan sînordarkirî ye; paşê jî ji ber ku ti tecrûbeya wan a rêxistinkirina tevgereke civakî a xurt çênebûye ku destûrê bide wan vî rolî pêk bînin; herî dawî jî ji ber ku armanca wan weke me dît, ne avakirina cihên di nava bajaran de hatin îslamîkirin e yan jî serhildêrî ye, armanca wan vegera ser erda Dar el-Îslam (Xaka Îslam'ê) e.



*Rebwar Saeed, (Acrylic on wood)*

Li taxên ku piraniya şêniyên wan misilman in îro bi awayekî harîqulade û xwegirtî, paralelî berxwuriyê nirxên îndîvîdualîst jî xwe didin der. Em şahidiya zêdebûna zewacên tevlîhev (13) dikin, di navê de zewacên jinên koçber jî hene. Em her weha şahidiya zehmetiya jiyana komeleyî ya dînî, lawaziya otorîteya dêwbavan û hejmara gelekî kêm a dibistanên dînî jî dikin – em li vir behsa binketina zêde a dengvedayî ya çend lîsteyên 'civakên xwe li dora xwe girtî' nakin, van hewl dabû ku xwe di dema hilbijartinên herêmî de ava bikin.

Bi awayekî nakok beriya bîst salan "taxên misilman" nebûn, vegera li dîn hê li gorî daxwazê û bi awayekî dildar û çarçoveya wê diyarkirî pêk dihat; îro derdoreke misilman tevî pîvanên xwe yên civakî û pratîkên xwe – weke rojiya meha Remezan'ê – tevî pirtûkxane, mizgeftû dikanên xwe yên malên helal, li ser hîmekî ferdî bi kêrî ji nû ve îslambûnê tê, di nava van de koçberên destpêkê jî hene.

Çarçoveya ewrûpî yan jî em zelaltir bi nav bikin rewşa hindikahî ya îslamîzma li Ewrûpayê, zehmetiya 'hizirîna li gorî bernameyekê anînaziman a dîn û siyasetê', di çarçoveya modernîteyeke ji dewleta netewe û demokrasiya ku nikare jê xilas bibe pêk tê, eşkere dide der. Di nava derdorên îslamî de yên ku destûra wan heye tevlî nav lîstika siyasetê bibin, cihê ku meyila daxwaza ji hevcihêkirina daawa (doz) û siyasetê – û ya xwe dide der; li ber jênehatîbûna wan a binavkirina projeyeke lihevkirî, şêwazên din ên neo-fûndamentalîzmê yên ku weke selefîzmê li "dînê safî û pak" digerin, ji qewlê Roy ve, siyasetê dişînin mekanên dûr yên xewnên hezarsalan.

Yên ku di nava stratejiyeke xwe bi raya giştî daneqebûlkirinê de bi cih dikin, berovajî yên din, paşeroja xwe di nava "siyaseta safî" de dibînin; bi gotina Yamîn Makrî, rêveberê berê yê yekîtiya misilmanên ciwan: Hin bira weke milîtan dikevin nav partiyên siyasî yên klasîk, hem di partiyên çepgir hem jî di yên rastgir de; û bi bahaneya mafên ji bo yên ji koka koçberiyê tên, xwe kom dikin, vê jî li ser hîmê nasnameya çandî ya hatî laîkkirin, dikin ("xwecihên komarê" yên salên 2000'î, li gorî Birayên Misilman yên salên 1990'î)...

Ew çi dibe bila be, rayên wê yên cur bi cur ên qutbûna di navbera dîn û siyasetê de, ya weke heyî tê qebûlkirin, bêşert qebûl dikin ku fikrê fetihê xewn e. Ango zêde girîng nîne mirov zanibe ka gelo meyilên berfebûnê hene. Ya esas ew e ku mirov nepêkaniya wan bi riya veguherînên sosyolojîk derêxe holê.

**Werger ji fransî**
**Lokman Turgut**

(1) Jêrenota wergêr: Fondation Religioscope, weqfeke li ser dînên heyî ye ku sala 2002'an li bajarê Swîsre'yê Fribourg'ê hatiye damezrandin.

(2) Li ser vê mijarê bixwînê: Olivier Moos, Du minaret à la question musulmane: La nouvelle critique de l'islam (ji minreyan heta bi pirsgirêka misilmanan: Rexneya Nû ya li Îslam'ê), in Haenni, Patrick û Lathion, Stéphane; Les Minarets de la discorde. Eclairage sur un débat suisse et européen (Minareyên lihevnekirinê. Rohnîkirina nîqaşeke swîsreyî û ewrûpî), 2009), Paris, 2009.

(3) Bixwîne Sylvain Besson, La Conquête de l'Occident. Le projet secret des islamistes (Fetihkirine Rojava. Projeyên bi Dizî yên Îslamîstan), Paris, 2005.

(4) Di salên 1970'î de ji aliyê Necmettin Erbakan, serokwezîrekî berê yê Tirkiye'yê ve hat damezrandin. Vê rêxistinê di nav civaka tirk a li Ewrûpa'yê şaxên xwe baş berdana.

(5) Selefîzm reformîzmeke heyî ye ku di sedsala XIX'an de xwe da der û xwe disipêre agahdariyên pêxember Muhemed û nifşê pêşî yê misilmanan – jixwe navê tevgerê jî ji vir tê, lewra navê pêşiyan bi erebî selef e. Bixwîne; Wendy Kristianasen, Qu'est-ce que le salafisme? (Selefîzm çi ye?), Le Monde diplomatique, Sibat 2008. Teblîx rêxistineke ku salên 1920'an li Hindistan'ê hat damezrandin, pesnê dinyayê dide û weke armanca xwe ya sereke jî hilbijartiye ku peyama Îslam'ê bide dinyayê.

(6) Rêveberê lêkolînê li Navenda Neteweyî ya Lêkolîna Zanistî (CNRS) û rêveberê lêkolînan li Dibistana Lêkolînên Bilind a Zanistên Civakî (EHESS); berhema wî ya dawî ya hatî çapkirin: La sainte ignorance (Nezanîna pîroz), Paris, 2008.

(7) Tevgera radîkal sala 1984'an li Almanya'yê hat damezrandin û tevlî nav gelek çalakiyên terorîstî bû.

(8) Binêre li Olivier Roy, L'Islam mondialisé (Îslama Gerdûnîbûyî), Paris, 2002.

(9) http://religion.info/french/articles/article_442.shtml

(10) Patrick Haenni, L'Islam de marché, l'autre révolution conservatrice (Îslama Bazarê, Şoreşa Din a Kevneparêz), Paris, 2005.

(11) Modeya cil û bergan a ku ji kuçe û kolanan tê û şalên jeans, pêlavên spor û nîşanên dînî yên mîna turbanê tîne cem hev.

(12) Bixwîne: Linda Caille et Marie Caleb, France: Qui sont les musulmans convertis au christianisme? (Fransa: Misilmanên xirîstiyanbûyî kî ne?), Religioscope, Fribourg, 28'ê Hezîrana 2005'an, http://religion.info/french/articles/article_181.shtml

(13) Emmanuel Todd di Le Destin des immigrés (çarenûsa koçberan) de nîşan dide ku rêjeya zewacên jinên Cezayîrî bi kesên ne ji welatê wan û ne misilman re ji sala 1970'î heta sala 1990'î ji sedî 6,2'ê gihiştiye ji sedî 27,5'ê. Ji bo jinên fasî ev rêje ji sedî 4'an gihiştiye ji sedî 13'an.

# Mexreb timî ne li ser dika dinyayê ye

FRANCIS GHILES*

Kesên serdana paytexta herêma Rojhilata Fas'ê (çend kîlometreyan dûrî Ûcda) dikin, bi rewşeke sosret û sosirmet re rûbirû dibin: Riya ber bi Cezayîr'ê ve ji aliyê maşînên kar û xebatê ve hatiye girtin, çend karmendên ewlekariyê ji xwe re digerin û aramiyeke ecêb li ser vî cihî heye ku diviyabû devereke têrederbasbûnê ya di navbera du welatên herî mezin ên Bakurê Efrîka'yê de bûya û ji ber çûnûhatina zêde ya maşîneyan xitimîbûya. Ev bêdengî ya rastî wêneyê lihevnekirina di navbera Fas û Cezayîr'ê de dide der. Ev lihevnekirin biqasî temenê nifşekî ye dewam dike. Tevî vê jî, li Başûr, li Fîguig'ê leşkerên cezayîrî ji sînor dibihurin da ku qahweyekê li qraltiya Fas'ê vexwin, xelkê Fas'ê jî diçin serdana dotmam û pismamên xwe yên komarparêz û ti kes jî ji van çûnûhatinên malbatî re gotinekê nabêje.

"Zirara Yeknebûna Mexreb'ê" li gorî dabeşkirinê cihê, dikare kêm bibe: Enerjî, banka, veguhestina mêl û mirovan, berhemên çandiniyê yên xwarinê, perwerde, çand û tûrîzm. Bazirganiya di navbera welatên Efrîka'yê de bi tenê ji sedî 1.3'ê danûstendina wan a bi derve re ye; ev rêjeya herêmî ya herî kêm ya dinyayê ye. Du konferansên bi navê "Zirara Yeknebûna Mexreb'ê li pilingê Bakurê Efrîka (1)" û raporeke Înstîtuya Peterson'ê (2) bi awayekî berfereh li ber çavan radixe, eger li Efrîka Bakur sînor vekiribûn çiqasî kar û fêdeya wan jê heye. Dema ku em rêveberên şîrketên mexrebî tînin cem hev, piraniya wan daxwaza hêzeke karibe parçebûnên neteweyî ji holê rake, tînin ziman.

Hem xizan û hem dewlemend, berdêla jênehatina elîtê ya pêşxistina projeyeke hevpar, didin. Tevî ku ji 1945'an û vir ve dinyayê şahidî li serûbinîhevbûnên berê nehatî dîtin kir jî Mexreb li ser dikê nebû. Welatên herêmê qet nebe li ser cihê wan ê di Pêvajoya Barcelona'yê (3) de pêşniyar ji Yekîtiya Ewrûpa'yê re kirin. Gelo ew ê berambertî "Pêvajoya Barcelona'yê: Ji Bo Derya Spî Yekîtî" çalaktir bin? Mafê me heye em gumanan jê bikin (4).

Li Mexreb'ê gelek çavkanî hene: petrol, gaza xwezayî, heta mirov bêje bes fosfat, hilberandineke çandiniyê ya pircûre û bi piranî bi kalîte – lê her diçe bêhtir dexl lê kêm dibe – welatên harîqulade ku her sal bi milyonan tûrîstên biyanî ber bi xwe ve dikişînin. Serjimara wê ya ku ciwan e, ji serxwebûna xwe û vir ve asta wê ya perwerdeyê gelekî bilind bûye. Veguherîna demografîk misoger e, dîsa jî bi milyonan ciwan hê jî li bazara kar zêde dibin – ji sedî 50'ê wan ji niha ve bêkar in. Ji bo çareskirina vê herikîna her diçe xurttir dibe, rîtmeke mezinbûna aborî ya ku ji ya Çîn'ê jî bêhtir e, du dehsalan wê pêwîst bibûya. Di rohniya van rastiyan de girtina sînoran dibe sedema kêmbûna du puwanan di mezinbûna aboriyê de, ev pirsgirêkeke zehmet e ku divê were çareserkirin.

Her sal bi hezaran mirov di Derya Spî de dixeniqin, xewna wan jî ew e ku li Ewrûpa'yê karibin kar bikin; mirovên xwedî dîplome ji welatên xwe vediqetin – carinan nîvê mezûnên dibistaneke muhendisiyê – lewra li welatên xwe kêm cihê kar peyde dikin. Li van welatan olîgarşî para bêhtir karên baş ji bo zarokên xwe vediqetînin, wan digirin destê xwe. Her sal 8 milyar dolar sermayeya taybet ji herêmê direve û xwe li stoka li gorî texmînan 200 milyar dolarî ya heyî, zêde dike. Em dibînin ku weke rêveberê berê yê bankaya Cezayîr'ê Abdurehman Hac Nacer bi navkirî li der veyî sînorên Mexreb'ê "burjuwaziyeke modern pêk tê."

Ji dema ku Kartago hatî avakirin ango heft sedsalan beriya serdema xirîstiyanan, Efrîka'ya Başûr dizanî ji cihê xwe yê stratejîk bi rola xwe rabe û jê dihat bandorê li kar û barên dinyayê bike: di sedsala XVII'an de artêşên deryayî yên li Sala, Cezayîr û Tunisê nameya xwe ya asîlzadetiyê bi dest xistin – bi ser de jî li Fas û Cezayîr'ê 1660'î li gorî koloniyên li dinyaya nû bêhtir ingilîz hebûn û serekên dewletên Ewrûpî bi rêveberên Mexrebî re li ser esasê wekheviyê dan û stendin (5). Ne bi tenê bi yeknebûna xwe û Ewrûpa'yê re, îro Mexreb divê bi tevahiya dinyayê re rûbirû bibe.

Em mesref û lêçûna li Yeknebûna Mexreb'ê di qeydiyên enerjiyê de nîşan bidin. Piştî Rûsya û Norwêc'ê welatê herî zêde gaza xwezayî difiroşe Ewrûpa'yê Cezayîr e. Nêzî nîvê rezervên fosfatên dinyayê di destê Fas'ê de ne, lê ji bo ku wê veguherîne zibil pêdivî bi enerjî, azot û amonyakê heye. Ev hersê hêmanên hilberandinê jî gelekî zêde li Cezayîr'ê hene û buhayê wan jî gelekî kêm e. Di nava bazarên mezin ên zibil ên Ofîsa Eş-Şerîf Fosfatê a Fas'ê (OCP) de Hindistan, Brezîlya û Çîn hene. Şirîkatiyeke di navbera Sonatrach a cezayîrî û OCP'yê de dikarî Mexreb'ê veguherîne navenda hilberandina zibil a herî zêde dikarî bi kêra reqabetê were, ya dinyayê. Sonatrach şîrketeke gelemperiyê ye ku di îndustriya petrolê ya cezayîrî de xwedî rolekî navendî ye. Bi pêkhatina şirîkatiyeke bi vî rengî wê gelek şîrketên tedarîkkirina malzemeyan saz bibin, karsazên ji pênc parzemînan pêk werin, bi ser de jî hejmareke em nikarin hesab bikin derfetên kar jî wê peyde bibin.

Ji bilî mafên ku Fas ji ber derbasbûna gaza ji Cezayîr'ê bi riya xeta lûleyên gaza xwezayî Pedro Duran Farell diçe nîvgirava Cîbralta'yê bi dest dixe, ti hevkariyeke din van herdu welatan bi hev ve girênade. Bi ser de jî, xeta luleyeke gaza xwezayî ya nû Medgaz ku wê di demeke nêz de Cezayîr'ê yekser bi Spanya'yê ve girêbide dest bi xizmetê bike. Tevî ku kapasîteya xeta lûleyan a pêşî hemû nehatiye bikaranîn jî.

Niha jî em lêçûna li Yeknebûna Mexreb'ê di sektora maşînan de destnîşan bikin. Wê neyê bîra ti rêveberê cezayîrî ku pereyekî baş û nisbî gelek ji bo ku ji krîzê sûdê wergire û îstîfade bike (6) bi awayekî stratejîk li Renault'ê razîne yan jî li şîrketên din ên navneteweyî da ku bibe sedema pêkhatina transfereke teknolojiyê ya ku ewqasî gelekî tê xwestin. Kirîna beşekê ji sermayeya Renault'ê, bi Fas'ê re muzakerekirina projeya Tanger ê, şîrketeke hevpar a Fransa û Cezayîr'ê, ma kî li vê difikire? Projeya Tanger'ê, projeya heta sala 2012'an avakirina fabrîkayekê ye ku salê çarsedhezar maşînan hilberîne. Rêveberiya Cezayîr'ê proje û razemeniyên bi vî rengî yên stratejîk bi tevahî red dike û du sedemên wê hene: Daxwaza bi tevahî kontrolkirina çavkaniyên welêt - bi vê jî her tevgera pereyan, pêre jî şertên ku wê şefafiyekê ferz bikin û rêzikên tedbîrwarî yên navneteweyî werin qebûlkirin, li derve tê hiştin; di nava koma rêveber de nebûna mirovên xwedî kapasîteya karibin li senaryoyên bi vî rengî bifikirin. Rêveberên fasî jî ji bo hevkariyeke bi vî rengî xwe ji cezayîriyan bêhtir naêşînin.

Zirara Yeknebûna Mexreb'ê, xwe di sektora berhemên çandiniyê yên xwarinê de jî dide der. Pratîkên sînordarker ên Siyaseta Komî ya Çandiniyê (PAC) demeke dirêj asteng kir mêweyên narincî û firingiyên Bakurê Efrîka'yê werin firotinî Ewrûpa'yê. Her weha lîberalbûna wan û şoreşa guhertina fêrbûnên xwarinê yên mexrebiyan, guhertina stratejiya şîrketên pirrneteweyî yên berhemên çandiniyê yên xwarinê, li welatên Rojava dawiya desteka dewletê ya ji bo firotina dexl ber bi derveyî welêt ve û li hersê welatan peydebûna nifşekî karsazên taybet ên dildar û xwedî îhtîras, ji bo ku rewşê weke şoreşekê biguherin têne cem hev.

Danûstendinên di nava heman sektora îndîsturiyê û berhemên çandiniyê yên xwarinê de îstîsnayên qaîdeyê nînin û bi awayekî esasî para xwe li mezinbûna aborî zêde dikin: herêma Mexreb'ê dikare labaratuwareke bijartinê biafirîne, bi taybetî jî berhemên çandiniyê yên xwarinê bi sektoreke karsazên mezin ên gelek karkeran digirin kar re girêdayî ye. Mirov li pêşketina ne asayî ya zêde ya zeyta tunisî û şirîkatiya di navbera tunisî û spanyoliyan de a di vê sektorê de û li çandniya rezên demeke dirêj beyar hatî hiştin ên li Cezayîr'ê binêre, bes e ji bo ku mirov bibîne ku pêwendiyên modern di navbera şîrketên taybet ên herêmê û Ewrûpa'yê de di warê transfera teknolojiyê de dikare bazarên firotina ber bi derveyî welêt ve û dewlemendiyê biafirîne.

Mirov kozên xwe yên ku li vê herêmê bêyî ku sînor werin vekirin jî hene, bi awayê herî berdar çawa bi kar bîne? Mirov çawa dewlemendiyên wê yên masîgiriyê û zozanan biparêze? Mirov çawa bi awayê herî berdar çavkaniyên avê bi kar bîne? Mirov çawa bike ku girêdana bi kirîna ji derveyî welêt a dexl kêm bibe? Encamên globalbûnê ne ewlebûnên her zêde dibin derdixe holê: Organîzmayên genetîka wan hatî guhertin (OGG), guherîna bahewayê, buhabûna enerjiyê, kontrolkirina şewban. Di dinyayekê de ku buhayê xwarinê zêde dibe, Mexreb weke herêmeke ku dexl ji derve ve dikire di telûkeyê de ye. Sûdwergirtina ji tevahiya derfetên globalbûnê, di heman demê de xwe ji tesîrên wê yên negatîf vedan, ji bo alîkarîkirina Çîn'ên xizan ên gundewarî pirsgirêkek e ku divê were çareserkirin: her pêşketina sektora çandiniyê wê neqeba cihêbûnê ya di navbera herêmên bejahî û bajarî kêmtir bike.

Fas û Tûnis berhemên xwarinê difiroşin Ewrûpa'yê û ji wir û wêde. Li Cezayîr'ê jî razemeniya taybet di vê sektorê de bi lez mezin dibe. Ahengeke van hemûyan bi hecmekî danûstendina navneteweyî ya gelekî kêm re heye – hemin eger em xeşxeşê weke berhemeke çandiniyê ya xwarinê nehesibînin! Karsazên taybet ên mexrebî di nava dîlemayekê de ne; li aliyekî daxwaza wan a nahedine ya ji bo çêkirina şirîkatiyan, hem di qada herêmî hem jî di ya navneteweyî de û li aliyê din pirsgirêkên ku divê ji heqî wan derkevin da ku vê armanca xwe pêkbînin.

Di vê sektorê û di yên din de, eger dewlet têkiliyên xwe nermtir nekin, Fas û Tûnis wê

** Lêkolînerê Navenda Lêkolînên Navneteweyî ya Barcelona'yê.*



*The Island Of Graia, (David Roberts) - Efekt LMD kurdî*

şirîkatiyên xwe û firotina ber bi derve ve ya navneteweyî dewam bikin û gelek pirsgirêkên hevpar wê çaresernekirî bimînin. Kelevajîtiya vê rewşê bi qasî çanda hevpar midbexa Mexreb'ê û welatên Derya Spî mezin e û ev xwarinên vê midbexê li dinyayê bêhtir tê ecibandin. Reh û kokên vê çanda hevpar digihêjin dîrokê, di warê zêdekirina nirxên nû de bi tenê bi sazkirina şîrketên mekanê wan mexreb û hevkariya bi şîrketên pirrneteweyî yên li herêmê jixwe çalak in mumkin e bîne ziman. Qadên pêkhatina vê yekê jî razandina pereyan, hilberandin û îstîhdam e.

Weke encam, dema çavdêrekî ji derve dinêre bala wî dikşîne ku, elîtên mexrebî zêde girîngiyê bi gelek diaspotrayên xwe yên jêhatî yên li Ewrûpa, Amerîka û Rojhilata Nêzîk nadin. Ev helwesta wan tam berovajî ya Çîn û Hindistan'ê ye. Desthilatdarî vê pencereya harîqulade ya li dinyayê dinêre nabîne, van ciwanên weke pirên ber bi derve ve. Fasiyên li derveyî Fas'ê bi cih û war bûne du caran li pereyên ku yekser sermaya biyanî li Fas'ê dirazîne bêhtir dovîzan her sal dişînin welatê xwe. 6 milyar euro pereyên wan li ser hesabên bankayên li Fas'ê razandî ne, ev ji sedî 38'ê tevahiya dovîzên li welat e. Kengî Fas, Cezayîr û Tûnis wê ji diaporayên xwe bipirsin ku bibin sefîrên modernkirina welatên xwe yên jêhatî? Em ê kengî li Mexreb'ê hemrengên The Indus Valley Entrepreneurs (7) (Karsazên Geliyê Îndûs'ê) bibînin? The Indus Valley Entrepreneurs tevneke karsazên hindistanî ya sala 1992'an li Silicon Valley hat sazkirin e û bêhtirî 12 hezar endamên ji 12 welatan wê pêk tînin.

Ewrûpa li aliyê xwe, xwe dûr digire: ew projeyên bi îhtîras ên şirîkatiyê pêşniyarî cîranên xwe yên li başûr nake; elît û çapemeniya wê gelek caran tirsa ji 'yên din' diafirînin û xwedî dikin; ev tirs jî bi îslama radîkal hatiye asîmîlekirin. Siyaseteke vîzeyê ya ku li gorî Kafka ye, ya ku çûnûhatina elîtan bi xwe jî zehmet dike saz kiriye. Ji pirsgirêkê wêde, ew qebûl nake ku Efrîka'ya Bakur karibe bibe parçeyekî bersiva mijarên ew têde bist bûye, yên weke pîrbûna serjimara wê û zêdebûna hêza Çîn'ê.

**Werger ji fransî**
**Lokman Turgut**

---

(1) "Du Coût du Non Maghreb au Tigre Nord Africain (Buhayê Yeknebûna Mexrebê li pilingê Bakurê Efrîka)", IEMed û ToledoPax, Madrid, Gulana 2006'an û Barcelone, Mijdar 2007'an. www.toledopax.org.

(2) www.petersoninstitute.org

(3) Pêvajoya Barcelona'yê sala 1995'an bi însiyastîfa Yekîtiya Ewrûpa'yê û deh welatên li peravên Derya Spî (di navê de rêveberiya filistînî jî heye) hate sazkirin. Ji ber rawestîna hevdîtinên pêvajoya aştiya di navbera Îsraîl û Filistîn'ê de kir ku pêşî li plazsaziya hevkariya herêmî were girtin û asê bibe. 13'ê Tîrmeh'ê 2008'an Serokkomarê Fransa'yê Nocolas Sarkozy însiyatîfa "Pêvajoya Barcelona – Ji Bo Derya Spî Yekîtî" da destpêkirin, lê ew li heman zehmetiyên siyasî dikeve û pêvajo di cihê xwe de bist dibe.

(4) Aliyê ewlekariyê yê Ji Bo Derya Spî Yekîti'yê, rast e ku dibe sedema bawerîpênebûna hin rêveberên Mexreb'ê.

(5) Nabil Matar, Turks, Moors and Englishmen in the Age of Discovery (Tirk, Berber û Îngilîz di serdema keşfan de), Columbia University Press, New York, 2001; Europe through Arab Eyes 1578-1727 (Bi çavê ereban Ewrûpa ji 1578'an heta 1727'an), Columbia University Press, New York, 2009.

(6) Francis Ghilès, Omar Aloui û Guillaume Alméras, A l'Horizon 2013. Un scénario incertain pour le Maghreb (Di Aso de 2013. Senaryoyeke nemisoger ji bo Mexreb'ê), Fondation du Centre d'études internationales a Barcelone – Weqfa Navenda Lêkolînên Navneteweyî ya Barcelona'yê (CIDOB), Tîrmeh 2009'an. www.cidob.org

(7) www.tie.org

JÎNGEH

# Daristanên Endonezya'yê liber talanê ne

Cédric Gouverneur*



*Endonezya xwe dikuje, (Greenpeace) - Efekt LMD kurdî*

Nêçîrvan û berhevkar bi şiklê nîv-xelekekê kom bûne li meydana bêdar a rêlê ku pêşwazî li zeraqên berbangê dike. Mêrên bişûtik çav li wan biyaniyan kutane. Li pişt wan, jin memik didine bebikan û zarokên ku ji wan mêvanên nepayî tirsiyayî aşt dikin. Menti, pîremerêkî peyt û rebît ê li dor şêst salî, rûspî û serekê vê koma pênc malbatan, ji antropologê endonezyayî yê digel me hinek agahiyan werdigire: Orangs-Rimbasan dil lê ye bersivê bidin. Lê belê, divê lezê lê bikin; ji ber ku kêm maye ji bo wextê çûna nêçîrê. Ajelên nêçîrê, ji ber têkçûna jîngehê kêm bûne.

Lewre her lawaztir dikeve, rêla dûrgeya Sumatra'yê… Dirrindeyê serekî: Takeçandiniya [Monoculture: Çandin û gihandina bi tenê berhemekê li devereke diyar] palmiyeyên rûnî. Rûnê palmiyeyan, ku di duristkirina xurek û berhemên kozmetîk de tê bikaranîn, niha deraveke din jî peyda kir: estera [pêkhateyeke kîmyayî ye ku ji reaksiyona alkol û asîdê bi dest dikeve] metîl alkolî ya rûnê giyayî (EMRG), ku ew jî karbûraneke ziraî ye. Di navbera 1998 û 2007'an de, Endonezya'yê di resmiyetê de erdên xwe yên çandiniya palmiyeyan ji 3 milyonan gihandine 7 milyon hektaran, û bû yekem hilberînerê cîhanî yê vê dara rûnder li pêş Malezyayê. Cakarta'yê dest avêtiye projeyên dêwasa ji bo pêregihiştina daxwazên pir zêde yên rûnê palmiyeyan (40 milyon ton hatiye hisêbkirin ji bo sala 2020'an, îro 22,5 milyon ton in): heta 2020'an 20 milyon hektar dê bêne terxankirin bo palmiyeyên rûnî. Anku 200.000 km2 –qederê sêkiyê [ji sêyan yekê] serzemînê Fransa'yê. Li Sumatra'yê, ku rêlên wê ji 1999'an heta niha ji 2,2 milyon hektaran daketine 400.000 hektaran, 850.000 hektarên din dê li wan 450.000 hektaran bêne zêdekirin ku halê heyî çandiniya palmiyayn lê tê kirin.

Hinek Orangs-Rimbas, ku ji ber xelaya nêçîrê zikên wan kûr bûne wekî koncalê, beramber çend qurîşan hevkariyê dikin ji bo jinavbirina jîngeha xwe: Menti dibêje, "me zaniye ku binemaleke rojavayî rêla xwe firotiye javayiyan" û pê de diçe, "diyar e niyeta wan ew e ku bikin zeviyên palmiyeyan." Ji ber vê agahiyê nêçîrvan bihêrs dibin û mêvanên wan diheyirin: çawa, di nîveka parkeke neteweyî ku

* Rojnamevan.

qaşo “parastî” ye, Orangs-Rimbas dikarin erdan –ku ne aîdî wan in û mafê wan ê bikaranînê heye- “bifiroşin” bazirganên palmiyeyan ku jixwe tu mafê wan ê kirrînê jî nîne? Diyar e di vê nimûneyê de dengê sozên wezîrê jîngehê nayê bihîstin. Ma ne wî di 23yê Adara 2007’an de, li Cakarta’yê, sond xwaribû ku “bi milyonan hektarên palmiyeyên rûnî nabine sebebê qurbanîkirina rêlan?”

Çend kîlomêtre wêdetir ji Menti û binemala wî, Kardeo yê 54 salî, li ser eywana xaniyê xwe yê fireh ê bi stûnên gêçkirî û pempeyî pêşwaziyê li me dike. Kardeo dibêje “berê ez li wê derê dijiyam, û xanîkoke depîn û nêzîk nîşanî me dide. Palmiyeya rûnî ji min re şadî anî-” Kardeo ji wan e yên ku li vir jê re transmigrasi [mihacir, koçber] dibêjin. Di navbera 1950 û 2002’an de, ji bo rihetkirina Java ya [dûrgeyeke mezin a Endonezya’yê] xwedanê şêniyeke pir zêde (1), Cakarta’yê 6 milyon javayiyên feqîr handan ku biçin li dûrgeyên biçûk û qeraxî bikevine dû nanê xwe. Gel û cemawerên binkî gelek nerihet bûn ji ber vê siyasetê lewre bi baweriya wan ew cemaeta koçberan, bi ihtimaleke herî baş, biyaniyên xwedan îmtiyaz bûn, û bi îhtîmala herî xerab kolonyalîst bûn û dixwestin dewama hakimiyeta dîrokî ya Java’yê li ser komdûrgeyê [koma dûrgeyên biçûk li Endonezya’yê] bînin.

Sala 2001’an, bi sedan javayî –jin û zarok jî tê de– ji aliyê şervanên dayak ve hatine kuştin û bi vî rengî careke din navê dayakan bi serbirrînê belav bû. Kardeo dibêje, “dawiya 1984’an min ji Java’yê bar kir. Hikûmetê xaniyeke depîn, sê hektar û bo salekê alîkariya xurekî dane min-” Destpêkeke pir zehmet bûye berî ku palmiyeya rûnî ya bixêrûbêr derkeve meydanê. Bi kurtebir lê zêde dike, “ez îro qederê 16 hektaran palmiyeyan diçînim. Her yek heyvê 1,6 ton berhem dide û kîloya tovî bi 700 heta 1700 rûpiyan tê firotin. Serqise, heyvê 45 milyon rûpî ji vî erdî digihe destê min” –anku heyvê 3500 euro. Kardeo yê ku ji “partiya tutiştî” ye jiyaneke rihet dibe serî û keçên xwe jî li zanîngehê qeyd kirine. Palmiyeyên rûnî pêdivî bi sexbêriyeke kêm heye, mesela bi tenê şeş kes dixebitin di dehla wî ya 16 hektarî de: heyvê şeş mûçeyan dide. Cotkarên deverê li xwe mikur tên ku ji ber kêmî û hêsankariya di warê mûçeyan de, wan dest avêtiye veguherandina dehlên xwe yên heveayan [hevea: dareke ku lateksa ji bo kaûçukê jê tê bidestxistin] (ku ji bo jîngehê bêzerertir in) bo zeviyên palmiyeyan. “Û bi zibil û dermanên Monsanto, randumana daran hêj çêtir e”, bi kêfxweşî lê zêde dike Kardeo. Gelo wî qet behsa zererên palmiyeyên rûnî yên li ser jîngehê bihîstiye? Di bersiva wî de duristî heye: “Asta jiyana min û aboriya welatê min maye li ser palmiyeya rûnî. Wê çaxê jîngeh…”

Herçend Kardeo bêxiyal û piştrast be jî ji halê xwe, gundiyên din ên Sumatra’yê kêm caran bi qasî wî kêfxweş in. Li sertaserê komdûrgeyê, bi sedan gundên ku ji soz û qewlan bêhêvî bûne, bi wê berhemê hatine xizankirin ku çaverê bû wan dewlemend bike, û li pêş çavên wan erdên wan ji wan hatine standin, rûbarên wan hatine pîskirin, îro bi can û bedenên xwe li dijî şirket û hêzên nizamî yên dewletê li ber xwe didin. Komeleya Walhi destnîşan dike ku du sed û bîst û çar rûdanên berxwedana cemaetên gundiyan li dijî şirketên rûnê palmiyeyan li Sumatra’yê, û li dora pênc sed rûdan li sertaserê komdûrgeyê, hatine tomarkirin.

Bi qanûnê teqezkirî ye ku ji bo bikaranîna erdekê wekî dehla palmiyeyan, divê veberhêner rêzê li hinek qaîdeyan bigire, ji wan kirina lêkolînekê derheqê tesîra wê ya li ser jîngehê de. Lê belê, Serge Marti yê rêveberê komeleya LifeMosaic a Swîsreyî û nivîskarê raporteke li ser tesîrên takeçandiniya palmiyeyên rûnî (2), wisa hisêb dike ku, “50 milyon rûpiyên [3.900 euro] di-bin-maseyê-re têra destûra çandina 20.000 hektaran dike-” Li hemû derên komdûrgeyê, “şirket bi karmend û polîsên dewletê dadikevine nav gundan ji bo tirsandina şêniyan. Min bi xwe dîtiye ku gundî, wekî di serdema Soeharto de, bi “komûnîzmê” dihatine tawanbarkirin heke wan qebûl nekiraya ku erdên xwe bihêlin bo “projeya geşedana neteweyî” ku bibine dehlên darên palmiyeyên rûnî (3)-” Mafê xwedantiyê li Endonezya’yê meseleyeke pir xul û aloz e: Ji cerga koloniyên Hollanda’yê heta îro, dewletê hergav ew maf li ba xwe parastiye ku bi pênavê “geşedan” an jî “berjewendiya giştî” mal û erdê kes û koman jê bistîne.

Heta 1999’an, du hezar û pênc sed şêniyên Karang Mendafo yê debara xwe ji mebred û heveayên xwe dikirin. Niha bîra wê heyamê dikin ji ber ku hingî ew zeviyên wan têra wan dikir. Muhammed Ruşdi yê serekê gundî çîroka gundê xwe weha rawedike: “Şirketeke ji grûba Sinar Mas” -yek ji holdîngên endonezyayî- “bi alîkariya esker û polîsan hat darên rêlê bibirre. Sinar Masê 600 hektar bi dest xistin û ew dever tew kirin dehlên palmiyeyên rûnî. Êdî tu erdê me nîne. Û tu rêl jî neman li van deran. Her ev felaket hate serê heft gundên cîran jî.” Kanûna 2007’an, Ruşdî çû Konferansa Bali’yê da ku doza gundê xwe pêşkêş bike û biparêze. (4) Lê bêmifa bû.

Qerebû, pişkdariya di qazanca ji dehlan de, karê bimûçe, çêkirina rêyan û avakirina xwendegehan… Sinar Masê “gelek soz” dan dibêjin gundî bi xerez. Hêj jî li benda bicihanîna veberhênanên ragihandî ne û dahata piraniya wan daketiye, ji bo hinekan pênc beramber kêmtir bûye. Sayuti yê 42 salî, bijin û bavê sê zarokan serhatiya xwe wiha derdibirre: “Berî 1999’an, min 1,5 hektarên heveayan hebûn û ji kaûçuka wê heyvê 1.200.000 rûpî [nêzîkî 100 euroyan] bi dest min diketin.” Îro, Sayutî hûrde -pişkdarê dehleke palmiyeyan e- bi tenê 225.000 rûpiyan [17 euro] qazanc dike. Çerxa jiyana rojane êdî bi pere dizivire: divê gundî êdî fêkî û sewziyên ku berê wan bi xwe diçandin bikirrin. Rûbar li ber sikratê ne û xêr tê de nemaye: Zibil û dermanên mêş û kêzikan, malik li masiyan wêran kiriye. Û herçend fireçandinî û cengel avê biparêzin, takeçandinî hemû ber û hêza axê jê dikêşe: lehî û lêser makadamên [kevirên ku rêyan pê radixin] rêyan radimalin. Gundiyên ji ber van hemû nexweşiyan zivêrbûyî, dest davêjine çalakiyên rasterast: heftiyê çend caran, bi dehan neferên wan hildigirin çekên xwe yên tirsandinê, golok (satorên herêmê), dadikevine nav dehlan û bi şadî fêkiyên palmiyeyan berhev dikin da ku paşî li bazarê bifiroşin.

Bêtir li hêla bakur, gundê Logu Mandesa û du hezar malbatên wan. Sala 2006’an, grûba Sinar Mas destûr ji hikûmetê wergirt ku erdên gundiyan bike dehlên palmiyeyan. Sugino, serekê gundikên herêmê, gazindan dike ku “qet ne xema rayedaran e ku belê ev erd aîdî me ne. Şirketê bi vî rengî 500 hektarên erdî ji me stand, û em hêj li bendê ne ku heqê qerebûyên me bidin-” Gundiyên ku êdî bêsebr û bêtehemil mabûn dest bi êrîşê kirin: 28’ê Kanûna 2007’an, bi sedan neferan êrîş birine ser binkeyên şirketê, yazdeh buldozer û jîpeke 4x4 şewitandin. Medyayê dîmenên raperînê ragihandin –ku bi telefonên mobîl hatibûne girtin– û raya giştî cihê xwe digel serhildêran girt. Polîsan bîst û du kes girtin ku ji wan neh kes bo demeke dirêj hatine ragirtin. Sugino balê dikêşe ser wê hindê ku, “şîrket bi tenê di hizra kar û berjewendiyên xwe de ye, ne di hizra îdarekirina xwezayê bi rengekî ku bo nifşên paştir jî hevildar be” û wiha pê de diçe: “Tu partiyeke siyasî piştgiriya me nake. Komîsyona Mafê Mirovan ya Endonezya’yê tu tiştî nake ji bo me.”

Jiyara qederê sê hezar û pênc sed Orangs-Rimbasan hêj jî nêçîrvanî û berhevkarî ye li nav wan rêlên Sumatra’yê ku her kêmtir dibin. 1996’an, rêlên tropîk ên Endonezya’yê 144 milyon hektar, anku % 77’ê serzemînê welatî bû. Îro, ji pêncan çar pişkên rêlên wê ji beyn çûne (5). li Sumatra’yê, her wekî li Klimantan (beşê başûrê dûrgeya Borneo’yê) û li Papouasie’ya Endonezya’yê, leza bêdarkirinê rojane digihe çarsed sehayên fûtbolê –rekora cîhanî. Bi ya Neteweyên Yekgirtî, ji 2012’an pê de, rêlên Endonezya’yê –qaşo “parastî” ne – dê “bi rengekî ciddî kêm bin (6)-”

“Tu tiştê me yê windakirinê nîne, dibêje ciwanekî bihêrs ê Logu Mandesayê. Em dê buldozerên din jî bişewitînin.”

**Wergera ji fransî**
**Ergîn Opengîn**

(1) 127 milyon ji 220 milyon endonezyayî li Java’yê (138 800 $km^2$, kêmtir ji % 10’ê erdê Endonezya’yê) dijîn.

(2) “Losing Ground”, raporta LifeMosaic (Swîsra), Sawit Watch (Endonezya) û Friends of the Earth (Brîtanya), Reşeme 2008; www.foe.co.uk/resource/local/planning/news/losing_ground.hml

(3) Di salên 1965-1966’an de rejîma Soeharto ya “Nîzama nû” ji pêncsed hezar heta milyonek komûnîst qetl kirin.

(4) Vê konferansa li ser guherîna avhewayî ku ji 3’ê heta 14’ê Kanûna 2007’an sed û bîst û çar welat di bin banê Neteweyên Yekgirtî de anîn ba hev, bi giştî bêyî biryarên diyarker bi dawî bû.

(5) Malpera agahiyan www.agrocarb.fr, digel hinekên din bi taybetî ji aliyê Comité catholique contre la faim et pour le développement (CCFD), les Amis de la Terre û Oxfam ve tê rêvebirin.

(6) “The last stand of the orangutan”, raporta bernameya Neteweyên Yekgirtî ji bo Jîngehê (PNUE), Reşeme 200

# Talana bi motorên darbirr

Li pişt rêya raserî palmiyeyên rûnî, binkeyên wan holdîngên Endonezyayî hene ku binavûbang in ji bo hevkarî û rêkeftina nihênî ya digel rejîma dîktator a general Mohamed Suharto (1965-1998). Yek ji wan, Holdînga Raja Garuda Mas, aîdî Sukanta Tanoto yê dewlemendtirîn mirovê welatî ye. Şaxê wê yê bi navê Asian Agri ketiye ber tawanbarkirinên Greenpeace’ê ji bo bêdarkirina jîngeha orangutanan li Borneoyê. Reqîbê wê Sinar Mas di bin rêveberiya mirovekî din ê Suharto de, yanî Eka Tjipta yê sêyemîn mezintirîn sermayedarê welatî, ye. Piştî ku navê şaxê wê Asia Pulp & Paper (APP) kete nav deftera reş ji ber darbirrîna wê ya hovane li Endonezya, Çîn û Kamboçyayê, zincîre-maxazeyên malên kaxezî yên emerîkî, wekî Office Depot û Staples, qanih bûn ku divê kaxezên xwe ji şirketeke din bikirrin.

Şirketa holdînga Bakrie & Brothers, Lapindo Brantasê ew bîr kola ku di gulana 2006’an de wolkaneke herriyê da der li Porongê (Java) ; bi derkirina 125.000 $m^3$ kirs û pîsiyê bi sedan hektar li bin avê hiştin. Hezaran gundiyan hemû war û samanê xwe ji dest dan. Bakrie tevdîra xwe bi rêya firotina şirketê bo holdîngeke biyanî girt. Lapindo Brantasî, bêyî hesab û agahdarkirinekê alîkariya li felaketzedeyan birrî. Xalek: Aburizal Bakrieê patronê holdîngê di heman demê de wezîrê karûbarên civakî ye ! Kirniyên din ên rûnê palmiyeyan: William Kouk Khoon Hong’ê malezyayî û Martue Sitorus’ê endonezyayî, danerên holdînga Wilmar’ê. Ji bo firehkirina dehlên xwe bi hêsanî, Wilmar bi bicihkirina rêbazeke radîkal tê tawanbarkirin: şewitandina rêlan.

Ev holdîngên hanê hemû, bi niyeta keskkirina îmajên xwe li dora maseya girover a rûnpalmiyeya xweragir (Round-Table on Sustainable Palm Oil; RSPO) kom dibin: RSPO’ya ku di 2004’an de hatiye avakirin û zêdetir ji sêsed endaman li dora xwe dicivîne, hilberîner, bank, mişterî, hinek rêxistinên ne-hikûmî (RNH) digihîne hev û, her wekî navê wê nîşan dike, doza “geşedana xweragir” dike. Unileverm Nestlé, Cargil an jî hilberînerên karbûrana ziraî Greenergy (Brîtanya) û BioX Group BV (Hollanda) kar û kiryarên xwe bi xêra RSPO’yê rewa nîşan didin lewre dibêjin ku ew bi tenê jî RSPO’yê bi dest dixin malên xwe. BNP Paribas, Deutsche Bank û Royal Bank of Scotland diyar dikin ku mişteriyên wan ên endonezyayî “rêzê li şertên jîngehê digirin-” Credit Suisse “xwe ji her çi şîroveyekê diparêze-” Bankayên Hollanda’yê Rabo Bank û ABN Amro guh nedane pirsên me. Lê belê HSBC razekê xwe eşkere dike û dibêje ku piştî lêkolînekê, di dawiya 2009’an de, hesabên hinek ji mişteriyên xwe yên endonezyayî bigire.

AMERÎKA YA LATÎN

# Brezîlya ji "kompleksa kûçikê bêjî" rizgar dibe

LAMIA OUALALOU*



*Brezîlya li xwe digere - (Arthur's art)*

"Cihê şermê ye ku Brezîlya pêşwaziyê li serokê rejîmeke dîktator û zordest dike. Ragirtina peywendiyên dîplomatîk digel dîktatoran tiştek e, pêşwazîkirina serokên wan li mala xwe tiştekî din e (1)." Parêzgarê Sao Paulo'yê Jose Serra, ku yek ji kesayetên serekî yê muxalefeta li dijî Serokdewlet Luiz Inacio Lula da Silvayî ye, bi van gotinan serdana Serokdewleta Îran'ê Mehmûd Ehmedînejadî bo Brezîlya'yê, 23'ê Mijdara borî, şîrove dikir. Jose Serra, kêm caran wiha bi xerez êrîşan dibe ser siyaseta Lula da Silva yê ku piştgiriyeke pir bihêz peyda kiriye di nav xelkê de.

Digel desthilata Serokê Partiya Karkeran (PK), gorankariyên serekî di siyaseta derekî û bernameyên civakî de pêk hatin. Serok Lula da Silvayî, herçend di warê samanên darayî de paşkişî kiribe û dest ji beşeke bernameya xwe ya aborî kêşabe jî –ku di desthilatdariya xwe ya duyem de heta derecekê dewam lê anî-, rêya xwe cuda kir ji wan elîtên ku, piştî heyamekê lidûçûna dîrektîfên Îngilîstana emperyal di sedsala XIX'an de, di şerrê ji bo serkeftina "cîhana azad" de li jêr hîmayeta Amerîka'yê rêzên xwe girtin.

Lê belê, ev gorrankarî ne ji ber helwêsteke îdeolojîk a eşkera ya Lula da Silva ye, tevî ku du ji hevkarên wî yên serekî, Celso Amorimê wezîrê karûbarên derekî û rawêjkarê taybet bo pirsên navneteweyî Marco Aurelio Garcia, bi eşkereyî xwe digel dozên "çepgir" nîşan didin. Ji bilî faydexwaziyeke [pragmatîzm] aborî, ev rêbaz dibe tercîhek ji bo hikûmetên gelparêz, lewre qanih bûne ku welatî deyneke dîrokî heye ji bo Efrîqa'yê ji ber rabirdûya wan a koledar. Herwiha gihiştine baweriyeke teqez ku Brezîlya divê xwe ji wê kompleksa "vira-lata" -peyv bi peyv dibe "kompleksa kûçikê bêjî"- rizgar bike ku ji bo helwêsta wî kesî tê gotin yê hizir dike ku ne xwediyê mafê gotinê ye li ser meseleyeke diyar.

Lula da Silva, 1'ê Çileya 2003'yan, di rêwresma dewrwergirtina desthilatê de, pêşwaziya herî germ li Serokê Kuba'yê Fidel Castro kir. Çend meh piştre, dostanî û hevahengiyeke samîmî digel George W. Bush'ê hevpîşeyê xwe yê emerîkî nîşan da û bi vî rengî dil li mîlîtanên Partiya Karkeran sar kir. Serok berî her tiştî sendîkavan e, qanih bûye ku divê danûstandinê digel herkesî bike û herwiha di wê baweriyê de ye ku lihevhatineke çak, hetta di milmilaneyeke aloz de jî, bi rizamendiya du aliyan çêdibe. Û herwekî wan salên grevan ên 1970'an, rê her heye ku di

** Rojnamevan, Rio de Janeiro.*

navbera du milmilane û dijatiyan de qedehên wîskiyê digel patronan lêk bidin.

Her tişt, li pêş çavên cîhanê, di Îlon'a 2003'an de dest pê kir, gava ku Brezîlya'yê li ser navê bîst welatên di geşedanê de –G-20– serî hilda û bi vê yekê rojeva hesas a civîna Rêxistina Cîhanî ya Bazirganî'yê (RCB) ya Cancun'ê serûbin kir. Cara yekem bû ku wan welatan şert danîne ber welatên dewlemend –ku di bin banê G-8 de kom bûne– beramber vekirina bazarên xwe. Lula da Silva eşkera û bisteh got ku, "gava yek dixwaze tiştekî bikirre [li ser axa Brezîlya'yê], divê Brezîlya li wê derê amade be ji bo firotinê."

Ji cerga yekem dewra desthilata xwe, pirrî caran digel komeke karsazan, sêsed û heştê û neh rojên xwe li derveyî welatî buhurandin (2). Di menûyê de Amerîka ya Latîn ji bo girîngiyê di rêza yekem de cihê digire, herwiha gewrewelatên başûrî yên di geşedanê de –Efrîqa'ya Başûr, Hindistan, Çîn, Rûsya...– û herêmên ku elîtan ji berê ve piştguh kirine, wekî Amerîka ya navendî, Efrîqa û Rojhilata Nêzîk jî hene.

Sala 2005'an, berî ku sala paştir li Abujaya Nîjerya'yê digel welatên Efrîqa'yê bicive, Brazîlya'yê bo cara yekem pêşwazî li dîwana Amerîka ya latîn/welatên erebî kir û ji re neda Dewletên Yekgirtî ku doza rola çavdêriyê dikir di wê civînê de.

Qesra Itamaraty'yê, ku cihê rêveberên Brezîlya'yê ye, serê pêşî baş tênegihişt bê çi diqewimî. Tercîha dîplomatan, ku bêtir parêzkar û ji çîna elît in, bi eşkereyî digel wan paytextan bû ku li Brezîlya'yê jê re "xeleka Elisabeth Arden" dibêjin û ku qest jê paytextên "nayab" bûn: Roma, Paris, London, Washington. Karsaz û patron li rexê xwe ve çepikan lê didin: Ev polîtîka rêyê li ber kawdan û berfirehbûna şirketên pir-neteweyî yên Brezîlya'yê vedike. Şirketa hîdrokarbûran Petrobras, ya madenan Vale, serkêşên sektora avadaniyê Odebrecht û Camargo, lîderê goştî JBS Fribol, yê goştmirîşkê BRF, balafirsaz Embraer, banka Itau, herwiha bi sedan hilberînerên alkola etîlîk, yên soyayê...şahidî lê kirin bê ka çawa îxracata wan an jî veberhênanên wan ên li derveyî welatî çend beramber zêde bûn.

Piştî peydakirina kanên petrolê yên mezin li deryayên welatî, karê Brezîlya'yê yê îxracatkirinê her firehtir dibe. Li rexê din, Pekîn'ê deh milyar dolar bi deyn dane Petrobras'ê da ku di paşerojê de hîdrokarbûrana wê teqez dabîn bike. Îsal bo cara yekem, Çîn bû mezintirîn muşteriyê berhemên brezîlî, û bi vî rengî Dewletên Yekgirtî li dû xwe hişt.

Lê belê karûbarên siyasî û bazirganî herî baş dîsa her li Amerîka ya Latîn bi pêş ve diçin. Herî zêde brezîlî sûd û xêrê ji bilindbûna daxwazan ya li Venezuela ya cîran werdigirin. Di demekê de ku xelkê feqîr ê Venezuela'yê li wir derfeta tiştkirînê –goşt, şîr, hûrde-amrazên elektronîk, hwd.– peyda dike, Caracas [paytexta Venezuela'yê], ji ber nebûna sektoreke kêrhatî ya çandinî û endûstriyê, mecbûr e gelek pêwîstiyên xwe ji Kolombiya'yê, û çaxê peywendiyên digel Bogota'yê aloz dibin, ji Brezîlya'yê îthal bike. Şirketa brezîlî Ambevê hay jê heye ku divê bi hişyarî tevbigere da ku li Arjantîn'ê xelk pê nehise ku wê marka Quilmes, bîraya efsanewî, kiriye. Hilberînerên goştî yên serekî li herêmê ketine bin perr û baskên brezîliyan, her wekî ku li Urugua'yê jî qewimî, lê belê li Urugua'yê sektora birincê jî ketiye destê brezîliyan. Li Bolîvya'yê, şirketên brezîlî, bi rêya bazirganiya soya û xazê, li ser ji pênc paran yekê ekonomiyê zal in. Li Urugua'yê, erdên adan ên parêzgehên wekî Alto Parana, San Pedro, Concepcion, Amambay y Canindeyu yê bi soyaya brezîlî hatine dadan. Banka Neteweyî ya Geşedanê (BNG) (3) ya Brezîlya'yê, li her derê, bi piştgiriya xwe ya darayî, digel şirketên brezîlî amade ye. Bi ya Matias Spektor, profesorê peywendiyên navneteweyî di Weqfa Getulio Vargas de li Rio de Janeiro'yê, "siyaseta Brezîlya'yê ya bazirganiyê ne tenê xwedanê wê armancê ye ku neteweyeke dewlemendtir durist bike, lê herwiha neteweyeke bihêztir."

Ev rewş dibe binasê nerihetiyan. Brezîlya ya ku fêr bûye xwe wekî "dêwekî dilovan" pêşkêş bike, carinan bi emperyalîzmê tê tawanbarkirin. Ev tohmet ji layê Arjantîn'ê tên ku gazindan dike ji lehî û nijdeya berhemên endûstriyel [-ên brezîlî]; ji layê Ekvador'ê tên ku li wê derê Odebrecht [şirketeke brezîlî] bi qelpezaniyê tê tawanbarkirin; ji layê Bolîvya'yê ku li wê derê, gewre-sermayedarên brezîlî yên li deverên rojhilatî bicihbûyî, hevalbendiya xwe ya digel muxalefeta li dijî hikûmeta Evo Moralesî bi eşkereyî nîşan didin. Lula da Silva, ji bo xatirê ragirtina peywendiyên dostane û cîrantiyeke baş, gelek caran navbeynkarî kiriye. Ev hewlên wî yên aştkirinê, herî zêde bi pênawê hevahengiya herêmî bûn, û bi vî rengî, li ser rayedarên hikûmeta xwe qedexe dikir ku dest bavêjine wan tedbîrên tolhildanê yên ku çapemeniyê teşwîq dikirin.

Ji cerga çalkirina projeya Devera Danûstandina-Azad a Amerîkiyan [DDAA, bi spanî ALCA], ku li ber dilê Waşîngton'ê pir hêja bû, hevahengî û rêkeftina Amerîka ya Latîn bûye rehendeke siyaseta Brazîlya'yê. Lula da Silva bi bîr tîne ku, "berjewendiya Brezîlya'yê herî zêde di wê hindê de ye ku cîranên wê saxlem bin, ne ku bibe cîranê welatên ji ber qeyranên civakî û siyasî nazik û feqîrketî." Ev qenaeta wî di 2006'an de eşkere dibe gava ku li hember biryara Morales ya miletîkirina zeviyên xaza Bolîvya'yê ku Petrobras'ê li ser kar dikir, got ku biryareke "serwer" e; herwiha, wî ew baweriya xwe di demekê de eşkere kir ku hinekan xurtî li hikûmetê dikir ku hêzên leşkerî yên Brezîlya'yê bişîne da ku cewaba "qebeheta hikûmeta Bolîvyayê" bidinê (4).

Brezîlya'yê herwiha dawî li dubendiya abadîn a digel Paraguay'a cîrana nazik jî anî, bi qebûlkirina gotûbêjkirina şertên –ku qet ne bi dilê Asuncionê [paytexta Paraguayê] bûn – birêvebirina Itaipu'yê, karxaneya dêwane ya duneteweyî ya hîdroelektrîkê li ser sînorê di navbera herdu dewletan de. Ev yek çakiyeke heyatî bû ji bo îstiqrara hikûmeta Fernando Lugo, ku ev yek wekî serkeftinekê li dijî cîranê xwe yê bihêz nîşan da.

Lugo û Morales elît û serkêşên Brezîlya û Waşîngton'ê nerihet dikin, lê belê ne bi qasî Hugo Chavez'ê Serokê Venezuela'yê, ku Lula pê re hevalbendiyeke saxlem bi rêk xistiye. Herduyan jî qebûl nekirin ku xwe di nav gotara "du çep" de asê bikin: ji wan du çepan yek, çepa xwedan-mesûliyet û nûjen, xemxurê hevkêşeyên aborî –ku Brezîlya serkêşiyê lê dike û Şîlî û Uruguay jî tê de cih digirin; Çepa duyê jî, çepa tundrew e, ku gelperwer û dij Amerîka ye û bi serkêşiya Venezuela û Kuba'yê, Bolîvya, Ekvador û Nîkaragua'yê di heman rêzan de bi cih dike. Gava ku medya berê xwe didine eşkerekirina dijatiyên di navbera du welatan de, serok Lula da Silva û Chavez hewl didin ku civînekê bi rêk bixin ji bo vekirina pirekê an jî ji bo danîna yekem kevirê karxaneyekê, hêcetek ji bo peyamdanê bi rêya kamerayên sertaserê cîhanê. Gava Chavez bi otoriteriyê tê tawanbarkirin, Brasilia [paytexta Brezîlya'yê] di bersiva xwe de balê dikêşe ser pabendiya xwe ya digel Bazara Hevbeş a Başûrî (Mercosur).

Hevpeymaniya du welatan di heman demê de kilîla wan saziyên serekî yên Amerîka ya Latîn e ku di van çend salên dawî de pêk hatin. Ya ji hemiyan girîngtir, Yekîtiya Amerîka ya Başûr (Unasur) ku di gulana 2008'an de li Brasilia'yê hate avakirin, dazdeh welatên herêmê dicivîne û armanc lê ew e ku cihê Rêxistina Dewletên Amerîka'yê (RDE) bigire ku bi binkeya xwe ya li Waşîngton'ê, ev rêxistina navborî, pabendbûna digel Koşka Spî temsîl dike. Saziya ku hêj saxlem binecih nebûye, bi xêra tedaxula desteya bergîriyê, nerihetî û dubendiyên di navbera Ekvador û Kolombiya'yê (5) de aşt kirin û bi dîsa-pesendkirina meşrûiyeta Morales di Îlon'a 2008'an de, dawî li wan hewlên têkder ên muxalefeta Bolîvya'yê anî. Herdu caran jî bêyî tedaxula Waşîngton'ê.

Herwiha, Brezîlya'yê bi rêya Unasur'ê dijatiyeke pir tund da ber xwe li dijî bicihkirina heft binkeyên leşkerî yên Dewletên-Yekgirtî li Kolombiya'yê. Bi ya Brasilia'yê, dubendiyên herêmê divê bêyî tedaxuleke derekî bêne çareserkirin. Ji ber heman sebebî ye ku Lula da Silva, Dewletên Yekgirtî şermezar kir gava ku dewleta navborî di Nîsan'a 2008'an de biryara veçalakkirina fîloya IV ya hêzên deryayî yên Amerîka'yê girt ji bo asayîşa li deryayên Amerîka ya Başûr û Karayîban. Lê belê, dubendiya di navbera Brezîlya û Dewletên Yekgirtî de bi rengekî herî eşkere li ser dosyeya Honduras'ê derkete mexderê. Çer ku derbeya [kudeta] 28'ê Hezîran'ê pêk hat, Unasura yê xurtî li rayedaran kir ku Manuel Zelaya dîsa vegere li ser desthilatê û heta dawiya dewra hukmê xwe li serokatiyê berdewam be. Gava, di 21'ê Îlon'a 2009'an de, serokdewletê bêdesthilatkirî xwe sparte balyozxaneya Brezîlya'yê, Lula da Silva xwe di rêza pêşiyê de dît. Bi ya Aurelio Gracia yê bihêrs, "Brezîlya'yê bi hemû şiyana xwe hewl da, lê belê hêza Brezîlya'yê, li çav ew tiştên ku Dewletên Yekbûyî dikaribû bikirana pir kêm in. Heke ew hêza xurtîkirin û zextan li ber destê me hebaya, me dê ji vê zêdetir bikira."

Hêrs û nerihetî dawiya meha mijdarê bêtir aziriya, gava ku Barack Obama nameyek şand ji hevpîşeyê xwe yê brezîlyayî re ku tê de biryara xwe ya naskirina hilbijartinên hikûmeta derbeyê yên 29'ê Mijdar'ê û herwiha ew helwêstên xwe meşrû dikirin yên derheqê gotûbêjên RCB û civîna Kopenhag'ê de, ku Brezîlya'yê bi eşkereyî rexne li wan helwêstan digirtin. Nameya ku çend roj berî serdana Ehmedînejad bo Brezîlya'yê hatibû şandin, herwiha bala serokê Brezîlya'yê dikêşa ser îhlalên mafê mirovan li Îran'ê pêk tên û xetereyên bernameya wê ya nûkleer.

Lula da Silva aciz e ji wê helwêsta dewletên xwedanê çekên nûkleer û jixwe navê durûtiyê lê dike. Serê meha kanûnê, da Silva di beyanekê de diyar kir ku, "ji bo ku yek wî mafê exlaqî di xwe de bibîne ku xurtiyê li yên din bike [da ku çekên nûkleer çênekin], serê pêşî divê ev welat bi xwe dest ji wan çekan berdin" û bi bîr anî ku destûra Brezîlya'yê duristkirina wan bombeyan bi eşkereyî qedexe kiriye. Hevkarên nêzîk ên serokî diselimînin ku bi ya Brazîlya'yê, mafê Îran'ê ye ku bikare teknolojiya nûkleera sîvîl bi pêş bixe. Heye ku qedexeyeke bi vî rengî bibe nimûneyeke xeternak bo Brezîlya'yê.

Lula da Silva rik lê girtiye ku welatê wî têkeve nav Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekgirtî (NY), herwiha pir ji sazkariyên Fona Navneteweyî ya Darayî (FND-IMF) aciz e, ji ber ku gewre-welatên di geşedanê de bexş û tevkariyeke girîng tê de dikin, lê belê mafê wan ê dengdanê di asteke pir sembolîk de dimîne. Her ji ber vê yekê bû ku, di 2004'an de, piştî Serokdewlet Jean-Bertrand Aristide hate derkirin, fermandariya baskê leşkerî yê hêzên aştiyê yên NY li Haîti'yê pejirand, û bi vî rengî di nav "hewşa mezinan" de cihê xwe girt.

NY pêçan li wî dişidîne ku zêdetir leşkeran bişîne bo wezîfeyên dabînkirina aştiyê. Lê belê, ji nebûna reformeke berfireh a sazûmanî, fermandarên brezîlî red dikin digel hêzên aştiyê yên NY'yê biçin cihên mîna Darfour an jî Kongo'yê û li wan deverên ku tu kontrola wan li ser nîne asê bimînin.

Di destê Serokê Brezîlya'yê de karteke din jî heye: Têketina welatê wî di gotûbêjên li ser aştiyê de li Rojhilata Nêzîk. Dawiya meha mijdarê, Lula da Silva ne tenê Ehmedînejad, lê belê herwiha Serokê Îsraîl'ê Şîmon Perez û Serokê Filistîn'ê Mehmûd Ebbas jî qebûl kirin. Rêveberê Enstîtû ya Lêkolînên Amerîka ya Latîn li Zanko ya Colombia'yê Thomas Trebatê wisa bawer dike ku, "Brezîlya'yê nîşan da ku bi temamî meyldara Dewletên Yekgirtî nîne, lewma dikare wekî axêver û muxatabeke durist bê dîtin." Lula yê xwedan-cezabet, careke din hêvîdar e ku behreya wî ya muzakerevaniyê deriyên nû li wî veke da ku Brezîlya'yê bike hêzeke mezin.

**Wergera ji fransî**
**Ergîn Opengîn**

---

(1) José Serra, "Visita indejável", Folha de Sao Paulo, 23 Mijdar 2009

(2) "Como o Brasil é visto lá fora", Zero Hora, Mijdar 2009.

(3) Banka li jêr rêveberiya wezareta geşedan, endûstrî û bazirganiya derekî.

(4) Herwiha binêre "A inépcia do governo boliviano", Estado de São Paulo, 16 Gulan 2006 û hejmara govara Veja ya 10 Gulan 2006'an, "Essa doeu ", ku Lula da Silvayî bi kemaxên şûnpêyên pehînan li ser nîşan dide.

(5) Adara 2008'an, Kolombiya'yê, bi bombekirina kampeke gerîlayan li ser xaka Ekvador'ê rêzikên bingehî yên serweriyê pêpest kiribûn.

EFRÎQA

# Berev erdên adan

JOAN BAXTER*

**Enstîtûya Navneteweyî bo Vekolînên li ser Polîtîkayên Xurekî (ENVPX) li Washington'ê wisa texmîn dike ku di nava du salên buhurî de bîst milyon hektarên erdî, piranî jê li Efrîqa'yê, bi kêmî li sî welatan, bo maweyên ji sî salan heta digihe sed salan, hatine kirêkirin.**

18 û 19'ê Mijdara 2009'an, navenda konferansê ya Elisabeth II li London'ê, mazûvaniyê li bexşkerên fonên Brîtanya'yê yên ji bo Sierra Leone'yê dike. Li ser kursiyê, kevne-serokwezîr Anthony Blair, ku bi piştgiriya weqfa wî (Weqfa ji bo Efrîqa'yê) rêwresm dihate birêkxistin, bi coş û peroş beşdaran handide ku zeviyên çandiniyê bikirrin li wî welatî ku bi gotinên wî, “xwedanê bi milyonan hektarên erdên adan e (1).” Diyar e ku rêzdar Blair ji şewq û heyecanê muşewiş bûye û lewma ji bîr kiriye ku jiyara bi milyonan Sierra-Leoneyiyan bi berhemên wan erd û zeviyan e.

Hejmareke mezina bank, fonên veberhênanê, gewre-grûbên endûstriyê, dewlet û milyarderên xwedanê xezîneyên xwe yên arizî, dixwazin li Efrîqa'yê çewligên endûstriyel ên pir mezin ava bikin da ku li wê derê, bi tenê ji bo îxracatê, malên xwarinê û bîokarbûranan [ardû-soxtên ji madeyên organîk] durist bikin. Ev şêwe firotinên qismî û beş bi beş, û kirêkirina bo demên dirêj ên erdên çandiniyê, wekî bernameyên geşedanê têne pêşkêşkirin ku ji bo menfaeta hevbeş a hêzên veberhêner û welatên peywendîdar têne birêvebirin.

Di nav layengirên projeyê de, Şirketa Darayî ya Navneteweyî (ŞDN) ya Banka Cîhanî (2) û Fona Navneteweyî bo Geşepêdana Çandiniyê (FNGÇ), enstîtûya bispor a sîstema Neteweyên Yekgirtî, hene. Sererra fikar û ihtiyata pêşîn a Jacques Dioufê midûrê giştî yê Rêxistina Neteweyên Yekgirtî ji bo Xurek û Çandiniyê (Food and Agricultural Organization: FAO), ku bernameya navhatî bi “şêweyekî neo-kolonyalîzmê” wesfandibû, rêxistina wî dû re bi hêz û heyecanekê mezin xwe da ser sepandina vê bernameyê.

Nimûneyên vê herac û firotinên tesfiyeyê ku niha li Efrîqa'yê bi rê ve diçin gelek in. Çînê ji Komara Demokratîk a Kongo'yê (KDK), ji bo qederê 2,8 milyon hektarên erdî îcaze wergirt da ku mezintirîn rêla palmiyeyan a cîhanê lê biçîne (3). Philippe Heilberg'ê serekê rêveberê giştî yê fonên veberhênanê Jarch Capital, li New York'ê, û kevne-nûnerê American International Group a (AIG) dêwê sîgorteyê, li Başûrê Sûdan'ê, ji Paulino Matip'ê derebegê şerî, ji 400.000 heta milyoneke hektarên erdî kirê kirine (4). Kongo-Brazzaville'ê, di van heyamên dawî de, qederê deh milyon hektar rêlên biqîmet û barangir ên welatî, ku jixwe metirsîdar in, pêşkêş kirin bo çend şirketên endûstriya xurekên çandiniyê ji Efrîqa'ya Başûr.

Mijdara buhurî, bi serkêşiya Mohammed Ali Al-Amoudy yê karsazê suûdî yê bi regez ji Etiyopya'yê, pênceh ji mezintirîn şirketên suûdî, forûmek bi rê ve birin li Etiyopya'yê bi armanca lêkdana rê û dirbên darîştina bernameyekê ji bo damezrandina dezgeh û karxaneyên çandiniyê bi tenê ji bo îxracatê (5). Di heman demê de, Sai Ramakrishna Karuturiyê hindistanî, ku reqabetê dike digel Cargilla dêwê endûstriya xurekên ziraî, îdia dike ku ew xwedanê mezintirîn “banka erdî” ya serzemînê reşik e, nexasim li Etiyopya'yê (6). Di hengava ku ew welatê ji hişkesaliyê derbxwarî ji bo alîkariya xurekî bang dike cîhanê, hikûmeta wî ya ku jixwe 600.000 hektarên erdî dabûn, xwe amade dike ji bo bazarkirina 3 milyon hektarên din (7).

Wisa diyar e ku gelek ji serekên dewletên Efrîqa'yê ketine ber cezabeta hizra ku îxracata berhemên xurekên-ziraî çareseriya xizaniyê û ya bêkariya li herêmê ye. Bi taybetî piştgiriya ŞDN'yê bi wan re ye. Saziya navhatî, bi xema amadekirina “seqayeke destxweş ji bo piyaseya kar û bazirganiyê” li welatên peywendîdar ajansên handana veberhênanê vekirin. Wezîfeya wan, alîkirina li veberhêneran e beramber astengên li ber azadiya karkirinê, ku tê heye ji ber bac û yasayên lokal (mafê karkirinê, mafên mirovî, parastina jîngehê) û hetta di bin navê serweriya neteweyî de bêne pêş karsazan.

Îdiaya herî zêde tê pêşxistin, kêm-îstifadekirina ji axê ye. Lê belê, zeviyên şûvhiştî û erdên kêlayî lê neçandî, dihêlin ku ax û rûbar xwe nû bikin. Wekî din, xelkê binkî ji wan deverên daristan û ji wan zeviyên “cotnekirî û neçandî” gelek çavkaniyên girîng bi dest dixin (xurek, dezî, beharat, nebatên rûnder, çêjnî û giyayên dermanan).

Enstîtûya Navneteweyî bo Vekolînên li ser Polîtîkayên Xurekî (ENVPX) li Washington'ê wisa texmîn dike ku di nava du salên buhurî de bîst milyon hektarên erdî, piranî jê li Efrîqa'yê (8), bi kêmî li sî welatan, bo maweyên ji sî salan heta digihe sed salan, hatine kirêkirin. Rêxistina nehikûmî Grain, ku hewl dide van muameleyan bihejmêre û hisêba wan bigire, balê dikêşe ser wê hindê ku muamele ewqas bi lez û bêqaîde têne encamdan ku zehmet e hisêb û hejmarên durist bêne çespandin (9).

Hinek girêbestên ku di asteke herî bilind de hatine girêdan, pir bi dizî û nihênî, gelek caran bi hemtawaniya serekeşîran, bi pişta deriyên girtî ve têne hilawistin. Herçend ew serek wekî parêzerên erdan bêne nasîn jî, gelek caran beramber karekî kêm-mûçe di nav zeviyên veberhêneran de qanih dibin û wezîfeya xwe ya parastina erdê xelkê xwe ji bîr dikin.

Dewletên dewlemend ên Xelîca Fars, ku xema teqezkirina hêminiya xurekî dixwin ji bo xelkê welatên xwe, ku erdê çandiniyê lê pir kêm e, û herwiha çend welatên asyayî, di vê “bazarê” de li rêza pêşî cih digirin. Ji bo karsazan û gewre-grûbên endûstriyel, armanc berî her tiştî hilberandina biyokarbûranan e ji berhemên çandiniyê (leven, rûnê palmiyeyê, garis, kasav [dareke tropîkal]) an jî ji jatrophayê, giyayek ku hinek jê re dibêjin “zêra kesk” lewre taybetiyên rûnê wê nêzîkî yên dîzelê ne. Ev hemû li wan welatên Efrîqa'yê diqewimin ku bi xwe şerrê dabînkirina xurekî dikin, ji ber ku kêmbûna serûkaniyên avê û guherînên avûhewayî, ku qet ne ji xetayên wan e, gefên daîmî ne li ser serê wan.

Heye ku pawankariya li ser erdan jî, dîsa, hevkêşeyên xwezayî têk bide. Cotkarên hûrde, ku piraniya xurekê parzemînê dabîn dikin (ji çandiniya xurekî), birreke sewziyên cihêreng diçînin û bi vî rengî beşdariyê di parastina cihêrengiya biyolojîk [biyo-cihêrengî] dikin (10). Hûrde-cotkar, herroj bêtir dikevine ber gefên dêwên endûstriya xurekên ziraî û takeçandiniya ku ew berbelav dikin.

Qeyrana xurekî ya cîhanî lez da nijdeya berev erdên çandbar ên Efrîqa'yê. Lê belê, milyarek mexdûrên bed-xuriyê [malnutrition: Kêmasiya xwarina bi duristî] ku li dinyayê hene, qurbanên xelayê nîne, lê bêtir qurbanên berdestnebûna xurekan in ku di 2008'an de bihayê xurekan her girantir lêhat. Ev bilindbûna derveyî hemû rêje û sînoran, qismen ji ber bayê spekûlasyonan a li dû wê biryara dewletên Ewrûpa'yê û Dewletên Yekgirtî bû ya bikaranîna bêtir biyo-karbûranan. Diyardeyeke nakok e ku bikaranîna biyokarbûranan, ku ne teqez e bêka dê karîger bin di têkoşîna li dijî guherînên avûhewayî de, qismen berpirs e di talana li ser erdên çandiniyê de. Qeyrana aborî jî dîsa xwedanê rolekê bû di vê bizavê de, ji ber ku piştî îflasa meha îlona 2008'an, bi hezaran veberhêner ketine ser rêya peydakirina deverên hêmintir û biqazanctir ji bo veberhênanê. Bi nezera wan, “zevî veberhênaneke pir hêmin e û hetta hêmintir ji zêrê ye (11).”

Olivier De Schutterê raportorê taybet ê Neteweyên Yekgirtî bo mafê xurekê, xemgîn e ku rêveberên efrîqayî, ku bêyî li parlemanên xwe bişêwirin wan girêbestan mor dikin, dêvla ku dê bi hev re bixebitin da ku şertan danine ber veberhênerên biyanî (çakkirina binesaziyan an jî ragirtina bi kêmî nîvê berheman ji bo bazara herêmî) radibin li dijî hev dikevine reqabetê. Philippe Heiberg'ê Serokê Banka ya Newyork'ê Jarch Capital'ê, bi reşbînî dibêje ku “gava xurek kêm dibe, veberhêner li dewleteke wisa feqîr digerre da ku di xwe re nebîne rêzik û qanûnan li wî bisepîne” (12).

Digel vê hindê jî, çend komeleyên efrîqayî hewl didin dengê xwe bidin bihîstin. Bo nimûne Copenhagen, hevpeymaniyeke pan-efrîqayî ku ji zanyar û komeleyên cotkaran pêk tê, doza parastina serweriya li ser tov û berhemên xurekî dike. 27'ê Cotmeha 2009'an, bîst û heft komeleyên lokal nameyek îmze kir û bang li rêveberên serzemînê kir ku piştgiriya xwe ya bo çandiniya endûstriyel bibirrin. Heta îro bersivek wernegirtine.

Rast e ku piraniya hemleyên pawankirina erdên çandiniyê hêj di asta projeyê de ne. Lê belê, heke qeza û belayek bi pêş neyê, “projeyek” ji bo bicihkirin û gihandina heta dawiyê tê dariştin. Belam, kirrîna gişkî ya wan erdan tenê bi armanca spekulasyonên darayî di nav xwe de tovekê dihewîne: Tovê dubendiyan, wêrankariya jîngehî, şêlûbêla siyasî û birs û xelayeke

** Rojnamevan û nivîskar, nivîskarê Dust from our eyes - An unblinkered look at Africa, Wolsak and Wynn Publishers Ltd, Hamilton (Ontario, Canada), 2008.*



*Three Smiling Women, (Kunstschule Arte Moris aus Ost Timur) - Efekt LMD kurdî*

ku berê qet nehatiye dîtin. Mijdara buhurî, FAO'yê, di çarçoveya civîna cîhanî de li ser hêminiya xurekî ya li Roma'yê, diyar kir ku ew digel Konferansa Neteweyên Yekgirtî li ser Bazirganî û Geşepêdanê (KNYBG), FIDA û Banka Cîhanî dixebite ji bo dariştina "qanûna reftara durist" ji bo veberhênerên biyanî. Sazkarî û qaîdeyên navneteweyî dikarin, herwiha, rêyê li ber projeyên veberhênanên çandiniyê yên "xwedan-mesûliyet" xweş bikin.

Lê belê, çareserî hene. Derxistina mîkro-krediyan, çêkirina rêyan ku îmkana firotina berhemên ziraî li bazarên deverê durist dike, îmkana dewreyên perwerdeyê ku dê bihêlin cotkar teknîkên çandiniyê yên biyo-cihêrengiyê fêr bibin, veguhastin û depokirina çêtir bo berhemên wan û kêmkirina îthalata ku kar û keda wan bêqîmet dike, ev hemû veberhênanên avaker in di sermiyanê mirovî û çandinî yê Efrîqa'yê de.

**Wergera ji fransî**
**Ergîn Opengîn**

(1) "Sierra Leone open for business", Awoko, Freetown, Sierra Leone. 23 Mijdar 2009.

(2) Bi ya raporta SFI'yê, belavkirina hezîrana 2009'an, di 2009'an de 2 milyar dolarên rekor hatine razandin di endûstriya xurekên ziraî de, anku % 42 zêdetir ji sala berê.

(3) Olivier De Schutter, raportorê taybet yê Neteweyên Yekgirtî bo mafê xurekê, di 11'ê Hezîrana 2009'an de, bangek belav kir ji bo çavlêkirina hejmareke prensîbên pêwendîdarî mafên mirovî, wekî bingehê kêmanî, di girêbestan de.

(4) Daniel Shepard û Anuradha Mittal, "The Great land Grab: Rush for world's farmland threatens food security for the poor", Oakland Institute, Oakland, Californie. 2009

(5) Wudineh Zenebe, "Al-Amoudi's efforts to initiate Saudi agro-investment", Addis Fortune, Addis Abeba, 29 Mijdar 2009.

(6) Asha Rai, "The constant gardener", The times of India, Mumbai, 26 Îlon 2009.

(7) "Ethiopia is giving away 2,7 million hectares" Daily Nation, Addis Abeba, 15 Îlon 2009.

(8) Joachim von Braun û Ruth Suseela Meinzen-Dick, "Land grabbing by foreign investors in developing countries: Risks and opportunities", IFPRI Policy Brief 13, International Food Policy Research Institute, Washington, Nîsan 2009.

(9) "Il faut mettre fin à l'accaparement mondial des terres!", beyana Grainê, di Civîna cîhanî ya xurekê de li Roma'yê, 16 Mijdar 2009.

(10) Miguel A. Altieri "Agroecology, small farms, and food sovereignty" The Monthly Review, New York, Hezîran-Tebax 2009.

(11) Chris Mayer, "This asset is like gold, only better ", Daily Wealth, Vancouver, 4 Cotmeh 2009.

(12) Knaup, Horand û von Mittelstaed, "Foreign investors snap up African farmland", Der Spiegel, Hamburg, 31 Tîrmeh 2009.

ÎRAN

# Parastvanên Şoreşê kî ne?

BEHROUZ AREF & BEHROUZ FARAHANY*

**Tevî ku vê mehê Îran sîhûyekemîn salvegera şoreşa xwe pîroz dike, tevgera muxalefetê ku ji Hezîran'a 2009'an û vir ve bi hêz dibe, serûbinîhevbûnên civakî yên ji sala 1979'an ve li welêt diqewimin, derdixe pêş. Ev veguhertin bersiva ku rejîmê diviyabû bide krîza heyî zehmetir dikin û dikin ku rejîm di navbera lihevkirin û tepisandinê de dudilî bibe. Beridîna pasdaran zehmetiyên Şoreşa Îslamî bi xwe nîşan didin.**

Piştî ku Komara Îslamî ya Îran'ê di sala 1979'an de hat damezrandin ne bi gelekî bêserûberêya artêşa ji rejîma monarşîst mayî û tirsa ji darbeyeke leşkerî, kir ku Ayetullah Xumeynî hêzeke din a leşkerî ava bike. Ev hêza leşkerî 22'ê Nîsana 1979'an bi navê "artêşa bextreşan" hat sazkirin, paşê bi navê artêşa pasdaran bi xala 150'î ya destûra bingehîn hate qanûnîkirin (AP – Sepahê Pasdaranê Enqelabê Îslamî, SPEÎ). Erka wê ev e: "Parastina Şoreşa Îslamî, ewlekarî û nîzama gelemperiyê."

Xirabbûna krîza hundirê rejîmê di salên 1980-1981'ê de, berterefkirina serokkomarê rejîmê yê pêşî Abolhesen Benî-Sadr û destpêka serhildaneke çekdarî ya bi destê Mucahidînê Xelk (1) kir ku AP jî bo zexmkirina desthilatdarêya Xumeynî zilm û zorê bi kar bîne. Dema di navbera Îraq û Îran'ê de sala 1980'î şer dest pê kir, hem li hundir û hem jî di bereya şer de AP xwe weke yekane hêza rêxistinkirî ku jê tê rejîmê biparêze, derxiste pêş. AP hem di çêkirina planên şer de û hem jî di kontrolkirina ji derve tedarîkkirina pediviyan de, cih digire. Ew parastina berpirsiyarên dewletê misoger dike û endamên wê di komîteyên şoreşê de yên ku xwe weke girêdayî îmam didin nasîn, cih digirin.

Bêbandorkirina muxalefeta radîkal û serketinên pêşî di bereya şerê Îraqê de dema "şoreşger" a îranî bi dawî dike: Di danezaneke ji heşt xalan de 6'ê Kanûna 1982'an Xumeynî rewabûna milkdarî û sektora taybet qebûl kir û ji pasdaran xwest (Parastvanên şoreşê) ku hemû hêza xwe ji bo şer bidin ser hev.

Sala 1989'an, piştî mirina damezrênerê Komara Îslamî, AP'yê tercîh kir ku weke lîderê ruhanî (2) Elî Xamaney û weke serokkomar jî Elî Ekber Rafsancanî bêne hilbijartin. Tevî ku di salên 1990'î de rêxistina AP di warê siyasî de lawaz bû jî, wê serdestyiya xwe ya li qada aborî ya li welêt xurttir kir. Xala 147'an ya destûra bingehîn dibêje: "Divê di wextê aştiyê de hukûmet personel û navgînên teknîkî yên artêşê di çarçoveya xebatên alîkariyê, perwerdeyê, hilberandinê û cîhada avakirinê de bi kar bîne û divê bi awayekî tekûz bi huqûqa îslamî re vê yekê bike bêyî ev yek kêrhatina wê ya şer kêm bike." Xatam el-Enbiya (Fermandarêya Giştî ya avakirinê) ya sala 1990'î hat damezrandin, her weha bi navê "kompleksa Xorb" tê nasîn, xebatên gelek saziyên di bin banê pasdaran de koordîne dike.

Derdor û kesên nêzî Rafsancanî yên hatin pozîsyonên desthilatdariyê dewlemendî komkirin, vê yekê kir ku Xamaney û derdorên muhafezekar fikaran bikin. Dema sala 1996'an "reformxwazên" Rafsancanî di hilbijartinên ji bo meclîsa îslamî ya dema pêncan de bi ser ketin, lîderê ruhanî hewara xwe gihand pasdaran. Xameney ne xwediyê karîzmayekê, ne jêhatîbûna siyasî û ne jî otorîteyeke dînî ya weke ya Xumeyniyekî bû, lewma pêdiviya wî bi piştgiriyê hebû. Di nîqaşeke qeydkirî de 6'ê Nîsana 1996'an Serokê Fermandarên AP'yê General Yehya Rehîm Safewî, da zanîn: "Divê di tûra duyem a hilbijartinan de em jî derkevin ser dikê û bi dengên xwe divê em nehêlin yek lîberalê bi tenê jî ku mumkin e ji bo welat û gel tevlîheviyan çêke, bikeve meclîsê." (3)

Vê mudaxeleyê kir ku têkiliyên hêzê yên di nava rejîmê de serûbinîhev bibin û pêşketina "reformxwazan" jî rawestand. Bi awayekî surprîz di sala 1997'an de weke serokkomar hilbijartina Muhemed Xatemî namzetê kevneparêzan Nateq-Nûrî têk bir, vê yekê bê îstîqrarêya mêzînê bêhtir nîşan da.

Di du demên desthilatdarêya Xatemî de (1997-2005), AP li ber reformên wî rabû. Di heman demê de rêxistina AP'yê ji sê paran yekê kirîna ji derve ya Îran'ê kontrol dike. Li gorî daxuyaniya şêwirmendekî serokê berê yê meclîsê Karûbî, Muhemed Elî Muşafeq ya sala 2007'an (4) îthalat bi van riyan dibe: Nêzî şêst benderên li ser peravên kendavê û dehek balefirgeh - yek ji van balefirgehan jî Peyam e ku nêzî Tehran'ê ye û bi awayê fermî ser bi wezareta telekomînîkasyonê ye -, bîstûpênc deriyên [bazirganiya serbest] yên li balefirgeha navneteweyî ya Mehrabadê.

Ji ber ku gelek wezîr û sekreterên dewletê di kontrola pasdaran de ne, Xatam el-Enbiya dikarîbû pêkanîna karên gelekî mezin ên gelemperiyê di dema şaredarêya Tehran'ê ya Ehmedînejad (2003-2005) de bi dest bixe, weke mînak otobahn û metroya buhayê wan 2.2 milyar dolar. Dema ku partîzanên Xatemî, jihevketî bi bin ketin û Ehmedînejad li dijî Rafsancanî di hilbijartinên serokkomariyê de bi ser ket, di 2005'an de giraniya hêza AP'yê zêdetir bû. Ji bo gel Rafsancanî nîşana karên ne li rê û bertîlxuriyê bû.

Li gorî bloga namzetê binketî yê hilbijartinên serokkomariyê yên herî dawî Musawî, Xorb bêhtirî heştsed şîrketî kontrol dike. Ev şîrket di gelek qadan de çalak in: Artêş (hilberandina roket û fuzeyan), avahîsazî û pêşketin (projeyên rêyan, bendavan, kanan, binesazî, avdan û hwd.); petrol û gaza xwezayî (Xorbê îhaleya çêkirina xeta lûleyên petrolê ya 600 kîlometroyî dirêj ber bi Hindistanê ve bi buhayê 2.2 milyar dolaran bi dest xist); ragihandin (Havîna 2009'an, Konsorsiyûma Tosê Etemadê Mobîn a ser bi Pasdaran, kontrola ji sedî 50'yê şîrketa dewletê ya telekomunîkasyonê Şerkatê Moxaberatê Îran bê îhale bi dest xist, buhayê vê bazarê 8 milyar dolar e); maliye (du şîrketên krediyê yên alîkariyê yên pasdaran û bêsic – milîs – ber bi bankabuyînê ve diberidin).

Projeya pasdaran herî dawî di Mijdara 2009'an de pêşniyar kir: Avakirina rêya hesinî ya Şahbaharê li Başûrrojhilat bi buhayê 2.5 milyar dolaran. General Caferî bi awayekî hişê wî li serê wî weha şîrove kir: "Em ne mekîneyeke şer in (...) ku di wextê aştiyê de bêker e." (5) Belê dîsa jî ew neçar bû di çapemeniyê de û li meclîsê bersivê bide rexneyên ku karên wî dişibandin karên mafyayê: "Mirov qet nikare mafya leşkerî ku li gelek welatan heye, weke li cem hin cÎran'ên me û Sêpahan [AP]li ber hev bigire."

Ji dema xwepêşandanên li hilbijartinên sextekarî di wan de hebû yên Hezîrana 2009'an (6) bûn sedem û vir ve, Parastvanên Şoreşê di tepisandina muxalefetê û destekkirina Xamaney de rolekî navendî li cih tînin. 125 hezar endamên wê li gelek baskên artêşê hatin belavkirin û di heman demê de "hêza berxwadanê ya bêsic" kontrol dikin.

General Ebullah Araqî, fermandarê baskê artêşa pasdaran a bi navê Resûlellah di Cotmeh'ê de îdîa kir ku rêxistina wî berpirsiyarêya ewlekariyê ya du mehên piştî hilbijartinan girtiye ser milên xwe (7). Çend hefteyan paşê rêveberê mekteba siyasî ya AP'yê Yadullah Cevanî xwest lîderên muxalefetê Karûbî û Mûsawî werin girtin û cezakirin (8). AP'yê bi awayekî fermî 29'ê Kanûn'ê bang li gel kir da ku ji bo destekdana lîderê ruhanî xwepêşandanan li dar bixe û muxalifên wî jî bi sîxurtiya hêzên derve gunehbar kir (9). Li ser malpera xwe ya înternetê (gerdab.ir) AP'yê wêneyên di dema xwepêşandanan de hatî girtin weşandin û pêre jî bang li "gelî misilmanan" kir da ku giliyê beşdarên xwepêşandanan bikin.

Dîsa jî, kêfa tevgerên cihê yên alîgirê Komara Îslamî ji neşefafiya li dora berferehbûna xebatên wê yên li qadên aborî û siyasî re nayê –di nava van tevger û derdoran de bazara Tehranê, hin sektorên taybet yan jî partiyên siyasî yên nerm hene. AP bi xwe jî ji parçebûnê parastî û muaf nîne, beşek ji hîmê wê ji derdorên civakî yên xizan tê û vê meyla karênnelirê û bi darê zorê jî qebûl nake. Yên jê vediqetin zehmetiya tercîha ku Komara Îslamî pêre rûbirû ye derdixin pêş, ev tercîh di navbera lêgerîna li lihevkirinekê û hewldana tepisandinê de ye.

**Werger ji fransî**
**Lokman Turgut**

** Wergêr û nivîskarên edîtorên rojnameyên înternetê yên Îran'ê.*

(1) Sala 1965'an hat damezrandin. Ev rêxistin di şerê li dijî şah de cihê xwe girtibû. Di ruxandina rejîma Şah a sala 1979'an de jî xwedî rol bû. Piştî 1981'ê ji Xumeynî qut bû dest bi muxalefeta çekdarî kir. Bi awayekî hovane hatin tepisandin û gelek ji kadroyên li derveyî welet bûn penaber. Sala 1965'an rêxistinê li Iraqê baregeheke eskerî ava kir (di dema şerê Iraq û Îran'ê de) û hevgirtinek bi rejîma Saddam Husên re çêkir.

(2) Lîderê ruhanî ji aliyê Meclîsa Pisporan (Meclîsê Xobregan) ve tê wezîfedrakirin û berpirsyarê herî bilind ê siyasî û dînî ye û fîgurê herî girîng ê Komara Îslamî ya Îran'ê ye.

(3) Kayhan, Tehran, 17'ê Nîsana 1996'an.

(4) www.aei.org/outlook/27433

(5) www.sepahnews.com

(6) Bixwîne, Ahmed Salamatian, "Dans le chaudron du pouvoir iranien (Di quşxaneya desthiltdariya Îran'ê de)", Le Monde diplomatique, Tîrmeh 2009'an.

(7) BBC ya bi farisî, 4'ê Cotmeh 2009'an.


(8) Sobh Sadeq, Tehran, 21'ê Mijdar 2009'an.

(9) www.khabaronline.ir/news-33058.aspx

LI HAÎTI'YÊ, YÊ KU DIFIKIRE ZIK E!

# Heyra Vegerê

CHRISTOPHE WARGN



*Folk Art Haiti 2008, (Liotino) - Efekt LMD kurdî*

**Dany Laferrière**
Grasset, Parîs, 2009 /
Boreal, Montreal, 2009,
302 rûpel, 18 euro

Montréal-Port-au-Prince [Lîmana Mîrza]. Port-au-Prince û Haîtî di serî de. Piştî ku sî salên temam derbas bûn, Dany Laferrière'ê rojnamevanê nivîskarê ceribandin û romanan, vedigere welatê xwe yê eslî. Li ser bergê şomîz î zer ê kitêba wî nivîsî ye "roman" Bi rastî?

Berhema wî herwiha dişibe qisetkirinekê, şahidî an jî parçejiyanekê, ku bi zimanekî helbestî yê petî, pir-aforîzma, bi qerf û îmaj hatiye nivîsandin. Tund û tûj. Xeşîm carinan. Ne ji bo haîtiyiyan, lê ji bo wî, ji bo me.

"Di nav maweyeke ewqas
kurt de
Ji vejeteryanekî bi zorî bûm
mirovxurekî mecbûrî"

Laferrière bi şêweyekî xweser, bi qasî şimaqên xeşîm niwazên nerm jî dertîne û çavekê li Aimé Césaire'ê dimiqîne ji bo berhema wê ya bi navê Cahier d'un retour au pays natal [Deftera vegereke bo welatê eslî]: "Lê berî birêketinê me pêdivî pê heye. Ne di vegerê de." Awazeke risteyên azad kitêbê dadigirin. Rêncberê ku erdê beyar ê mirovên xemgîn diterikîne da ku biçe zoravayên Port-au-Prince'ê, bi tenê bilêta çûnê dikire. Nivîskarê me, lê belê, xwedanê bilêteke çûn-û-vegerê ye. Lê belê, têgihiştina wî ya rewşê, bedela çend û çend ceribandinan û teswîrên rewşên mehrûmiyetê ye.

"Di jiyana min a berê de
Xwarin bû xema mezin
Hertişt li dora zikî dizivirî.
Bi nanxwarinê re, hertişt
durist dibû."

Haîti'ya zemanên berê? "Dîktatorê tropîkal û giyanê xerabkar": dengê radyoya duvalierist [navê rejîma dîktatorî ya li Haîti'yê ye ji sala 1957'an heta 1986'an] ewqas bilind bikin da ku sîxûr we ji partîzanên "reqkerê giyanan" bizanin. Bêavî? Keçik berî herkesî radibin da ku biçin heta cihên pir dûr ji bo avkêşanê. Destpêka dewlemendiyê? Rojekê, "wî kitêbek kirrî bêyî ku jê re lazim be." Gerra li dû dewlemendiyê? "Xwe ji awairên feqîran biparêze." Cudatiya rasteqîne, li "welatekî heta ser der û qulpan tijî", lê bê meydaneke azad? "Mal û meydana we ye ku kesayeta we diyar dike." Lûtkeya mal û samanî? Jîna li New York an jî li Parîs'ê, lê ragirtina mal û erdê xwe bi rêya xulaman! An jî avakirina şatoyên herî bilind di nîveka taxên feqîr û parsekan de! Û çawa ye paşeroja van mirovan?

"Li vê devera ku birr birr
mirov lê ne
Berî hertiştî xema zikî ye.
Vala an tijî?
Seks rast piştî wê tê.
Û xew dawî."

Û xweşhaliya ji ber mişetiyê [pirbûn]? Zikekî qerase ji birinc, poi [xwarineke Haîti'yê], sos û mirîşkê? Leqayîbûna Îsa yan yek ji hewariyên wî? Saxbûn, kenîn, ku qet kêm nîne, dîtina buhorîna saetan bêyî birçîbûnê, "gava ku axirî hejarî dikeve kurtexewekê-" Haîtî herwiha welatek e ku zahir ji batinê sertir e. Ku peyv pere ye. Û pêwendî zêr. "Li dûrgeyekê ku çûk lê reviyane", xewn û xeyal û efsane ji garis û petatan baştir çêdibin. Qisetkerê haîtiyî û kebekî [Quebec], zîrek û naîf, "divê dîsa xwe fêrî wî tiştî bike ku jixwe dizane lê diviya di rêyê de ji xwe veke." Bi hêvîşkestin, bi sebr û sebat û bi heyr û heyret. Li welatê tundrewiyan.

**Wergera ji fransî**
**Ergîn Opengîn**


**Le Monde Diplomatique kurdî**
Ji aliyê Rûdaw Media GmbH
ve tê weşandin

**Editorê giştî**
Faysal Dağlı

**ALMANYA**
**Le Monde Diplomatique kurdî (kurmancî)**

**Designer**
Mehmet Nazmi Demir

**Şêwirmenda weşanê**
Berîvan Aymaz

**Rêvebirê hunerî**
Hasan Hüseyin Deveci

**Werger**
İbrahim Seydo Aydoğan,
Nurettin Akad, Cemil Denli,
Ergîn Opengîn, Lokman Turgut

**Asîstant**
Semra Polat
Sharo İbrahim Garip

Tlf: 00 49 (0) 221 26 00 40 02
Fax: 00 49 (0) 221 26 00 49 81
info@lemondediplo-kurdi.com
www.lemondediplo-kurdi.com

Rûdaw Media GmbH
Gutenbergstr. 63a
50823 Köln / Almanya

**KURDISTAN**
**Le Monde Diplomatique kurdî (soranî)**
Ji aliyê Rûdaw Media
Company ve tê weşandin

**Edîtora beşa soranî**
Nazend Begîkhanî

**Rêvebirê hunerî**
Husên Hîmatî

**Designer**
Baxtiyar Mistefa

**Werger**
Muhsîn Ahmed, Amir Ahmad,
Hardy Mohammed, Kawa Dastoorrah,
Mesûd Diryaz, Ahmedê Mela

**Asîstant**
Selam Sadî

Tlf: 00 964 (0) 750 488 56 96
info@lemondediplo-kurdi.com
www.lemondediplo-kurdi.com

Rûdaw Media Company
Caddeyî 100 Metre, Hewlêr,
Kurdistan / Iraq

**FRANSA**
**Le Monde Diplomatique**

**Damezrêner**
Hubert Beuve-Méry

**Rêvebir**
Serge Halimi

**Sernûser**
Maurice Lemoine

**Cîgirên sernûser**
Martine Bulardi,
Philippe Rivière, Anne-Cécile Robert

**Redaksiyon**
Alain Gresh, Mona Chollet,
Pierre Rimbert, Dominique Vidal

**Rêvebirê hunerî**
Alice Barzilay

**Dokumantasyon**
Olivier Pironet

**Sekreter**
Sophie Durand, Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon,
F-75013, Paris

**ABONETÎ**
Rudaw Media GmbH
Deutsche Bank
Konto: 245016101 - BLZ: 37070024
IBAN: DE21 37 07 00 24 02 45 0161 01
BIC: DEUTDEDBKOE
**Almanya:**
Salane: 40 Euro - 6 meh: 20 Euro
**Dervayê Almanya:**
Salane: 50 Euro - 6 meh: 25 Euro